

## Li Rihayê dema berhevkirina Îsotan e

**DEMA** mirov qala Rihayê dike jibilî xwarinên wek ecîn, cîger û fistiqan, îsot jî tê hişê mirov. Îsot wek mexsûleke xwemalî û nîşaneya vî bajarî tê qebûlkirin. Niha li Rihayê dem dema îsotan e û piraniya Rihayiyan bi berhevkirina îsotê re mijûl in. Em li ser berhevkirin û çêkirina îsotan, bi cotkaran re axivîn. **RÛPEL 09**






## Holiday Inn Democracy Out

**WELATÊ** ma û heme herême rojanê tarîxîyan rê vîyarenê. Aktorê nê demî kurd ê. Rojevê kurdan de yew referandum esto ke o do vurîyayîşê qederê nê miletî de rolê yew çatrayîrî kay biko. Herhal dinya hîç nêbîya şahidê prosesê referandumê winasî. Hema nêvirazîyayo la toz û duman o ke werişto! **RÛPEL 10**





## Mîrê Hêkan: Hêk nîşaneya jiyanê ye

**HUNERMENDÊ** ji Rojava Mîrê Hêkan tabloyên xwe bi qalikên hêkan çê dike. Dema behsa hêkan tê kirin, ewil xwarin tê bîra mirov, lê ji xeynî xwarinê hêk bi xêra Mîrê Hêkan daxilî nav hunerê jî bûye. Hunermendê Kurd Mîrê Hêkan ji Heftenameya Basê re qala hunera xwe ya bi hêkan re kir. **RÛPEL 06**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 35
25 ÎLON - 02 COTMEH 2017
www.basnews.com




PIŞTÎ REFERANDÛMA SERXWEBÛNÊ: R2

# TÊKILIYÊN KURDISTAN Û CÎHANÊ XURTIR DIBIN

### > "HEMÛ CÎHAN WÊ KURDISTANA SERBIXWE NAS BIKE"

Herêma Kurdistanê heta niha li gelek navendên cîhanê nûnertiyên xwe vekirine û li Hewlêra paytext jî bi dehan nûnertiyên welatan hene. Şareza û pispor radigihînin ku her çiqas niha hêzên cîhanî bi awayekî zelal piştgirî nedin jî, piştî referandûma serxwebûnê, hêzên navdewletî wê pêwendiyên xwe yên li gel Kurdistanê bihêztir bikin.

### > KURDISTAN BO ARAMIYA HERÊMÊ ROLEKE GIRÎNG DILÎZE

Herêma Kurdistanê ji roja damezrandina xwe heta van rojên dîrokî ku xelkê Kurdistanê niha jî bo diyarkirina çarenûsa xwe diçe ser sindoqan, di her warî de nîşan da ku bi tu awayî ne gef e ji bo aramî û seqamgiriya herêm û cîhanê. Berovajî wê, Kurdistan ji bo dirûstkirina demokrasî û aramiya herêm û cîhanê weke piştevaneke bihêz derket holê û roleke girîng pêk anî.

Sabiha Ünlü:

## Serxwebûna Kurdan wê bandoreke erênî li cîhana Îslamî bike



R03

Sabiha Ünlü bi salan e ji bo jinên ku dixwazin xwe pêş bixin xebatan dike. Her wiha jineke Îslamî, nivîskar û çalakvan e. Em bi Sabiha Ünlü re di derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê û nerîna Îslamiyan de axivîn. Ünlü dibêje serxwebûna Kurdan wê li cîhana Îslamî bandoreke erênî bike û wiha dibêje: "Daxwaza serxwebûna Kurdan ji aliyê çar welatên misilman ve bi tundî û weke bobelatekê hat pêşwazîkirin. Tirsa wan ew e ku eger Kurd li beşekê azad bibin û dewleta xwe ava bikin wê tesîrê li beşên din jî bike."



**EKREM ÖNEN** >02

Peyman, bes aboriye an sînyale ji hinekan re?



**HOŞENG OSÊ** >03

Gelo serxwebûna Kurdistanê bê Kerkûk çê dibe?



**FIRAT CEWERÎ** >08

Zimanê me

ROJEV R05



## Ji Bakur piştgiriyeke mezin bo Herêma Kurdistanê

Kurdan li seranserê cîhanê bi festîval û çalakiyan piştgiriya referandûmê kirin. Li Tirkiyeyê jî partiyên siyasî, saziyên sivîl û kesên serbixwe xebat û çalakiyên wan heta referandûmê jî domiyan. Bi giştî partiyên Kurdan piştgiriya xwe bo referandûmê bi awayekî zelal eşkere kirin û çalakiyên cur bi cur pêk anîn.

CÎHAN R08



## Cîhaneke baştir pêkan e?

Di civîna giştî ya Konseya Ewlekarî ya NYÊ de biryarên berfirehkirina konseyê, çareserkirina kêşeya Filîstîn - Îsraîlê bi du dewletan, Rêkeftina Keşûhewa ya Parîsê, Sûriye û Îraq mijarên sereke bûn. Referandûma Herêma Kurdistanê jî yek ji mijarên girîng ya civînê bûn. Di Civîna Giştî de daxwaza reforman jî hat kirin.

KURSIYA AZAD R12



## Barzanî û Xwezanî

Serok Barzanî, îro nîşana hebûn û xwebûna nasnameya Kurd e. Nîşana şikandina qeyd û zincîrên bindestiyê ye. Nîşana mirovahî, dilsozî, hevgirtin, yekîtî, mêranî û azadiyê ye. Belê, bê behane û nîqaşên bê wate, em Kurdên çar aliyên Kurdistanê û cîhanê di meşa serxwebûnê de bi hemû derfetên xwe bi te re ne ey serok Barzanî!



**EKREM ÖNEN**

ROSNEFT: Peymana beriya referandûmê bi çend rojan, bes aboriye an sînyale ji hinekan re?

Weke tê zanîn ROSNEFT yek ji mezintirîn şîrketa enerjiyê ya navnetewî ye her weha xwediyê zêdeyî ji %50 nefta Rûsya ye. Li gelek devrên cîhanê wek Awrûpa, Afrîqa, Asya Antarktika, Amerika Latînî û gelek herêmên din petrol û gazê derdixe û difiroşe. Di meha hezîrana 2017an de serokwezîrê herêma Kurdistanê birêz Neçirvan Barzanî serdana Rûsya kir ji bo beşdarbûna foruma aborî a Sankt Petersbûrgê. Di vê serdana xwe de birêz Neçîrvan Barzanî hevdîtin li gel serokkomarê Rusya Vladimir Putin û wezîrê derve Sergey Lavrov pêk anî. Piştî van hevdîtina peymanek li ser esasê 20 salan di navbera ROSNEFT û herêma Kurdistanê de hate îmze kirin. Li gor vê peymanê buhayê nefta 2 salan ROSNEFT wek krêdî pêşin bide herêma Kurdistanê. Tranşa pêşin 250 milyon dolar dan herêma Kurdistanê. Bê guman ev krêdî ji bo kurdan niha gelekî girîng e di demeke perê nefta Kurdistanê ku diçû Tirkiyê li Halk banqa Tirkiyê dihate razandin niha Tirkî dana wan pereyan ji bo herêma Kurdistanê sekinandiye. Her weha hikumeta Bexdayê jî ambargo daniye ser kurdan di demeke weha de krêdiya ROSNEFTê gelekî girîng e. Lê tişta herî girîng ew e ku piştî vegera ji Rûsya a Nêçîrvan Barzanî bi 2 roja herêma Kurdistanê îlana roja referandûmê kir. Wê demê min di nivîseke xwe de bal kişandibû ser vê pirsê. Paşê gelek ekspertên rojavayî jî di derbarê vê pirsê de fikrên xwe diyar kirin weke ku kurda ji Rûsya işareta kesk ji bo referandûmê wergirtine. Niha dîsa piştî ku beriya çend rojên referandûmê ROSNEFTÊ bi herêma Kurdistanê re peymanek din jî, ku buhayê wê zêdeyî milyarek dolara îmze kirin, ev pirs dîsa kete rojeva cîhanê gelo ji ber çi Rûsya di demek weha hesas de bi kurdan re peymana îmze dike û alikariya aborî bi herêma Kurdistanê re dike. Vê pirsê bêhtir ekspertên welatê rojava dike. Her weha bi vê pirsê ve pirseke din jî tê kirin di demeke ku welatên rojava û DYA ji kurda dixwazin referandûmê nekin. Rûsya daxwazek weha ji kurda nake heta beyanên wezîrê derve ê Rûsya Lavrov di derbarê referandûmê de gelek pozîtîvin ev ji bo ekspertên welatên rojavayî cihê balkêşiyê ye. Ji bo çi Rûsya niha di vê tevlîheviya li herêmê bi kurdan re aktîv têkiliyan dike? Beriya her tiştî divê bê zanîn ku Rûsya weke her dewletê ew jî siyaseteke pragmatîk dimeşîne. Mirov dikare vê ya bi çend faktora ve girêde: 1- Rûsya weke monopolê enerjiyê li cîhanê dixwaze kontrola enerjiya Kurdistanê jî bike, 2- Piştî Rûsya poziyona xwe li Sûriyê xurt kir li herêmê li mutefîkê nû digere, wek aşkereye niha bi Misir û Îsraîlê re têkiliyên xwe pêşda birin, wek em dizanin beriya mehekê serokwezîrê Îsraîlê serdana Rûsya kir û hevdîtin li gel Putîn pêk anî, piştî hevdîtinê ji rojnamevana re aşkere kir û got; "Helwesta me û a Rûsya di derbarê herêma rojhilata nêzîk û navîn pir nêzî hev e". Wê demê medya Îsraîlê nivîsîn ku; "Wê demê pirsa kurdan jî hatiye rojevê û helwesta Îsrail û Rûsya di vê pirsê de jî nêzî hev e." Heman wext Rûsya dixwaze bi Kurdistana Başûr re jî têkiliyan pêş de bibe, bi taybetî piştî ku şirketên welatên rojavayî Kurdistan terk kirin. Rûsya niha dixwaze vê valahiyê dagire. Her weha helwesta wan a di derbarê referandûmê de jî, ji ber helwesta publîk negatîv a welatên rojava ye. 3- Hesabê Rûsya ên geopolîtîk û stratejîk yên li herêma rojhilata nêzîk û navîne. Ji alî kurdan de jî ew jî divê weke Rûsya pragmatîk nêzî pirsê bibin. Ji bo kurdan têkiliyên wan bi Rûsya re ji wan re alternatîv çêdibin ji bo bikaribin rehet tevbigerin. Hebûna şirketeke weke ROSNEFTê li herêma Kurdistanê garantiyeke ji bo herêma Kurdistanê. Her weha kurd dikarin bi rêya Rûsya gelek pirsgirêkên xwe çi hundir çi jî li derve çareser bikin, wek Şingal, pirsa transportkirina nefta herêma Kurdistanê. Têkiliyên Rûsya bi dewletên Kurdistan perçekirine û heman demê bi kurdan re, ji bo kurdan him pozitîve him jî riske kurd divê pragmatîk nêzî pirsê bibin û vê rewşa han têkiliyên bi Rûsya re maksîmûm ji xwe re bi kar bînin. Weke mînak di demeke ku dewletên rojavayî çiqas raste ne diyare lê aşkere ji kurdan daxwaz dikin ku kurd referandûmê nekin di demê de welatên Kurdistan perçekirine çavsoriya li kurdan dikin ji bo referandûmê nekin. Di demeke weha de dema welatekî wek Rûsya ji kurda daxwaza nekirina referandûmê nake û beyanên wan di derbarê referandûmê de pozîtîvin û beriya referandûmê bi çend rojan peymanek neftê îmze kirin, Bê guman ev tev ji alî kurdan de pozitîvin. Kurd divê baş bizanibin di siyasetê de dost û dijminê daîmî nîne berjewendiyên daîmî hene. Ji van tiştên li jor hatin behs kirin ev peymana ROSNEFTê ne bes aboriye ev peyman di heman demê de sînyale ji hinek xêrnexwazê kurdan re.



Piştî referandûma serxwebûnê:

# Têkiliyên Kurdistan û cîhanê xurtir dibin

**MURAT ÖZDEMIR**

Şareza û pispor radigihînin ku her çiqas niha hêzên cîhanî bi awayekî zelal piştgirî nedin û li dijî xuya bikin jî piştî referandûmê ku Kurdistan wê bikeve qonaxa serxwebûnê, hêzên navdewletî wê pêwendiyên xwe yên li gel Kurdistanê bihêztir bikin û pêşdetir bibin.

Li Herêma Kurdistanê 25ê Îlonê referandûmeke dîrokî pêk tê ku ev heyameke dirêj e ku bûye rojeva herêm û cîhanê. Miletê Herêma Kurdistanê bi hemû pêkhateyên olî û etnîkî roja duşemê ji bo diyarkirina çarenûsa xwe ku bi yasayên navdewletî jî hatiye qebûlkirin, diçe ser sindoqan.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û partiyên siyasî yên Kurdistanê 7ê Hezîranê civînek pêk anîbûn û bi serpeştiya Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî û lihevkirina partiyên siyasî biryareke dîrokî, biryara pêkanîna referandûmê di 25ê Îlonê de derketibû. Piştî vê biryara dîrokî li hemû herêm û cîhanê rojeva sereke bû referandûma serxwebûnê. Bi nêzîkbûna roja pêkanîna referandûmê helwestên welatên cîran û civaka navdewletî jî hêdî hêdî zelal bûn.

Herêma Kurdistanê ji roja damezrandina xwe heta van rojên dîrokî ku xelkê Kurdistanê ji bo diyarkirina çarenûsa xwe diçe ser sindoqan, di her warî de nîşan da ku bi tu awayî ne gef e ji bo aramî û seqamgiriya herêm û cîhanê. Berovajî wê, Kurdistan ji bo dirûstkirina demokrasî û aramiya cîhanê weke piştevaneke bihêz derket holê û roleke girîng pêk anî. Herêma Kurdistanê bi Serokatiya Mesûd Barzanî li aliyekî bi hemû hêza xwe şerê terorê birêve bir û li aliyekîdin di warê siyaset û dîplomasiyê de bi hin aliyan re ket diyalogê û pêwendiyên xurt pêk anîn.

Herêma Kurdistanê heta niha li gelek navendên cîhanê nûnertiyên xwe vekirine û li Hewlêra paytext jî ku weke navendeke dîplomasiyê derdikeve pêş, bi dehan welatan nûnertiyên xwe vekirine. Şareza û pispor radigihînin ku her çiqas niha hêzên cîhanî bi awayekî zelal piştgirî nedin û li dijî xuya bikin jî piştî referandûmê ku Kurdistan wê bikeve qonaxa serxwebûnê, hêzên navdewletî wê pêwendiyên xwe yên li gel Kurdistanê bihêztir bikin û pêşdetir bibin. Herwiha diyar dikin ku di encama referandûmê de ku xelkê Kurdistanê wê îrade û daxwaza xwe ya ji bo serxwebûnê eşkere bike û ji hemû cîhanê re ragihîne, destê Kurdistanê wê xurt bibe û hêzên cîhanî jî wê li gor vê yekê tevbigerin û têkiliyên xwe yên li gel Herêma Kurdistanê wê xurtir bikin.

**"Dewletên cîhanê piştî referandûmê wê têkiliyên bihêztir ava bikin"**

Berpirsê Nûnertiyên Herêma Kurdistanê yên Derve Rêbîn Azad, radigihîne ku Herêma Kurdistanê her dem hewldana pêwendiyên baş daye li gel cîhanê û cîranên xwe û wiha pê de diçe: "Welatên navdewletî di vê heyamê de dîtin ku Herêma Kurdistanê ne gef e ji bo tu kesî. Di dahatûyê de jî Herêma Kurdistanê dê di pêwendiyên xwe yên li gel cîhanê berdewam bike. Cîhan jî wê bi têkiliyên bihêztir nêzîkî Kurdistanê bibe. Li gorî prensîbên navdewletî nikarin bêjin ku em piştevaniya dewletekê dikin, nikarin helwesta xwe wiha eşkere bikin. Niha dibêjin ev referandûm wê tesîrê li ser şerê terorê bike. Hemû dibêjin hûn mafdar in lê divê tesîr li şer û awareyan nebe. Herêma Kurdistanê jî û Serokatiya Kurdistanê jî ji her kes û aliyan re bi zelalî eşkere kiriye ku ev referandûm bi tu awayî tesîrê li şerê DAIŞê nake, tesîrê li ser koçberan nake, heta ku wê rewşa wan baştir bibe û ew ji bo tu kesî ne gef in. Ez weke akademîsyenekî hêvîdar im ku welatên cîran û cîhan bi çavekî din li mafên Kurdan binêrin. Herêma Kurdistan bi ezmûna xwe nîşan daye ku tu caran nabe metirsî bo tu kesî. Cîhan jî piştî referandûmê wê bi şiklekî bihêztir li gel Kurdistanê di têkiliyê de be."

**"Kurdistan ne metirsî û gef e"**

Rêbîn Azad herwiha dibêje, bazirganiyê her tim roleke girîng heye di navbera welatan de û axaftina xwe wiha berdewam dike: "Herêma Kurdistanê niha ji bo herêmê û cîranan devereke girîng e. Tirkiye û Îranê niha rêjeyeke bilind a bazirganî li gel Kurdistanê heye di hemû waran de. Niha bi hezaran kompaniyên Tirkiyeyê li Kurdistanê hene. Dîsa Îran jî li Kurdistanê xwedî kompaniyan e. Beriya niha li gel kompaniya Rûsî rêkeftineke girîng pêk hat. Ev mijar hemû ji bo dahatûyê girîng in. Herêma Kurdistanê di her warî de nîşan daye ku ne metirsîye ji bo dever û cîranan. Berovajiya wê piştevaneke girîng û bihêz e bo cîranan. Li hemû cîhanê jî wisa heye ku cîranan pêdivî bi hev heye. LÎ Herêma Kurdistanê di heyamên borî de (2013-2014) hatdîtin ku li gel şerê li dijî DAIŞê weke ku dihat pêşbînîkirin kêşe û kêmasî derkeftin. Sedema vê jî Bexda bû û tesîreke neyînî li ser cîranan jî çêbû. Îcar eger serbixweyiya me hebe wê tesîreke erênî li ser derdorê jî hebe."

**"Divê cîhan guh bide vê daxwaza miletê Kurdistanê"**

Serniviskarê Heftenameya Wişe Serbaz Salih jî li ser vê meselê diyar dike ku dewletên cîhanî li gor yasa û rêzikên xwe û pêwendiyên xwe yên li gel Îraqê tevdigerin û axaftina xwe wiha didomîne: "Ji ber wê yekê didin xuya kirin ku li dijî ne. Lê Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe ve biryar daye ku wê referandûmê pêk bîne. Miletê Kurdistanê wê biryara xwe bide û îradeya xwe nîşan bide. Tu kêmasî û guneheke wê nîne ku mirov ji xelkê bipirse ka çi dixwazin. Belê, niha nêrîna piraniya dewletan neyînî xuya dike lêbelê di rastiyê de ne wisa ye. Herçiqas Îran bi tundî li dijî be jî îro ji bo bazirganiya navbera herdu aliyan hewldanên wê hene. Miletê kurdistanê êdî naxwaze Îraqî bin û dixwazin Kurdistanî bin. Wê ev yek ji cîhanê re were eşkere kirin. Tiştekî xirab di vir de nîn e. Divê cîhan mafê Kurdan fêm bike. Em her ew Kurd in ku serok û nûnerên welatên dewletan dihatin Hewlêrê û qala qehremanî û camêriya Kurdan dikirin, em her ew Kurd in. Em ew Kurd in ku di şerê li dijî terorê dît ka çawa em şer dikin û rûmeta cîhanê jî diparêzin. Xelkê Kurdistanê êdî naxwaze Îraqî be, dixwaze Kurdistanî be. Ev daxwazeke rewa ye û divê cîhan guh bide vê daxwaza miletê Kurdistanê."

**"Piştî referandûmê têkliyên Kurdistanê yên bi cîhanê re wê xurtir bibin"**

Salih dibêje Kurdistan têkiliyên xwe li gel tu kesî qut nake û wiha dirêjiyê dide gotinên xwe: "Di 1991an de jî dema ku raperîn pêk hat, gelek welatan bertek nîşan dan, paşê Encûmena Asayîşê û welatên cîran jî di nav de hemû alemê îtîraf bi Kurdistanê kir. Piştî ku dîsa federalî bo Kurdistanê hat dayîn dîsa ji cîhanê bertek bilind bûn. Lê piştre dîtin ku Kurd xerab nîn in û daxwaza mafê xwe dikin, hatin li gel me rûniştin, têkilî avakirin. Kurdistanê jî xwe nîşan da ka çawa dikare roleke erênî bilîze. Tirkiye, Îran û welatên din bi milyon doleran rêjeya bazirganiyê heye, gelo çi xirabiya vê yekê heye? Dema ku dibînin karîgeriya Kurdistanê bo herêmê jî pir baş e, têkiliyên xwe xurt dikin û piştî referandûmê jî cîhan û herêm li gel Kurdistanê wê di têkiliyê de bin."

Di encama referandûmê de ku xelkê Kurdistanê wê îrade û daxwaza xwe ya ji bo serxwebûnê eşkere bike û ji hemû cîhanê re ragihîne, destê Kurdistanê wê xurt bibe û hêzên cîhanî jî wê li gor vê yekê tevbigerin û têkiliyên xwe yên li gel Herêma Kurdistanê wê xurtir bikin.



## "Cîhan ligel Kurdistanê ye, lê li gor prensîbên navdewletî nikarin bi eşkereyî bibêjin"

Akademîsyen û Nivîskar Omer Nuredînî jî li ser vê mijarê radigihîne ku ev zêdeyî sed salane ku têkoşîn û şoreşa Kurdistanê ji bo azadî û serxwebûnê berdewam dike. Di vê têkoşînê de me îcazet ji tu welatan negirt. Referandûm rêbazeke medenî û meşrû ye bo bicîkirina armanca miletê Kurd û wiha pê de diçe: "Civata navdewletî niha li dijî xuya dike, ji ber ku niha Îraq hê jî weke dewletekê xuya dike û cîhan nikare bi eşkereyî bêje me divê ev dewlet parçe bibe an dewleteke din çêbibe. Lê cîhanê jî fêm kiriye hert tişt. Encamdana referandûmê nabe sedema lawazbûna bereya li dijî DAIŞê an îstîqrara heyî ya li herêmê. Qebûlkirina mafên gelê Kurdistanê ne metirsî ye li ser tu aliyan. Ji damezirandina dewleta Îraqê heta niha qebûlnekirina mafên Kurdan bû ku bûye sedema tevliheviyê. Heta ku mafên Kurdan li Rojhilata Navîn neyên qebûlkirin, aramî nakeve vê herêmê. Mafê Kurdan e ku daxwaza mafên xwe bikin. Civaka navdewletî jî divê vê yekê bibîne. Kurdistanê eşkere kiriye ku deriyên gotûbêj û diyalogê vekirîne ji her kesî re."

## "Cîhan dê Kurdistanê nas bike"

Omer Nuredînî di dirêjiya axaftina xwe de diyar dike, "Dema ku Yekitiya Sowyetê, Yugoslawya hilweşiyan, cîhanê wê demê jî nedixwast ku ev belav bibin. Herwiha di meselaya Kosovayê de jî dîsa cîhanê qebûl nedikir, lê niha zêdetirî 100 dewletan Kosowa nas kiriye. Miletê Kurdistanê jî ev bi sed salane têdikoşe bo mafên xwe yên rewa. Îradeya gelê Kurdistanê, yekitiya siyasî ya nav mala Kurdan wê serxwebûnê jî bîne û pêwîst e herkes bo hemû îhtîmalan amade be. Enfalkirin, kîmyabarankirin û her tişt bi serê Kurdan hatiye, Îcar daxwazên Kurdan ên ji bo serxwebûnê çima zêde tên dîtin. Gelê Kurd amade ye ku hemû berdelan jî bide bo armanc û serxwebûna xwe. Yekrêziya nav mala Kurd wê destkeftan zêde bi xwe re bîne. Dewletên cîhanê jî bi demê re wê bibînin û wê Kurdistanê nas bikin."

## Sabiha Ünlü:

# Serxwebûna Kurdan wê bandoreke erênî li cîhana Îslamî bike

■ CESIM ÎLHAN

Sabiha Ünlü bi salan e ji bo jinên ku dixwazin xwe pêş bixin xebatan dike. Her wiha jineke Îslamî, nivîskar û çalakvan e Ünlü. Em bi Sabiha Ünlü re di derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê û nerîna Îslamîstan de axivîn. Ünlü dibêje serxwebûna Kurdan wê li cîhana Îslamî bandoreke erênî bike. Gotinên wek "Kurdistan Îsraîla duyemîn e" jî bi zanebûnî tên serwîskirin. Ew kesên ku daxwaza serxwebûnê ya Kurdan weke "Îsraîl a duyemîn" binav dikin qet samimî nayên ji min re. Divê ew kesên ku dixwazin têkilî û dostaniya xwe ligel Îsraîlê xurt bikin bila bifikirin bê ka ew Îsraîla çendîn in. Ünlü dibêje: "Ew kesên dibêjin em netewdewleteke din naxwazin û li hember serxwebûna Kurdan derdikevin ji tirsa wendakirina Kurdan û parçebûnê wisa dibêjin." Her wiha Ünlü diyar dike ku Îslamîst di derbarê mijara Kurdan de di hewildana weke fikra Kemalîstan de ne. "Nerîna Kemalîstan doh çawa be îro jî ew e û rê û rêbaza wan faşîzm û nijadperestî ye. Îslamîst jî çareseriya kêşeyê di şer û binpêkirinan da dibînin."

**Ew kesên referandûma Herêma Kurdistanê rexne dikin dibêjin 'Îsraîla duyemîn'...**

Berpirsiyarên ku dibêjin dê referandûm li Rojhilata Navîn bibe sedema talûkeyên mezin, fikra xwe ya di vê derbarê de dibêjin; "Em nahêlin li Bakurê Îraqê Îsraîla duyemîn ava bibe." Vê yekê jî ji ber ku Îsraîl piştgiriya referandumê dike, dibêjin. Îsraîlê di heman demê de daxûyanî da ku PKKê weke rêxistineke terorî dibîne. Yanê di vê mijarê de li gel Tirkiyeyê cih girt. Ji ber ku Îsraîl PKKê wek terorîst dibîne gelo dê Tirkiye nerîna xwe ya di derbarê PKKê de biguherîne. Ev tişt, lîstikên polîtîk ên dewletan e ku ji êvarê heta sibê diguherin.

**Li gor te teza "Kurdistan Îsraîla duyemîn e" rast e?**

Belê, ev gotina Îsraîla duyemîn bi zanebûn tê gotin. Ji bo li hember derketina referandûmê, bi Îsraîlê ve girê bidin dê zaftir deng bide. Ew kesên ji mijarê ne haydar in dê bibêjin; "Waaaa! Rast e gelo? Wê demê bila bê astengkirin." Dibêjin heke Kurdistan ava bibe ew ê jî weke Siyonîstan qetlîaman bikin û bi vê yekê jî heqaretê li Kurdan dikin. Bi awayekî vekirî buxtanan li Kurdan dikin û dibêjin ji bo ku Kurdistana serbixwe dê zilmê bike em li hember disekinin.

**Wekî ku tê gotin, gelo netewdewlet yekîtiya ummetê têk dibe?**

Netewdewleteke bi navê netewekî tê bilêvkirin ne ew organîzasyona ku em îdealîze dikin e. Di navê de kîjan netew zêde be bi navê wê netewê tê bilêvkirin. Eger pênaseyeke erdnîgarî di xwe de bihewîne tê qebûl kirin. Di vê mijarê de jî divê mirov li îdarekirina wê û pratîka wê binêre. Gelo kêmnetew di nava wê netewdewletê de bêyî ku asimîle bibin, weke xwe dikarin bijîn? Ziman, çand, ol û baweriya xwe bêyî ku di bin zextê de bimînin dikarin bijîn? Bi zimanê xwe perwerdehiyê dibînin? Dema rastî neheqiyekê tên dikarin xwe weke xwediyê wê dewletê biparêzin? Ji maf û azadiya bingehîn sûdê werdigirin? Dewleteke wisa ku ji mafê mirovan re rêzdar be yekîtiya ummetê têk nabe bi fikra min. Ji ber ku dê têkiliyên wê li gel dewlet û gelên din jî bi vî awayî bin, yekîtiya ummetê dê hêsantir be.

**Baş e, gelo ew kesên ku dibêjin divê Kurdistan weke netewdewletê nebe, netewdewleta Ereb, Faris û Tirkan li ku dibînin?**

Lê belê di serdema me de dewletên weke Ereb, Faris û Tirk ku neteweperestî ji ser xwe neavêtine û helwesta wan a faşîstî helbet ji bo yekîtiya ummetê û nasnameya misilmantiyê metirsî ye. Di binhişiya 'em netewdewleta Kurdistanê naxwazin' de tirsa dabeşbûn û wendakirina Kurdan heye. Ew kesên dibêjin em nahêlin yekîtiya Îraqê xira bibe û Îraq dabeş bibe, di tirsa wê de ne ku dor were wan jî. Ji ber ku dizanin Kurdên di bin serweriya wan de ne memnûn in.

**Li gor te divê Kurd pêşî çi bikin? Divê hûrgilî kîjan mijaran bibin?**

Li gor min kêmasiya Kurdan jî, Tirkan jî û heta hemû Rojhilata Navîn jî mehrûmiyeta ilim û irfan e. Yanê cehalet e. Danûstandinan li gel hev dikin lê şaşî û xeletiyên hev teqlît dikin; hêzê ne ji heq û edaletê lê ji iktîdar, tahakkum û tundiyê werdigirin. Em beredayî nehatine vê astê.

**Dema em li herikbarîna dîrokê dinêrin têkiliyên Kurd û Tirkan çawa ne, li gor hiqûqa baweriya Îslamê ev têkilî di çi rewşê de ne?**

Malûm e, serdema dawî ya Osmanî û serdema komarê ji bo Kurdan tije pirsgirêk e. Li gor hiqûqa Îslamê mixabin biratî tune ye. Pêwîstiya vê hiqûqê ji bo misilmanan îro jî mixabin nayê dîtin.

**Dema tu ji aliyê Îslamîstan ve dinêrî Îslamîstên Kurd û Tirk ji hev cuda dibin? Eger cudahiyek hebe ev maqûl e, bi fêde ye û divê bibe gelo?**

Belê ez cudahiyeke wisa dibînim. Kahir ekseriyeta Îslamîstên Tirk; Dema ku mijara Kurd û Kurdistanê dikeve rojevê bêyî ku lêkolînan bikin, zanyariyan berhev bikin li gor fikra dewletê ya fermî tevdigerin. Derketina vê cudabûnê jî ji ber tevgera Îslamîstên Tirk e. Ez wisa dinirxînim.

**Dema em li rabirdûyê û li niha dinêrin nerîna Kemalîst û Îslamîstan di derbarê Kurd û Kurdistanê de çawa ye, di navbera wan de çi cudahî hene?**

Wisa xuya dike ku bi armanca ku cudahiya di navbera xwe de bigirin tevdigerin. Îslamîst di derbarê mijara Kurdan de di hewildana weke fikra Kemalîstan de ne. "Nêrîna Kemalîstan doh çawa be îro jî ew e û rê û rêbaza wan faşîzm û nijadperestî ye. Îslamîst jî çareseriya kêşeyê di şer û binpêkirinan da dibînin. Li gor Îslamîstan jî çareserî di operasyon û qetlîaman de ye. Kurdên sivîl jî bi terorîzmê sûcdar dikin û bi KHKyan ceza dikin. Ev kirin, wan kesên ku dibêjin 'Gelo çi dibe, em vedigerin salên 1930an? mafdar dikin.

**Serxwebûna Kurdistanê dê çi bandorê li cîhana Îslamî bike?**

Ez di baweriyê de me ku serxwebûna Kurdan wê tesîreke erênî li cîhana Îslamî bike. Bi rastî ez di wê hêviyê de me.

**Ji ber çi Misilman distûra 'Misilman weke diranên şehekî wekhev in' bicih nayînin? Em dikarin bibêjin ev yek înkara ayeta Qurana Pîroz e?**

Ji ber ku ayetên Quranê û gotinên Pêxember têra xwe nayên qebûlkirin, wateyên wan nayên fêm kirin tim li hewa dimînin. Ji ber vê yekê jî nakevin pratîkê, di jiyana rojane de nayên ceribandin. Tenê di gotinê de dimînin. Herwiha siyasetmedar jî vê rewşa cahilane bikartînin. Dibêjin rêya me 'Sirat-î Misteqîm e.' Em rast û dirûst in. Rêya me rêya Quran û Sinnetê ye. Ew kesên ku ji wan re biatê nakin jî weke ku ji rêya heq veqetiya bin, li hember Quran û Sinnetan sekinîbin nîşan didin. Ev yek jî ji ulemaya ilm û irfanê rastî bertekan nayê, di çavê gel de rast û dirûst xuya dikin. Helwestên polîtîk dikevin pêşiya heq û hiqûqê. Rastî û rasteqînî jî tê piştguh kirin.

**Herî dawîn...**

Tişta îronîk ew e, ew kesên pesnê dewletên xwe didin, 'Ji ber ku kelepora Kurdan a dewletbûnê tune ye' dixwazin ku Kurd di bin serweriya wan a tundrew de bimînin. Ji ber tirsa parçebûna xwe bûne xwedî fobî û vê yekê jî didin qebûl kirin. Tevî ku dizanin ev sînor ji aliyê emperyalîstan ve bi çi awayî hatine xêzkirin jî.

Di binhişiya 'em netewdewleta Kurdistanê naxwazin' de tirsa dabeşbûn û wendakirina Kurdan heye. Ew kesên dibêjin em nahêlin yekîtiya Îraqê xira bibe û Îraq dabeş bibe, di tirsa wê de ne ku dor were wan jî. Ji ber ku dizanin Kurdên di bin serweriya wan de ne memnûn in.



Daxwaza serxwebûna Kurdan ji aliyê çar welatên misilman (Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriye) ve bi tundî û weke bobelatekê hat pêşwazî kirin. Tirsa wan ew e ku eger Kurd li hêlekê azad bibin û dewleta xwe ava bikin, wê tesîrê li beşên din jî bike û ewê Kurdên di destê xwe de wenda bikin.

Daxwaza serxwebûna Kurdan ji aliyê çar welatên misilman (Tirkiye, Îran, Îraq û Sûriye) ve bi tundî û weke bobelatekê hat pêşwazîkirin. Tirsa wan ew e ku eger Kurd li hêlekê azad bibin û dewleta xwe ava bikin wê tesîrê li beşên din jî bike û ewê Kurdên di destê xwe de wenda bikin. Ji ber ku vekirî ye ev mafê Kurdan e. Herkes dizane ku ji destê berpirsên van dewletan çi kişandine. Çi hejmara wan bi milyonan, çi mezinahiya erdnîgariya Kurdistanê ji dehan welatan û gelê qedîm ê Mezopotamyayê, êdî dema wan hatiye ku bi nasnameya xwe di bin dewleta xwe de bi awayekî azad bijîn. Herkes jî dizane ku vê yekê heq dikin.





### Sabiha Ünlü kî ye?

Di sala 1955an de li Çankiriyê hatiye dinyayê. Di sala 1978an de li Zaningeha Stenbolê beşa Botanîk Zoolojî qedandiye û piştî wê di heman zaningehê de beşa Derûnnasiyê dixwîne. Di demekê de li Nexweşxaneya Vakif Gureba weke biyolog dixebite.(1979-1982) Piştî wê nivîskariyê ji xwe re dike kar. Nivîsên wê di Kovara Mektup de mehane derketine. Çend kovarên din jî nivîsên wê weşandine. Ji hin gotarên xwe pirtûkeke bi navê 'Dilek Taşlari' çap kiriye. Pirtûkeke wê jî bi navê 'Bizim Toprağın Dili' heye. Nivîskar niha jî xebata çendîn pirtûkên din dike. Nivîskar xwedî gelek makaleyên di derheqê Kurd û Kurdistanê de ye.

---

**HOŞENG OSÊ**



## Gelo serxwebûna Kurdistanê bê Kerkûk çê dibe?

Yek ji pirsgirêkên rêkeftina 1970yî di navbera pêşewayê kurd Mela Mustafa Barzanî û rejîma Ehmed Hesen Elbekir - Seddam Husên de, çarenûsa parêzgeha Kerkûkê bû. Ji ber ku Barzanî dixwest Kerkûk di nava herêma otonom a Kurdistanê de be, lê rejîma Iraqê ne dixwest ev yek pêkbê. Di sala 1991ê de jî, pirsa Kerkûkê, morkirina peymana di navbera kurdan û rejîma Seddam Husên asteng kir. Her wisa ne ji pirsa Kerkûkê ba, dê Kurdistana Başûr ji sala 1970yî ve herêmeke otonom "xudmuxtarî" ba.

Di sala 2003an de û piştî hilweşandina rejîma Baas - Seddam Husên, dîsa mijar û pirsa Kerkûkê xwe da pêş, nemaze piştî ku kurda parêzgeha Kerkûkê rizgar kirin, lê ne xwestin bi mentiq û mêjiyê "desteserkirinê" vê pirsgirêkê çareser bikin û xwestin çareserî bi şêweyekî zagonî - yasayî be. Ango, kurd ji Nîsana 2003an û vir de karibûn Kerkûkê vergerînin Kurdistanê, lê nekirin.

Kurdan pirs û mijara Kerkûkê birin destûra nû a welêt û bi madeya 140î, çareseriya vê pirsê misoger kirin. Gerek ev made di sala 2007an de bihata pêkanîn. Lê hikûmeta Bexdayê ku weke gustîlkeke ye di tiliya Tahranê de, tim bihane û astengan ji pêkanîna madeya 140î re derdixist. Piştî sala 2007an, êdî berpirsên hikûmeta Iraqê gotin: "Madeya 140î ne qanûnî û yasayî ye!" Çima yabo ne qanûniye!?" Ji ber ku gerek di sala 2007an de pêkbihata, lê pêknehat. Lewma dema wê çûye." Bi vî şêweyê xapandinê hikûmeta Bexdayê, kurd xapandin. Û di mijara referandûmê de dîsa dixwazin kurdan bixapînin, dema dixwazin referandûmê paşve bixin.

Em vegerin pirsa xwe a sereke: Gelo Kurdistana serbixwe, bê Kerkûk çê dibe? Li gorî nêrîna min, dibe. Çima? Û ji ber çi? Ji ber ku eger kurd bibin dewleteke serbixwe, dikarin bêhtir, baştir û çalaktir vê mijarê li ser asta navnetewî çareser bikin. Ev belge û hêza yasayî ku di destê kurdan de heye (Hejmartina giştî a sala 1958an, madeya 140î û hebûna kurdan a siyasî û leşkerî di hundirê Kerkûkê de), ev tev qartên herî xurt û stratejîkin û kurd dikarin baş bikarbînin, eger dewlet bin.

Pê ve girêdayî mixabin, erebên sunne û erebên şîye di nava xwîna hev de gevizîne û hîna jî digevizin. Eger kurd, demeke kurt Kerkûkê ji erebên (Sunne-Şîye) re bihêlin, dê li ser bajêr têra xwe şer bikin û di dawiyê de, dîsa Kerkûk dê li kurdan vegere, ji ber ku erebên sunne mecbûr bimînin xwe bi kurdan ve gire bidin. Eger wisa nekin? Dê Îran wan qir bike.

Mebesta min ji vê nivîsê ew e ku mijara herî girîng û stratejîk serxwebûna Kurdistanê ye, ne bidestxistina Kerkûkê ye. Ango dewlet û serxwebûn esas werin girtin. Dibe ku mijara Kerkûkê niha kêşe û pirsgirêkan ji pêvajoya serxwebûn û dewletbûna kurda re derxîne. Kurdên başûr dikarin pirs û mijara Kerkûkê piçekî paş ve bixin. Ne ku jibîr bikin, yan jî bikin qurban, na. Lê bi zanebûn paşve bixin. Ji ber ku eger Kurdistana serbixwe were meydanê, dê pişt re Kerkûkê jî bi xwe re bîne.

Ez dibînim ku Kurdistana serbixwe bê Kerkûk jî dibe. Ji ber ku mafê serxwebûn û dewletbûna kurd û Kurdistanê ne girêdayî hebûn yan tunebûna Kerkûkê ye. Ango eger Kerkûk tunebana (weke parêzgeheke bi petrol û gaz) gerek mafê serxwebûn û dewletbûna kurdan jî tunebe? Nexêr.

Eger dewleteke kurdan di rojhilata navîn de çêbibe û bibe endama UN, helbet dê pirsgirêkên wê yên sînoran bi dewleta Iraqê re hebe. Kerkûk û Şingal dikarin bibin beşek ji van pirsgirêkên sînoran û kurd dikarin vê pirsê bibin Netewên Yekbûyî (UN) û bibin dadgeha edaletê a navnetewî li Lahey.

Dibe ku li ser asta navdewletî statûyeke taybet ji Kerkûkê re were peyda kirin ku di qûnaxeke dem kurt de derbas bibe û pişt re referandûmeke nû li Kerkûkê çêbibe, gelo Kerkûkî çi dixwazin? Dixwazin tevlî dewleta Iraqê bibin? Yan tevlî dewleta Kurdistanê bibin?

Dîsa dubare dikim, tu carî neyê fêmkirin ji vê nivîsê ku ez dixwazim Kerkûk were jibîrkirin! Yan jî çarenûsa vî bajarî bibe alaveke ji alavên bazariyê bi Bexdayê û civaka navdewletî re. Ez dibêjim; heta ji kurdan bê, gerek astengî, kêşe û pirsgirêka ji pêşiya dewletbûn û serxwebûna Kurdistana Başûr rakin, yan jî kêm bikin. Û piştî kurd di vê cîhanê de bûn dewlet? Wê çaxê, her kes layê bavê xwe ye.

Dewletbûna kurdan, rêya çarseriyê li pêşiya gelek pirs û kêşeyên kurdan di hundir û derveyî Iraqê de vedike.

## Sîyasetmedarên Kurd:

# Pêwîstî bi tezkereyan nîn e

**SÎNEMÊ SAKÎ**

Parlamentoya Tirkiyê beriya referandûma serxwebûnê, tevî ku hêj 40 roj mabûku maweyê wê biqede bi awayekî awarte kom bû û tezkereya ku destûrê dide Artêşa Tirkiyeyê derbasî axa Îraq û Sûriyê bibe qebûl kir. Di parlamentoyê de rojev referandûma serxwebûnê bû û parlamenteran nerinên xwe yên di derbarê tezkerê de anîn zimên. Tezkere bi dengênparlamenterên AKP, MHP û CHPê hat qebûlkirin û wekî din HDP li hember vê tezkereyê rawestiya.Di civîna tezkereyêya li parlamentoyê dema ku boaxaftinêdor hat HD-Pêberdevkêpartiyê û parlamenterê Rihayê yê HDPê Osman Baydemîr wiha axivî, "Yên ku aştiyê dixwazin divê ji vê tezkerê re bibêjin na. Ev tezkere îlankirina bi zelalî û eşkere dijminatiya li dijî 40 mîlyon gelê Kurd e." Bi dirêjkirina wextê tezkereya heyî tê armanckirin ku Tirkiye bikaribe bikeve Îraq û Sûriye. Lêbelê beriya referandûma serxwebûnê ya Herêma Kurdistanê, bi awayekî awarte kombûna parlamentoya Tirkiyeyê û bi lez û bez derbaskirina tezkereyê gelek bal kişand û bi xwe re gelek nîqaş anîn. Parlamenterê HDPê Adem Geverî û Cîgirê Serokê HAK-PARê Abdulmenaf Kıran li ser dirêjkirina tezkereyê û armanca wê ji Heftenameya Basê re axivîn.

**"Êdî Kurd ne bê xwedî ne, hêza Kurdan heye"**

Parlamanterê HDPê Adem Geverî radigihîne ku derbaskirina tezkereyê xetereyek e û wiha pê de diçe, "Dewlet bi xwe dixwaze mafê êrîşkirina dewletekî din, gelekî din ji wê Meclîsê derxîne. Ji bo vê jî em vê ya xetere dibînin. Dibe ku ev tezkere, sibêrojê bibe sedemên pirsgirêk û şerên mezin di nav gelan de. Lê Hikûmeta Tirkiyeyê her sal wek formalîte bi şêweyeke tund vê prosedurê yanî tezkereyê li Meclisê derdixe. Meclîs, ji ber şerê PKKê wê dawiyê jî ji ber rewşa Sûriyê ya ku bi şer berdewam dike salê carek vê qanûnê derdixist. Lê îro girîngiya biryara tezkerê ji ber ku li Başûr refendûmek tê lidarxistin heye. Dixwazin bi şêweyekî ne hiquqî êrîş Başûr û destkeftiyên Başûr bikin. Ji ber vê jî em wek HDP bi tundî li hember vê tezkereyê derdikevin. Em vê biryarê him meşrû nabînin him jî bo gelê Kurd û gelên Rojhilata Navin ev yek xetere ye. Û li dijî menfeat û berjewendiyên gelê Rojhilata Navîn e. Bi rastî em girîngî nadin vê biryarê ji ber ku dixwazin vê biryarê wek şantaj derxin holê. Ne mimkun e û ne jî hadê wan e ku operasyoneke leşkerî li Başûr pêk bînin. Lewre Başûr, rewşa statuya Başûr, hêz û derfetên Başûr ne wek berê ne. Êdî Kurd ne bê xwedî ne, hêza Kurdan heye, dîplomasiya Kurdan heye. Statû û qanûnên Kurdan hene. Parlamentoya Kurdistanê heye. Ez hêvî dikim ku her gef wê bersiva xwe bibîne."



**"Ji ber rewşa xwe ya heyî Tirkiye, nikare êrîşî Başûrê Kurdistanê bike"**

Li ser pirsa me ya, 'Bi ya we ev tezkere dê ji şantajê wêdetir neçe?' Geverî wiha bersivê dide, "Na, bi ya min naçe lê dibe ku ji bo carinan gelê xwe tetmîn bike û dilê wan xweş bike û her wisa Amerîka û Ewropa dengê xwe nekin dibe ku operasyonên leşkerî li ser çiyayên Kurdistanê bike car û caran. Ji vê bêtir ne mumken e ku operasyonên leşkerî yên bejayî yan jî em bêjin dagirkerineke mayînde yan jî em dîsa bibêjin gefekeşênber-berbiçav ne mimkune ku li ser Başûrê Kurdistanê pêk were. Bi rastî hêza Tirkiyeyê, rewşa aborî û siyaseta vê dest nade operasyoneke wisa. Îro dibe kuhikûmetaTirkiyêşikestinekebixwe û dibe ku rû bi rû rastî derbeyeke leşkerî bê. Li aliyekî jî di nav bajêr û Tirkiyeyê wek ku hûn dizanin zext û zorên sîyasî li ser gel û li ser mixalefetê zêde bûne. Lê nav xwe nikare li pêşiya gengeşî û îstifayan jî bigire. Him AKP bi xwe têk diçe him jî rewşa sîyasî û aboriya Tirkiyeyê têk diçe. Ji ber van sedeman ne mimkun e û dest jî nade ku bikaribin êrişeke derveyî bikin."

> Parlamentoya Tirkiyeyê di 23ê Îlona 2017an de bi awayê derasayî ji bo dirêjkirina maweya pêkanîna operasyonên derveyî sînorên xwe bi awayekî awarte kom bû û tezkere hat qebûlkirin. Bi vê biryara parlamentoyêTirkiye wê bikaribe leşkerên xwe bişîne Îraq û Sûriyeyê. Lêbelê kombûna parlamentoyê bi awayekî awarte û qebûlkirina tezkereyê beriya referandûma serxwebûnê di raya giştî de nîqaş bixwe re anîn.

**"Tezkere ne meşrû û demokratîk e"**

Geverî amaje dike ku Tirkiye bi mehan û bi salan bo Sûriyê jî digot emê êrîşê wan bikin û wiha pê de diçe, "Emê li vir bimînin û tevahiya sînorê Rojavayê emê bi dest bixin. Ev cihê kuReqa, ElBab,Menbîc û Ezazê jî nikare di destê xwe de bigire. Wekî din ev mixalifên Suriyê ku dewleta Tirkiyepişgirî dida wan ev bi xwe li hev nakin, ketine qirika hev. Em bêjin heta radeyekî Îran û Suriye jî ligel Tirkiyeyê nebin ne mimkun e ku Tirkiye gaveke piçûk jî biavêje. Bi kurtasî em dikarin vê ya bibêjin ku ev tezkereya îro ne meşrû, ne demokratîk ne îslamî ne însanî ye. Li ser Başurê Kurdistanê nemimkun e ku tezkere bê pratîkkirin."

**"Pêwistiya Tirkiyeyê bi tezkereyê tune ye"**

Cigîrê Serokê Giştî yê HAK-PARê Abdulmenaf Kıran jî destnîşandike ku bi tezkereyêniha dixwazin çavê Kurdan bitirsînin û daxwaza serxwebûnê paş de bixin, ne ku pêwistiya Tirkiyeyê bi tezkereyeke wiha heye û Kıran wiha pê de diçe, "Wexta ku Fermandarê Îranê hat Tirkiyeyê û Recep Tayyip Erdoğan li ser vê mijare got ku me bo PKKê li hevkiriye. Wê gavê min zanîbû ev tiştekî derew e yanî baş neaxivî... Tirkiye, Îran û Îraq û Suriye dibêjin bila Kurd diya xwe nebînin. Kurd nebin xwediyê welatekî azad û xwedî deskeftiyan. Yanî mesele ev e lê belê êdî ev dem bihûri yanê êdî Kurd mîna berê ne bê organîzasyon in. Ne bê xwedî ne, Kurd ne bê derfet in. Êdî Kurd ne mîna berê ne û tank, top, helîkopterênwan hene. Kurd ji bo ku xwe biparêzin xwedî derfetên teknolojiyê ne."

### "Kurd jî êdî dixwazin çarenûsa xwe diyar bikin"

Kıran dibêje Kurd jî êdî dixwazin îredeya xwe ya netewîbikarbînin û axaftina xwe wiha didomîne, "Kurd xistine serê xwe wê di Rojhilata Navîn de bibin dewlet. Em dibêjin sistemeke federal û wekhev hebe. Bila welatekî wisa bibe ku Kurd jî ji vî welatî hez bikin û xwe di vî welatî de ewle bibînin. Bila qanûna xwe ya esasî biguherînin. Bila Kurd bi zimanê xwe perwerde bibînin. Em dîsa bi hev du re bijîn. Mafê her miletê ku qedera xwe bi destê xwe tayîn bike heye. Kurd jî miletek in û dixwazin qedera xwe bi destê xwe tayîn bikin. Lê belê di yekîtiya Îraqê de îstikrar nemaye. Aramî nemaye, alozî heye û Şîa û Sune hevûdu didin, bi salan e bi hevûdu re şer dikin û DAIŞ jî li wir heye. Ez hefteya borî li Kurdistanê bûm min ji Tirkmenên li wir pirsî; 'Hûn pêvajoya referandûmê çawa dibînin û Tirkiye li dijî referandûmê ye, hûn çi difikirin?' Tirkmenên li wir gotin ku 'Em baş dibînin û piştgiriyê didin referandûma serxwebûnê." Kıran dibêje, "Em ne mîna berê ne û em jî siyaset û diplomasiyê dixwînin û dizanin. Bes e êdî bila me nexapînin. Êdî dewletên cîran nikarin serxwebûna Kurdistanê bidin sekinandin. Ger şerekî germ derkeve ev şer wê bibe şerê sêyemîn ê cihanê."

# Armanca Heşdî Şabî li Mûsilê çi ye?

**HÊMIN SALIH**

Li Mûsila ku gelek pêkhateyên etnîkî û olî yên weke Kurd, Ereb û Sûnne lê dijîn, operasyonên ku ji bo bajar ji destê DAIŞê derkeve berdewam dikin. Sala par di meha Cotmehê de Hêzên Pêşmerge, artêşa Îraqê dest bi operasyona bidestxistina bajarê Mûsilê kiribûn, li ser daxwaza Hikûmeta Navendî ya Îraqê Heşdî Şabî jî tevlî operasyonê bibû. Hêzên Pêşmerge piştî ku xwe gihand navenda bajarê Mûsilê li gor peymanê erka xwe bi cîh anî û vekişiya, lê Heşdî Şabî û artêşa Îraqê pêk ve tevdigerin. Rapora ku ji aliyê parlementerê Kurd ê parlementoya Îraqê ve hatiye amade kirin tê gotin ku, erka parlementoyê li hember Heşdî Şabî nemaye û Heşdî Şabî hewl dide ku demografiya herêmê biguherîne.

Di raporê de tê diyar kirin ku piştî artêşa Îraqê Telafer xist bin kontrola xwe, Heşdî Şabî ji bo demografiya Mûsilê biguherîne dest bi planeke bi rêxistin kirine bi vî awayî dixwazin astengiya li hember vegera Kurdan derxin. Tê diyar kirin ku Heşdî Şabî li Erebên Sunî û miletên Sunnî yên din û miletên baweriyên cuda gefa dixwe ji bo ku ji Mûsilê derkevin. Li aliyekî hatina Kurd û Suneyên Ereb bo herêmê tê asteng kirin lê li aliyê din Şîî li Mûsilê mal, milk û dikanan her wiha cîhên stratejîk dikirin.

> Di raporê de tê diyar kirin ku piştî artêşa Îraqê Telafer xist bin kontrola xwe, Heşdî Şabî ji bo demografiya Mûsilê biguherîne dest bi planeke bi rêxistin kiriye, bi vî awayî dixwazin astengiya li hember vegera Kurdan derxînin.


**"Heşdî Şebî astengiyan li pêşiya vegera koçberan derdixe"**

Di operasyona hevbeş a ku ji aliyê artêşa Îraqê ve tê birêvebirin de, îran piştgiriya Heşdî Şabî dike. Heşdî Şabiya ku Hikûmeta Navendî ya Îraqê piştgiriya wan dike roj bi roj hêza wan zêde dibe. Di rapora hatiye amade kirin de tê diyar kirin ku Heşdî Şabî bi taybetî li gundê Kurdên Şebek plana vekirina dibistanên Şîîyan dikin. Her wiha tê gotin, li navçeya Bertile gundê wê Xezneyê dê navê dibistanekê bikin Îmam Humeynî. Li ser van mijaran Serokê Meclîsa bajarê Mûsilê ji Heftenameya Basê re axivî û got, ''Komek ji Heşdî Şabî bû sedem ku rewşeke bêîstîqrar derkeve holê. Kurdên koçberbûne dixwazin vegerin lê ji wan re dibin asteng. Zordariyê dikin ku Erebên Sunne ji Mûsilê derkevin. Rewş roj bi roj xirabtir dibe. Em jî ji bo pêşiya vê bigirin dixebitin.

> Di rapora ku hatiye amade kirin de tê diyar kirin ku Heşdî Şabî bi taybetî li gundê Kurdên Şebek plana vekirina dibistanên Şîîyan dikin. Her wiha tê gotin, li navçeya Bertile gundê wê Xezneyê dê navê dibistanekê bikin Îmam Humeynî.

**"Heşdî şabî hewla xerakirina demografiya herêmê dide"**

Parlementerê Kurd ê parlementoya Îraqê Salim Şebek jî di derbarê vê mijarê de wiha axivî: ''Heşdî Şabî ji bo demografiya Mûsilê xera bike bi awayekî rêk û pêk dixebite. Astengiya ji bo vegera koçberên Kurd ê dûyemîn miletê Mûsilê yê qerebalix derdixin. Zordariyên hişk li Kurdên Mûsilê dijîn, dikin. Bi kuştin û revandina zorê didin wan. Ev tiştên dikin jî ji bo Kurd Erebên Sunnî û miletên ku ne Şîîne ji Mûsilê derxin. Mebesta wan Mûsila ku Sunnî û Kurd biguherînin û bike cîh warê Şîîyan. Heşdî Şabî, bi navê DAIŞê gelek Sunnî û Kurdan direvînin û daxwaza 10 hezar doların dikin. Piştî ku pereyan dîstînin zorê didin Kurd û Ereban ji bo ji bajêr biçin. Keleha Mûsilê cîhê artêşa Seddam bû lê niha li wir zindan vekirine, Kurd û Erebên ku direvînin dibin wir dikin zîndanan û daxwaza pereyan dikin. Gelek kes dibêjin me dikin zindanan û bi xêra pereyan em rizgar dibin lê mecbûr dimînin ku ji bajêr derkevin. Parlementerê Kurd dibêje, ''Me hemû dosye dane Serokatiya Parlementoya Îraqê lê ne artêşa Îraqê û ne jî parlementoya Îraqê li hember planên Heşdî Şabî dernakevin. Ji aliyê din ve malpera bi navê El Arabiya nûçeyeke fermandarekî artêşa Îraqê agahî daye dibêje, Heşdî Şabî malên welatiyên ku li Mûsilê dijîn dişewitînin.



### Heşdî Şabî çawa hat damezirandin?

Heşdî Şabî bi fetwaya Elî Sîstani hat damezirandin. Ji 42 lîwa û 79 koman pêk tê. Tê gotin 120 hezar mîlîtanên wan ên bi çek hene. Lê tê diyar kirin ku ev hejmara tê guhertin. Sala par parlementoya Îraqê yasayek derxist û dest bi şandina pereyan kirin bo Heşdî Şabî. Liwaya herî girîng a Heşdî Şabî Liwaya Bedir e. Hadi Amirê ku sala 2012an ji meclîsa bilind a Îslamî veqetiyaye niha fermandariyê dike. Her wiha Seraya Salam (Liwaya Aşitiyê) jî piştî fetwaya Sistanî ji endamê artêşa Mehdi ya girêdayî Mukteda Sadr'e hat ava kirin. Hezar endamê vê komê hene û yekser ji Sadr emir distînin.




Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

# Ji Bakur piştgiriyeke mezin bo Herêma Kurdistanê

BILAL ADLIĞ

Piştî biryara pêkanîna referandûmê ku di 7ê Hezîrana 2017an de hat dayîn Kurdên li seranserê cîhanê dijîn û bi taybetî jî yên Îran, Sûriye û Tirkiyeyê re bû sedema cejnê. Kurdan li seranserê cîhanê bi festîval û çalakiyan piştgiriya referandûmê kir. Li Tirkiyeyê jî partiyên siyasî, saziyên sivîl û kesên serbixwe xebat û çalakiyên wan heta referandûmê jî domiyan. Di serî de HDP bi giştî partiyên Kurdan piştgiriya xwe bo referandûmê bi awayekî vekirî bilêvkirin. Xebat û çalakiyên referandûmê ji 7ê Hezîranê heta 25ê Îlonê bi kurtasî wiha bûn:



> "Birayên me yên li Herêma Kurdistanê bi demokrasiya xwe, parlementoya xwe, partiyên xwe yên siyasî kîjan biryarê bidin tiştа li ser me ferz e emê rêzê lê bigirin û piştgiriya wan bikin."

**HDPê bê şik piştgirî da referandûmê**

Berdevkê HDPê Osman Baydemir ragihand ku: "Birayên me yên li Herêma Kurdistanê bi demokrasiya xwe, parlementoya xwe, partiyên xwe yên siyasî kîjan biryarê bidin tişta li ser me ferz e em rêzê lê bigirin û piştgiriya wan bikin."

Herwiha Hevserokê HDPê Selahattin Demirtaş ku di girtîgeha Edirneyê de zindanîkirî ye jî di derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de wiha axivî: "Qedera gelê Kurdistanê bi îradeya gelê Kurdistanê dê were diyarkirin. Ji bilî wan jî divê herkes rêzê li vê biryarê bigire. Em daxwazê ji birayên xwe dikin ku bi biryara netewî û parlementoyê biçin referandûmê."

**PAK, divê hemû cîhan rêzê li biryara Kurdistanê bigire!**

Serokê Giştî yê PAKê Mustafa Özçelik piştgiriya referandûma serxwebûnê kiribû û wiha axivîbû: "Divê ev biryara referandûmê ji aliyê hemû dewletên cîhanê û raya giştî ya cîhanê ve were qebûl kirin. Ji ber ku bi sedsalan e miletê Kurd bi caran hatiye qetilkirin, îmhakirin û bi neheqiyên nemayî re rûbirû maye, loma jî ev mafê herî rewa ye ku miletê kurd mafê çarenûsa xwe bi rêya vê referandûmê pêk bîne."

**Hereketa Azadî: Ev berpirsiyariyeke pîroz e**

Berdevkê Hereketa Azadî Ayetullah Aşitî di derbarê referandûmê de axaftinek pêkanî bû û di axaftina xwe de anîbû ziman ku avakirina dewleta serxwebûna Kurdistanê berpirsiyariya me ya pîroz e û wiha domandibû: "Hûn ji temamê cîhanê re çi dixwazin em jî ne kêm ne zêde ji Kurdan re wê dixwazin. Ji Ermen, Misilman, Ereb, Faris, Amerîka re dinyaya medenî çi dixwaze em jî wekî gelekî wê dixwazin."

**Hak- Par, piştgiriya biryara gelê Kurd berpirsiyariyeke netewî ye**

Serokê Giştî yê Hak-Parê Refik Karakoç jî di derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de daxuyaniyek dabû çapemeniyê û wiha gotibû: "Ev gaveke dîrokî ye. Divê di serî de em, hemû cîhan ji biryara gelê Kurd re rêzdar be. Piştgiriya birayên me ji bo me berpirsiyariyeke netewî ye."

**PDK Bakur, em xebata referandûm û serxwebûnê dikin**

Serokê Giştî yê PDK Bakur Sertaç Bucak jî di daxûyaniyeke xwe de wiha gotibû: " Em bi dil û can piştgiriya biryara birayê xwe yên Herêma Kurdistanê dikin. Em bi şev û roj ji bo referandûmê xebatan dikin û xebatên xwe bidomînin jî. Bi taybetî jî em xebatên xwe li Rojavayê Tirkiyeyê, di nav civaka Tirk de dikin da ku rêzê li biryara gelê Herêma Kurdistanê bigirin û bizanibin Kurdistana serbixwe ne li hember berjewendiyên Tirkiyeyê ye."

**ÖSP: Weke her miletekî mafê miletê me jî heye çarenivîsa xwe diyar bike**

Serokê Giştî yê Partiya Azadî û Sosyalîzmê (ÖSP) Sinan Çiftyürek jî ji Basê re gotibû ku: "Weke her netewekî, mafê netewa me jî heye çarenivîsa xwe bi destê xwe diyar bike. Ev mafekî rewa ye. Herwiha Herêma Kurdistanê îspat kiriye ku dikare bi siyaset, aborî û têkiliyên navnetewî xwe birêvebibe."

**Huda-Par: Divê herkes ji encama referandûmê re bi rêz be!**

Cîgirê Serokê Giştî yê Huda-Parê Mehmet Yavuz di daxûyaniya xwe de dibêje ku divê herkes ji encama referandûmê re bi rêz be û wiha didomîne: "Em naxwazin tu welatekî Misilman parçe bibe. Lê eger pêkvejiyan ne mimkin be belkî cîrantiyeke baş ji pirsgirêkan re bibe çareserî. Pirsa ji ned neçariyê ye. Di referandûmê de wê gel biryara xwe bide û divê herkes rêzê lê bigire."

**DBP, du caran got 'em li dijî' ne!**

Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), bi nirxandina referandûmê li Diyarbekirê civîna Lîjneyê lidar xist û di metna ragihandinê de ev gotin: "Di 25ê Îlonê de li Başûrê Kurdistanê bi pêkanîna referandûma serxwebûnê, bi armanca daxwaza gelê Kurd a azadiyê bi netewdewleteke biçûk dixwazin binpê bikin. Li Rojhilata Navîn çareseriya pirsgirêkan bi taybetî jî ya Kurdî ku ev sedansal e didome ne bi netewdewletan bi îradeya hevpar a gelan pêkan e."

DBPê roja din daxûyaniyeke nû da û di daxûyaniyê de wiha gotibû: "Em wek Partîya Herêmên Demokratîk, çareseriyeke ne tenê bo parçeyekî Kurdistanê, ji bo hemû beşan û hemû Kurdên li ser erdnigariyên cuda yên dinyayê dijîn, bi çareseriyeke di çarçoveya yekîtiya netewî de ku di sedsala 21an de bi Kurdan bide qezenckirin bawer dikin. Herwiha bangewazî li hêz û partiyên Kurdan dikin ku bilez ji bo civandina kongreya netewî bikevin nav hewildanê. "

**Înîsiyatîfa Piştgiriya Referandûmê çendîn xebat kirin**

Înîsiyatîfa Piştgiriya Referandûma ya Herêma Kurdistanê ku ji 5 partiyên Bakur û çendîn rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd pêk tê piştî komcivîneke li Diyarbekirê dest bi xebatên xwe kir û li çendîn bajarên Kurd û Tirkan konferans, panel û çalakî pêk anîn. Înîsiyatîf ji PAK, PDK-Bakur, Hereketa Azadî, OSP, Hak-Parê pêk hat.

## Parlementerê AKPê: Li hemberderketina referandûmê xeletî ye!

Parlementerê AK Partiyê yê Diyarbekirê Galip Ensarioğlu di derheqê referandûmê de wiha gotibû: "Li hemberderketina referandûmê xeletî ye. Di vê mijarê de Barzanî ji DYAyê re serî netewand wê ji me bitirse? Berovajî mayîna Kerkûkê li aliyê Kurdan ji bo me çêtir e. Eger di destê Herêma Ereban de bimîne ji bo me kişandina neftê zehmet e. Barzanî di rabordûyê de DYAyê li hember xwe girt û bi Tirkiyeyê re rêkeftin îmze kir."

Li aliyê din Ahmet Türk di daxûyaniyekê de wiha gotibû: "Em bi her awayî, bi dil û can piştgiriya referandûmê dikin. Di xeyala her Kurdekî de Kurdistana serbixwe heye. Bi rastî jî dema em li rêzdar Mesûd Barzanî jî dinêrin em dizanin ku ev daxwaz ya dilê wî ye jî."

## Ji KCDê piştgirî!


KCD (DTK) di kongreya xwe ya asayî ya 8.mîn de piştgiriya xwe bo referandûmê diyar kir. Daxûyaniya KCDê wiha ye: "Weke hemû gelên cîhanê, mafê Kurdan jî heye ku çarenûsa xwe diyar bikin û ev yek rewa ye, mafekî ku kes nikare li dijî wê derkeve û li gorî mafên gerdûnî ye. Em jî dê bi gelên xwe yên Herêma Kurdistanê re di nava tevkariyê de bin."

### Rewşenbîrên Bakûrê Kurdistanê:

# Referandûm mafekî rewa û demokratîk e

JÎN MAZÎ













Li bajarên Kurdan pêvçûnên di navbera PKK û hêzên ewlehiyê de dibin sedema mirina kesên sivîl jî. PKK êrîşî kesên li herêmê rê çêdikin, dike û çol jî bi Wesaîtên Hewayî yên Çekdarî tên gulebarankirin. Hefteya borî li Şirnexî karkerên Kurd ji aliyê PKK ve hatibûn kuştin. Di 31ê Tebaxê de jî çola gundê Oğula Colemêrgê bi WHÇ'yan hatibû gulebarankirin. Di bûyerê de Mehmet Temel( 35) canê xwe ji dest da, Îbrahim Sak (54), Îsmail Aydın (43), Musa Tarhan (54) jî birîndar bûn. Birîndarên ku li nexweşxaneyê hatin dermankirin, pişte re hatin binçavkirin û girtin.

Walitiya Colemêrgê di daxuyaniya xwe de got, kesên birîndar ' hevkar in'. Lê belê parlamenterên Colemergê yên HDPê û parlementerê Stenbolê yê CHPê Sezgin Tanrıkulu rave kirin ku ew kes ne 'hevkar' lê kesên sîvîl in. Wezîrê Karên Navxweyî Süleyman Soylu jî wiha axivî, "Em bi Wesayîtên Hewayî yên Bêmirov gelek terorîstan dibînin. Rêbazên me hene, em ji bilî van rêbazan teqez êrîş nakin. Bi taybet jî em êrîşî kesên ku em wan wek terorîst bi nav nakin an jî welatiyên ku em li cem terorîstan dibînin nakin. Em terorîst û welatiyan ji hev vediqetînin û esas li dijî terorê têdikoşin. Di vê mijarê de jî hêzên me yên ewlehiyê gelek bi baldarî tevdigerin. Hin şaşîtî û kêmasî dibe ku heb in. Em van yekan jî dinirxînin û wisa tevdîran digirin."

**" Mudexaleya Hevgirtî Tune ye!"**

Li aliyê din Baroya Amedê li herêmê hin lêkolîn kirin û diyar kir ku kesê ku canê xwe ji dest daye, sîvîl bûye. Li ser navê Baroya Amedê Serokê Baroyê Ahmet Özmen destnîşan kir ku bi malbata Mehmet Temelê ku di bûyerê de canê xwe ji dest daye re axivîne, malbatê ji van re gotiye, Temel bavê 3 zarokan e, li Colemêrgê dijî û karê tesîsatê dikir û ji bo geştê çûye wê derê.

Özmen amaje kir ku Mehmet Temelê ku piştî mudexaleya çekdarî canê xwe ji dest daye, Îbrahim Sak, Musa Tarhan û Îsmail Aydınê birîndar dema ku çûne ciyê bûyerê di noxteya ewlehiyê ya Depinê re derbas bûne û kontrola nasnameyên wan jî hêla hêzên ewlehî ve hatiye kirin. Özmenê ku bûyerê li gor mevzuata hiqûqa netewî û navnetewî dinirxîne wiha dibêje; "Dema nêzîkahiya di navbera cihê bûyerê û şûnwarên ku mirov lê dijîn û ew hêza mirinde ku hatiye bikaranîn li ber çavan bê girtin, li gor encamên ku rû daye, di asta civakeke demokratîk de ne mudaxaleyeke hevgirtî ye."

PKK jî li Uludereya Şirnexê êrîş bir ser karkerên ku di çêkirina rê de dixebitîn û 3 karkeran canê xwe ji dest dan. Hatibû îddia kirin ku li gundê Mişrefa girêdayî navçeya Lîceya Amedê jî WHÇyan 3 gundî dabûn ber guleyan. Herî dawî jî PKKîyan li çola gundê Çobanpınara li ser Gevera Colemêrgê ve êrîşî karkerên ku di xetên neqlî ên enerjiyê de dixebitin kir, 2 karkeran canê xwe ji dest da û karkerekî jî birîndar bûbû. Nîqaşên ku li ser encamên êrîşên WHÇ û PKK û komîsyonên bêalîgir berdewam in lê ji aliyê din ve jî xizmên kesên sîvîl ku canê xwe ji dest dane dibêjin êdî em naxwazin li herêmê pêvçûn çêbibin.

**"Bila zarokên îro, sibe nebin qurbanên şer"**

Enver Şahinê biraziyê Hazım Şahin ku dema li Geverê di xetên neqlî ên enerjiyê de dixebitî û ji ber êrîşan canê xwe ji dest dabû, di derheqê bûyerê de ji Heftanameya Basê re axivî. Enver Şahin dibêje, "Li herêmê şerekî du alî heye, gel êdî şer û pevçûnê naxwaze. Hazim jî bû qurbanê vî şerî. Her du alî jî zimanê şer bikar tînin. Her du alî jî dixwazin bila li miriyên wan xwedî bê derketin. Di pevçûna van her du aliyan de gel xisarê dibîne. Her wiha ev hê qonaxa destpêkê ye. Kî, kê dikuje ne diyar e. Hazim hat kuştin, herkes dizane sibe û du sibe 20 kes di rojekê de dibe ku bên kuştin. Tabîata şer wisa ye. Gel dixwaze ev şer bisekine. Ev mesele bi vî şerî nayê çareserkirin. Ger çareseriyeke nû dest pê bike, dibe ku hê baştir bibe. Divê her du alî jî dev ji zimanê şer berdin, ferasetеke çareseriyê lazim e. Hazım û 7 kesên ku di malbata wî de canê xwe ji dest dane mexdûrên vî şerî ne. Me gelek mirin dîtin û êdî em bi dîtina mirinan westiyan. Ger şer wisa berdewam bibe, zarokên îro dê sibe bibin perçeyekî vî şerî."

MURAD CIWAN



## Tehdîdên Tirkiyeyê; rast in an blof?

Ev nivîs ji bo bigihê çapê, roja înê berî diyarbûna biryarên Tirkiyeyê hat nivîsîn û îro, roja referandûmê dertê. Di van sê rojên dawîn de dikare biryarên giring derketibin, guhertinên nepayî bûbin.

Lê ku heta roja înê jî, bedêla referandûmê ya kurdan xwestî, ji Bexdayê û civaka navneteweyî nehat, pêşbînî ew e ku bi îradeyeka yekbûyî ya polayîn, welatiyên Kurdistanê; bi hemî netewe, dîn û mezheban ve, bi kincên xwe yên cejnanê îro diçin dengdanê.

Îrade çawa nebe polayîn! Ew bes dixwazin dinya bibhîze ku serxwebûnê dixwazin. Hiqûq û edalet, ji mezintirîn gunehkarekî/a li ber sêdarê ji dipirse 'daxwaza te ya dawîn çi ye?" Dinya naxwaze derfeteka wiha ji bide gelê Kurdistanê.

Referandûm ji alî kurdan ve ji bo dinya daxwaza wan bibihîze gelek giring e, lê otomatîkî statuyeka guherti ya hiqûqî ji wan re nayne. Yên ku ew qas li dijî wê ne, dikarin wijdanê xwe binpê bikin, bêjin ez referandûmê nasnakim, mafê serxwebûnê nedim te.

Na, bi vê namînin, tehdîdan diweşînin, hikumetan dişînin ser kurdan. Tevî ku esas heta dereceyekê bes siyasetên DYAyê û Îranê yên li ser Iraqê dixe tengasiyê û derbekê li îdeolijiya PKKê dixe jî, li serê hemuyan Tirkiye vedigijgiîne.

Hê hefteya çûyî wê dest bi tetbîqatên eskerî ên ser hidûd kir, Konseya Bilind ê ji bo hemleyên eskerî û aborî biciviya, pişt re ji hikumet… Tevî ku hê mehek ji xelasbûna middetê biryarê re maye, civîna parlamentoyê hat pêşxistin berî roja referandûmê da îznê bide hikumetê ku esker bişîne Suriyeyê û Iraqê.

Biryarên van civînan bûn çi, di vê nivîsê de helbet ne diyar in, lê agir ji devê Erdoğan dibariya. Midaxeleyeka eskerî ji tê de ê her awe operasyonên eskerî û aborî bihatana kirin, da kurd bibînin bê Tirkiye çi tîne serê wan.

Kurdistan li rojhilatanavîn take girava ewleyî, aramî, aştî û azadiya pirpêkhateyên neteweyî, dînî û mezhebi ye. Maliyên gelek berpirsên ereban jî tê de Kurdistan buye penageha bi milyonan milteciyan, vê, çalakiyên himbiz ên navneteweyî li gel xwe anîne.

Gelek hêz û navendên eskerî ên civaka navneteweyî li deverê ne, ji vê derê operasyonan dibin Suriyeyê û Iraqê; ser DAÎŞê. Midaxelekirineka eskerî têkdana ewleyî û aramiya hemû pêkhateyan, hilweşandina sîstema alîkarîkirina bi milyonan milteciyan, şikandina şerê li dijî DAÎŞê, êrîşkirina ser NY, YE, NATOyê û civaka navneteweyî ye jî.

Tu ji van navendan midaxeleyeka eskerî qebûl nakin. Ji bo ku li Iraqê ê rê li kaosekê veke, DYA ji binî ve naxwaze.

Lê Erdoğan, meriyekî gelek pragmatist e, bi qasî wê jî irrasyonel difikire, ji hesabkirina encamên dûrûdirêj bêpar e.

Yek ji taybetmendiyên wî ji ew e ku pêşbînîlênekir e. Ya tê gotin 'na lo, ew qas jî nake', ew dike. Heta niha hevrikên wî her ji ber vê taybetmendiyê li hemberî wî wenda kirine. Ew dikare bifikire bi operasyoneka eskerî deverên Başûr ên bin destê PKKê dagîr bike, heta plan bike ku serxwebûna Kurdistanê îlan bû ew jî van erdan têxe ser axa Tirkiyeyê. Bes aqlê selîm karin bibînin ku rewşa deverî û navneteweyî ya li jorê binavkirî, ji bo van deveran jî rêgir in. Dimînin alternatîfên aborî.

Eger Tirkiye xeta petrolê bigire, deriyê gumrikan daxe û ticareta xwe rawestine, ê zerareka mezin bide Kurdistanê, lê ji wê mezintir ê ew bi xwe bigihê zerarê. Ji bilî petrolê, ticaret ew e ku ya Tirkiye difiroşe Kurdistanê, ne bi vacayî. Di petrolê de jî, ew heqê neqilkirinê, lîmanan, depokirinan distîne û petrolê jî erzan ji xwe re hiltîne.

Petrola Kurdistanê ne tenê bi xetekê dertê derve, bi tankêran, di riyên qaçax û resmî re di ser Tirkiyeyê, Îranê, Bexdayê, Suriyeyê û Urdinê re jî derdikeve derve. Piştî şikandina DAÎŞê ji niha ve hidûdên Suriyeyê û Urdinê vedibin. Îsrailê ji niha ve benderên xwe ji bo firotina petrola Kurdistanê vekirine. Heta Îran ê ji ber hin sedemên li jêr rê li petrolê negire. Şirketên petrolê ên Amerîkî, Rusî, Almanî, Fransî, Îngilîzî, Japonî û Norvecî ên devasa ku bi milyar dolaran peymanên kevn û nuh bestine ê vê ambargoyê pûç bikin.

Di serî de DYA û Fransa, yên ew qas req daxwaza paşdexistina referandûmê dikin, ji ber zexta Tirkiyeyê ye da pitre zimanê wê li ser xwe kurt bikin, ne ku ji dil ew qas li dij in.

Di daxistina deriyên gumrikan û ambargoyên aborî de ji Tirkiye dikare di hundurê şeş mehan de bazarên xwe bi dest Îranê ve berde. Îran çend bêje ew ê ji deriyan daxe û ticareta rawestîne ji ev ne mimkin e. Carekê hidûdên Iraqê ên li gel welatiyên ereb ê neyên girtin. Di ser deverên ereb re ê riya bazirganiyeka xurt ber bi Kurdistanê vebe.

Ne aqilane ye ku Îran deriyan li ser deverên ku ser bi Gorranê, Komeleya Îslamî, heta YNKê û PKKê ve ne daxe. Îran çima deverên bin destên dost û hevkarên xwe têxe xesarê, bieks, ê wan mikafat bike.

Bazirganên wan deran helbet ê berê xwe bidin bazarên ku Tirkiye jê vekişiyaye. Bazirgan û sermiyangêrên van deveran ji ber xesara Tirkiyeyê ê berê xwe bidin Îranê. Bazarên Kurdistanê seranser ê li bazirganiya Îranê û Bexdayê vebin. Ticareta qaçax a li ser hidûdan, a li gel Rojavayê Kurdistanê ê PKKê li ser hidûdan, li Bahdînan û Şingalê xurttir bike, bibe bingehekî aborî ji bo Hilala Şîʿê.

Aya Tirkiye van hemû rastiyan û îhtimalên xurt dibîne? Eger rasyonel bifikire divê bibîne. Lê desthilat, bi taybetî Erdoğan ne di wî halî de ne. Tehdîdên Tirkiyeyê kîjan blof, kîjan rast in, belkî zehmet e bên dîtin, lê asan e fahm bibe ku ev tehdîd çi dibin bila bibin ê zerareka mezin bidin Tirkiyeyê, ew ê wenda bike, Îran ê ya di destê wê de heyî zeft bike.

Hunermendê Rojavayî Mîrê Hêkan:

# Hêk nîşaneya jiyanê ye

NÛJÎN ONEN

Di jiyanê de mirov bi gelek karan an jî bi hunerê re mijûl dibe, lê yek ji wan dibe sedem ku mirov pê bi nav û deng bibe. Mîrê Hêkan, hunermend, şanoger û endazyar e, ji rojavayê Kurdistanê li gundê Til Kidişê nêzî bajarê Dirbêsiyê ji dayik bûye. Di 19 saliya xwe de koçberî Almanya bûye. Li wir beşa Endazyariyê xwendiye di ber re jî beşa şanogerî û derhêneriyê qedandiye. 12 salan şanogerî kiriye 3 salan dekorê bernameyên televîzyonên Almanan çêkirine. Ev taybetmendiyên ku min jimartine hemû li aliyekî, hunermendiya wî li aliyekî. Ji ber ku ew bêhtir bi hunera xwe bi tabloyên ku ji qalikê hêkan çê dike tê nas kirin. Niha hûn dibêjin ma ji hêkan tablo tên çêkirin? Belê tên çêkirin û Mîrê Hêkan tabloyên xwe bi qalikên hêkan çê dike. Dema behsa hêkan tê kirin, ewil xwarin tê bîra mirov, lê ji xeynî xwarinê hêk bi xêra Mîrê Hêkan daxilî nav hunerê jî bûye. Ew qalikên ku em piştî hêkê dişikînin diavêjin çopê di tabloyên Mîrê Hêkan de ji nû ve bi rih dibe. Carinan dibe çav, carinan dibe çar parçeyên Kurdistanê, carinan dibe lehî, carinan di nav sînoran de asê dimîne. Mîrê Hêkan bi xwe li ser sînorê Rojava û Tirkiye mezin bûye û dema mirov bala xwe dide hunera wî, sînor, têlên sînoran, parçebûn jî xwe nîşan dide. Çend taybetmendiyên Cemal Ebdo hene, ev navê wî yê resen e, navê Mîrê Hêkan ji aliyê rewşenbîr û nivîskarê Kurd Celîlê Celîl ve lê hatiye danîn. Mîrên welatan, dewletan û eşîran hene lê mîrîtiyeke din jî di nav Kurdan de peyda bûye ew jî 'Mîrê Hêkan' e. Heta niha ji bo tabloyên xwe zêdetirî milyonek hêk bikaraniyê, Qalikê hêkan jî ji fabrîkayan distîne. Hunermendê Kurd Mîrê Hêkan ji Heftenameya Basê re qala hunera xwe ya bi hêkan re kir.



> "Ez ji hemû rewşên ku di hunera min de tên diyarkirin hez dikim û bi taybetî dema ku alav û reng bi watêyên xwe li hemberî hev têdikoşin, rengên sar û germ, tarî û ronî, alavên êrênî û neyenî û carinan jî bi hevûdu re li awaza didin an jî şoreşa rengan li dar dixin."

**"Dema li pînika mirîşkan hêk ji destê min ket û şikest rêwitiya min a bi hêkan li wir dest pê kir"**

Mîrê Hêkan sedema ku berê xwe bi vê hunerê vekiriye wiha rawe dike: "Şêwaz, gewde, xweşikbûn û bedewbûna hêkê bû sedem ku berê xwe bi vê hunerê ve bikim. Ji kadîna zaroktiya min, dema ku diçûm pînika mirîşkan da ku hêkan bidim hev, min rahişt hêkê, ji destê min ket û şikest. Li wir rêwîtîya min û hêkan dest pê kir."

**"Tabloyên min dika şanoyê ne"**

Dema ji hunermend pirsa "Çima hêk, ji bo we taybetmendiya hêkan çi ye? Mîr wiha bersiv dide: "Çima ne hêk? Ji ber ku hêk ez im, tu yî, ew in, hûn in, ma em hemû ne ji hêkan in ? Hêk nişana jiyanê ye, hêk di tabloyên min de şanogerek e û tablo bi xwe dika şanoyê ye."

**"Her tabloyeke min bi naveroka xwe cuda ye"**

Di tabloyeke we de em dibînin ku roj di nav çar perçeyên ji hevûdu cûda de maye, di hunera xwe de jî hûn parçebûna Kurdistanê, pirsgirêkên ku Kurd pê re rû bi rû mane bikartînin? Hin tabloyên we, hêk di nav tariyê, reşahiyê de weke heyvê dora xwe ronî dike, hêk bo we sembola çi ye? "Hemû xebatên min taybet in, tu xebatên min an jî tabloyên min nabin wekhev, her tabloyek cuda ye bi naveroka xwe, bi afirandina xwe û bi reng û bergê xwe, ji ber ku hêk bi gelek wateyên xwe tîbûna afirandinê li ba min têr dike."

**"Ji qalikê hêkê teniktir çi heye"**

Mîrê Hêkan wiha behsa çêkirin û zehmetiyên tabloyan dike: "Berî ku tablo bê ava kirin reş be li naveroka wê tê xêzkirin, dibe ku rojek, heftiyek, mehek, salek berdewam bike. Gelek reşbelekên min hê jî nebûne tablo, lê di warê avakirina teknîkî de ji heftiyekî ta du mehan berdewam dike. Zehmetiya herî mezin: Ma ji qalikê hêkê teniktir heye!"

Mîrê Hêkan ê ku bi tabloyên xwe rih dide qalikê hêkan, li ser helwest û fikrên Ewropayiyan ên li hember hunera xwe wiha vedibêje û fikrên profesorê Almanî Prof. Heinz Schepping ên di derbarê hunera wî de wek mînak dide: "Ez bi xwe bi taybetmendiya awayê zimanê Mîrê Hêkan, yê pêşketî daxbar bûme û bi wan gangaziyên wî mezin, bi hûrkatiya awayê wî û bi wan encamên, ku ew wan di zimanê xwe de bikartîne.... Ew bi wan reng, sazman (strûktûr) û tiştan (materiyal) naverokê tîne bilêvkirin, yên ku merovê temaşevan bi derbasbûna vê tabloya dinyayê neçar dike, ku ew wan nerînên xwe yên kevin biguherîne. Ew babet xwe ji me re weke tiştên balkişandî eşkere diyar dikin. Berê û niha prosêseke berdewam di navbera hebûn û cîhanê de heye, ya ku em jê re dîroka mirovatiyê dibêjin û em hemû tê de wek hev in, çi di xweşiyê û nexweşiyê de û çi di jiyan û mirinê de..."

Lê dema em helwesta Kurdan bi giştî li hember hunerê û bi taybetî li hemberî hunera wî dipirsin bersiveke bi vî awayî dide:

"Qels e lawaz e, hunera ku Kurd jê hez dikin hunera kuh e, lê hunera min yan av e, yan giya ne, ji Kurdan û hemû miletên Rojhilata Navin re 100 sal pêwist e da ku bigihêjin asta Ewropayiyan."

**"Ez ji hemû rewşên di hunera min de diyar dibin hez dikim"**

Mîrê Hêkan di dawiya axaftina xwe de fikr û ramanên xwe yên li ser hezkirina hunera xwe de wiha dibêje: "Ez ji hemû rewşên ku di hunera min de tên diyarkirin hez dikim û bi taybetî dema ku alav (tişt) û reng bi watêyên xwe li hemberî hev têdikoşin, rengên sar û germ, tarî û ronî, alavên êrênî û neyînî û carinan jî bi hevûdu re li awazan didin an jî şoreşa rengan li dar dixin."

### "Dengê fîşekan ji dengê hunerê bilindtir û bi hêztir e"

Mîrê Hêkan di derbarê rewşa hunerê ya li Rojhilata Navîn de jî wiha dibêje: "Nezanî, paşketin, ol, xizanî, li Rojhilata Navîn dengê fîşekan ji dengê hunerê bilindtir û bi hêztir e mixabin. Ji bo li welatekî huner pêş bikeve divê tiştên min bi nav kirine nemînin."

### "Min aboriya xwe ji hunerê veqetand"

Yek ji taybetmendiyê hunermendê rojavayî heye ku tabloyên xwe nafiroşe, taybetmendiya ku Mîrê Hêkan ji hunermendên din cuda dike yek jê ev e, ji ber ku gelek hunermend jiyana xwe bi hunera xwe birêve dibin, aboriya xwe wiha saz dikin. Lê Mîrê Hêkan vê yekê nake û sedema vê jî wiha vedibêje: "Ma evîna dilan tê firotin? Ma hezkirin tê pîvan? Ji ber ku min xwest hunera min azad be, ji bin destê bazara kirîn û firotinê û ji partî û rêxistinan derkeve min aboriya xwe ji hunerê veqetand."



Nûrî Şêxo:

# Ez bi armanca vejandina hişmendiya serxwebûnê dixebitim

DARA PORXELEK

Şerê navxweyî yê Sûriyeyê ku beriya 6 salan dest pê kiribû û trajediyên mezin bi xwe re anîbûn, dibe mijara film û belgefilman. Ji ber şerê li Sûriyeyê nêzîkî 3 milyon Sûriyeyî berê xwe dan Tirkiyeyê û li cem nasên xwe an jî di kampan de dimînin. Drama li welatê ku her roj bi hezaran kes dimirin, bê mal û bê war dimînin û terka welatê xwe dikin li Tirkiyeyê dibe mijara filmekî. Nûrî Şêxoyê ku ji neçarî ji Efrînê penaberî Stenbolê bûbû, tevî kêmderfetan be jî kurtefilmekî 18 deqîqe yê bi navê 'Elo Azadî' kişandiye. Nûrî Şêxo destnîşan dike ku ji bilî vî filmî senaryoya du filmên din jî amade ne û wê ew jî di demeke kurt de bên kişandin. Şêxo armanca nivîsandin û kişandina filmên xwe wiha bilêv dike: "Ez filmên xwe ji bo Kurdan dikişînim. Dixwazim Kurd di derbarê serxwebûn û azadiyê de bibin xwedî hişmendiyekê. Xwezî derfetên baştir hebûna û min jî karê baştir bikira. Dixwazim bi vê riyê, ji gelê xwe re xizmetê bikim." Herwiha Nûrî Şêxo berê jî di gelek film û belgefilman de lîstiye.

### "Filmê Pêşmerge amade ye"

Nûrî Şêxo di derbarê proje û senaryoyên xwe de jî wiha pê de diçe: "Projeyeke min heye li ser Pêşmerge ye. Film dirêjmetraj e û saet û nîvekê didome. Eger rojekê ez bikaribim derbasî Herêma Kurdistanê bibim ez ê filmê xwe li wir bikêşim. Min senaryoya wê jî nivîsandiye, amade ye. Kişandina vî filmî li Stenbolê ne pêkan e. Li vir ji bo alîkariyê jî şansê me tune ye. Dibe ku li Herêma Kurdistanê alîkarî ji me re bên dîtin. Eger ez biçim Herêma Kurdistanê ez ê li wê derê filmekî baştir derxim holê. Li wir ez ê rola pêşmerge ya di şerê DAIŞê de bikim mijar. Heft filmên min ên kurt hene. Min sê ji wan weşandine, 4 ji wan hê mane. Her filmekî min xwediyê peyamekê ye. Du filmên min ên dirêjmetraj jî amade ne. Yek li ser pakrewaniya pêşmerge ye, yek jî li ser Dê û Bavan e."

**"Kes wateya azadiyê nizan e"**

Aktor û Derhêner Nûrî Şêxo di derbarê kurtefilmê xwe de ji Heftenameya Basê re wiha diaxive: "Dema min filmê xwe nivîsand, di bin tesîra şerê Sûriyeyê de bûm. Ji dema ku şerê Sûriyeyê dest pê kiriye û vir ve herkes di derbarê azadiyê de diaxive. Lê ez wisa bawer dikim ku gelek kes nizanin wateya azadiyê jî çi ye. Armanca me bi vî filmî derxistina holê ya wateya azadiyê ye. Kengî em li nûçeyan dibêjin ji bo azadiyê gav têne avêtin, kêm maye em ê azadiyê bidest bixînin û filan. Min xwest ku mirovên me li vir li mafên xwe xwedî derkevin. Divê li hember zilmê serî hildin. Ez jî bi van fikran derketim rê û min him nivîsand him jî ez lîstim. Filmekî 18 deqîqe derket holê"

**"Me di şertên zehmet de film kişand"**

Şêxo di berdewamiya axaftina xwe de diyar dike ku filmê xwe di şertên pir zehmet de kişandiye û ji ber tunebûna derfetan di jêrzemîna avahiyekê de derxistiye pêşberî binêran. Lîstikvan Nûrî Şêxo dibêje: "Me ji bo kişandina filmê alîkarî ji tu kesî wernegirtiye û ji bo karekî serkeftî derkeve holê me pir zehmetî kişand. Bi rastî jî me alîkarî ji kesî nestand. Kamerayên me jî tunebûn. Lê em ê hêdî hêdî bimeşin û ez hêvîdar im wê karê me serkeftîtir bibe." Filmê Elo Azadî ku cara yekem derket pêşberî binêrên xwe gelekî erênî hat dîtin. Film ji aliyê Kurdên li Stenbolê dijîn û Kurdên ji Rojava yên penaber bûne ve hat temaşekirin.








FIRAT CEWERÎ

## Zimanê me

Kurd bi devkî û nivîskî nêrînên xwe ên li ser zimanê kurdî yê standart dibêjin. Ev sohbet û minaqeşeyên li ser zimanê kurdî bêhtir xwe ji civatên rewşenbîr û nivîskaran didin der. Mijara ku dikeve civatên rewşenbîr û nivîskaran, bi fikrên cihê tên şirovekirin û li riyên çareseriyê digerin. Nêrînên hin ji rewşenbîr û nivîskarên ku li dû riyên çareserkirinê ne hişk û xerabker bin jî, ên hinan jî dostane û çêker in. Hin bi dil, hin jî bi aqil tevdigerin. Hin di minaqeşeyên xwe de êrîşker in, dixwazin darê ji kokê de bibirin; hin jî çêker in, bi sebir in û bêhnfireh in. Hin ewqas bi pêş de diçin ku kurdan wek milet ji hev vediqetînin, sê zaravayên zimanê kurdî wek sê zimanên serbixwe bi lêv dikin, hin jî vê fikrê talûke dibînin û li ber yekîtiya miletê kurd wek xefkekê dihesibînin. Hin dibêjin em soran in, hin dibêjin em kurmanc in, hin jî xwe zaza dibînin.

Rast e, kurd hemû bi hev re soran in, zaza ne, kurmanc in, hewreman in, behdînî ne, torî ne, botî ne, serhedî ne û ez dikarin navên gelek dever û herêmên din lê zêde bikim. Lê hemû bi hev re kurd in, kurmanc in. Gava Ehmedî Xanî gotina "kurmanc" di şahesera xwe Mem û Zînê de bi kar tîne, ew ne bi maneya teng bi kar tîne, ew bi gotina "kurmanc" qesta hemû kurdan dike. Gotinên kurmanc, soran, zaza; kurmancî, soranî, zazakî ne zû de di zimanê me de bi cih bûne. Heta doh jî soranan ji soranî re digotin kurmanciya jêr û ji kurmanciyê re jî digotin kurmanciya jor. Yanî wan bi xwe ji zaravayê xwe re nedigotin soranî, lê wek kurmancî bi nav dikirin. Zaza hê jî ji zaravayê xwe re nabêjin zazakî, lê dibêjin kirmanckî. Naxwe çi kurmanc, çi soran, çi zaza ji yek miletî ne û bi yek zimanî, lê bi zaravayên cihê dipeyivin. Tu kurmancekî ku qet soranî nebihîstibe li herêmeke soranan bi cih bikî, ew ê piştî du mehan fêrî pêwendiya bi zaravayê soranî bibe û ew û şêniyên deverê wê bi hêsanî bikaribin bi hev re bidin û bistînin. Herçiqas gelek ji kurmancan zaravayê zazakî zehmettir dibînin jî, ez bawer dikim tu yekî kurmanc çend mehan li devereke zazayan bi cih bikî, ew ê jî piştî demeke kurt fêrî danûstandina bi zazakiyê bibe. Ev jî nîşana ku hersê zarava çiqasî ji hev dûr bin jî, dîsa nêzîkahiyeke wan ya yekzimaniyê heye.

Digel vê nêzîkahiyê, cûdahiyên zimanê me jî hene û gelek caran zehmet e em ji hev têbigihên. Ji bo em ji hev baştir têbigihên, hewcedariya me bi zimanekî yekgirtî û standart heye, lê îro bicihanîna vî zimanê yekgirtî û standart ne realîst e, ne hewce ye û ne jî mimkin e. Zimanê yekgirtî û standart tê maneya asîmîlekirina zaravayên cihê û ji nav zaravayan hilbijartina zaravayekî.

Gelek caran di hilbijartina zaravayan de, ne yê hejmara pir, lê zarava, an jî devoka desthilatdariya siyasî tê qebûlkirin. Îro li bakur desthilatdariyeke welê nîne, zaravayên kurmancî û zazakî ne zaravayên xwendin û nivîsandinê ne, herçiqas bi van zaravayan berxwedaneke mitewazî hebe jî, dîsa ne zaravayên perwerdeyê ne. Lê li başûr desthilatdariyeke siyasî heye, zimanê kurdî zimanê xwendin û nivîsandinê ye û zaravayê sereke zaravayê soranî ye. Ji xwe, minaqeşeyên ku xwe ji civatên rewşenbîrên kurmanc û zazayan didin der jî, li ser başûr in, li ser rewşa zaravayan û neheqiya ku li zaravayekî tê kirin e.

Bêguman divê mirov li dijî her celebên neheqiyan derkeve, lê ji bo heqî bi cih bibe jî divê mirov biaqil tevbigere, bi sebir be, pêşniyaz û projeyên maqûl û realîst pêşkêş bike. Divê haya mirov ji siyaseta herêmê, ji menfeet û tehdîdên welatên cîran hebe.

Kurmanciya ku di qirnê şanzdeh û huvdehan de bi Xanî û Cizîrî gihîştibû pêlika herî bilind û piştî wan bi sedsalan di bin nîrê zilmê de xwe gihandiye roja me û îro bêyî dibistan jî bûye zimanekî edebî, divê ji aliyê xwediyên xwe ve ji perwerdeyê bêpar neyê hiştin. Bêtoleransiya kurdan ya li hemberî zaravayekî kurdî, bêtoleransiya li hemberî yekîtiya miletê kurd e. Divê li bakur kurmanc zaza, li başûr jî soran kurmancan qebûl bikin, zaravayên wan wek zaravayên xwe bibînin û tiştên ji xwe re dixwazin ji wan re jî bixwazin.

Yekîtî û biserketina gelê kurd di vê de ye...

# Îsraîl û Amerîka li NY li dijî Komara Îslamî derketin

ESKENDER CEIFERÎ



Peymana etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlîbûna welatên ewropî hatibû îmzekirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêm dikirin û li hember jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin. Lê Îsraîlê ji destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin.

Hem Benjamin Serokwezîrê Îsraîlê Netanyahu û hem Serokê DYAyê Donald Trump ragihandin ku Komara Îslamî piştevaniya terorê dike û herî zêde xelkê Îranê ji vê mijarê zirarê dibîne. Teqez jî kirin ku divê rê li ber Îranê bê girtin.

Li gor daxuyaniya Koşka Spî, Trump û Netanyahudi mijara dorpêçkirina Îranê ya di herêmê de nerîneke hevpar diyar kirine. Komara Îslamî jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amerîkî da û got: "Wê cîhan wan gunehbariyên ku rayedarên rejîma siyonist a Îsraîl dike, ji bîr neke."

Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xwestiye peymana etomî ya bi Îranê re were guherandin û ji nû ve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew li benda piştgiriya hevalbendên xwe yên Ewropî ne. Tillerson jî got ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ew ê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yên welatên ku peyman îmza kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin.

**Rûsya dixwaze rêkeftina etomî bidome**

Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de da xuya kirin ku helwesta nelihevkirinê ya Serokê Amerîkayê Donald Trump a di derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Rûsya dibêje ku ew ê piştevaniya peymana etomî ya Îranê bikin ku wê bernameyê bidomîne ku ji aliyê civaka navnetewî ve hatiye pejirandin. Li gor Lavrov, wê pêkanîna peymanê ji bo bicîbûna aramiyê li herêmê û ewlekariya navdewletî mifah hebe. Herwisa got ku wê Rûsya bi welatên 5+1 re bicive ku peymana etomî bi Îranê re îmze kirine.

**Îran jî gefan li Amerîka û Îsraîlê dixwe**

Seyîd Ebdûlrehîm Musevî serfermandarê giştî yê Îranê gefan li Îsraîlê dixwe û dibêje ew ê Telavîv û Hayfayê bi erdê re bikin yek.

Mûsevî piştî hevdîtina Benjamin Netenyahu serokwezîrê Îsraîlê ya ku li New Yorkê li gel Donald Trump serokkomarê Amerîka pêk anîbû, Îsraîl weke rejîma siyonîst binav kir û îdîa kir ku ew ji ber rabûna tiştekî çewt a rejîma siyonîst a li hember Komara Îslamî ya Îranê hişyar dikin lê divê bizanin wê Îran di gaveke wiha de Tel Avîv û Hayfayê bi erdê re bike yek.

Daxuyaniya Îsraîlê li hemberî Îranê gelek tund bû û Îranê jî di bersiva wan de got ku bila Natanyahu serê xwe berjêr bike û çiqas emrê wê maye hesab bike. Ji ber her xetayeke ku rejîma siyonîst bike, wê emrê Îsraîl ya 25 salan hîn jî kurttir bike û wê Komara Îslamî, rejîma siyonîst bi leza birûskê tune bike û ji ser rûyê erdê rake.

Hesen Rûhanî serokomarê Îranê jî ragihand ku heke Amerîka ji peymana etomî vekişe û jê poşman bibe, wê bedêleke giran bide û li gor nêrîna Komara Îslamî, vekişîna Amerîkayê ji vê peymanê wê bibe sedema xercên mezin û ev tu fêdeyekê li amerîkiyan nake û wê zirareke mezin ji vî karî bibînin.

**Amerîka li ser pirsa etomî dudil e**

DYA bi raportên çalakiyên etomî yên Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara Wezareta Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsiyaran bersiv nade ku çima Amerîka di îmzekirina raportan de dudil e û sedem çi ne lê bi gotara Hesen Rûhanî zelal dibe ku dorpêçên nû yên aborî, gefê li rêkeftinê dixwin.

Peymana etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlîbûna welatên ewropî hatibû îmzekirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêm dikirin û li hember jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin. Lê Îsraîlê ji destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin.

Donald Trump serokê Amerîkayê gotibû ku ew ê di derbarê peymana etomî ya Îranê de, meha cotmehê hin gavan bavêjin.Teqez jî kiribû ku ew rêkeftin, yek ji peymanên herî xirab bû.

Beriya niha jî berpirsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye lê çavên Ewropiyan li Amerîkayê ne. Her biryareke ku Washington distîne, ji wan re dibe bandor. Birîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yên Îranê demildest îmze bike lê Trump li pey planeke din digere.

## Mijara Sûriyê jî weke etomê girîng e

Ji xeynî mijara etomî, Îsraîl di wê baweriyê de ye ku Îran kêşeya Rojhilata Navîn û tevahiya cîhanê ye û dibêje em rewşa Sûriyê dişopînin û dibînin bê çi li ser sînorên wê diqewime lê wê dest ji hêla xwe ya sor nedin û nehêlin Hizbullah û Îran bandora xwe li Sûriyê xurt bike. Herwiha ew nahêlin Îran û hevalbendên wê li Sûriyê û bi taybetî li ser sînorê Îsraîlê bi cih bibin.

Yoav Galant wezîrê avahîsaziyê yê Îsraîlê jî ragihand ku Îran welatek e ku bi hewldana têkbirina aramiyê li Rojhilata Navîn, serkirdatiya navenda şer li herêmê dike lê cihê Îranê li Sûriyeyê tine ye ji ber ku bi wî awayî di rêya zêdebûna bandora wê li herêmên kêmkirina rageşiyê li Idliba Sûriyê aramî li herêmê têk diçe. Teqez jî kir ku divê Îran vegere çemê Dicleyê yê dûrî Sûriyê û di nava sînorên xwe yên suriştî de bimîne.

Li ser heman mijarê, Nikki Haley nûnera Taybet a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li Neteweyên Yekbûyî jî daxuyand ku wan li Iraq û Sûriyê ligel hevpeymanên xwe yên herêmî pêşketin bi dest xistine lê ya rast ev e ku piştî têkbirina DAIŞê, wê Îran di vê proseyê de ne li ser dîreksiyon be û bi tu awayekî roleke lîdertiyê negire ser xwe.

# Îran xwe ji bo hevkêşeyên nû amade dike



Xuya dibe ku bi encamdana referandûma serxwebûna Kurdistanê tevî hemû guvaşên navdewletî, Îran ji berê goşegirtir dibe û divê xwe ji guhertina hevkêşeyên navçeyê re amade bike.

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ragihandibû eger bedêleke baştir hebe, ew ê referandûma serxwebûna Kurdistanê ya 25ê Îlonê li paş bixin. Ji vê referandûmê re heya niha ti bedêlek nehatine pêşniyarkirin ku bi dilê berpirsên Kurd be.

Wezîrên derve yên welatên Iraq, Tirkiye û Îranê li ser mijara referandûma serxwebûna Kurdistanê, daxuyaniyeke hevpar dan û teqez kirin ku her sê alî referandûmê red dikin û li gor wan, divê yekperçeyiya Iraqê bê parastin.Di daxuyaniyê de tu gef li Herêma Kurdistanê nehatine xwarin lê hatiye îdia kirin ku wê referandûm, hemû destkeftî û serkeftinên Iraqê di warê şerê terorê de bixe metirsiyê û wê gelek pirsgirêkên din li navçeya Rojhilata Navîn derxîne. Ji civaka navdewletî jî dixwazin pêdaçûnê di proseyê de bike û dibêjin pêwîst e di çarçoveya destûrê de pirsgirêkên Hewlêr û Bexdayê bêne çareserkirin.

**Îran dixwaze astengiyan çêbike**

Heya dema dawiyê jî çavên Komara Îslamî li Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê û aliyên nêzîkî Partiya Karkerên Kurdistanê ye ku astengiyan ji referandûmê re çê bikin. Lê berpirsên wan partiyan bi hemû hêza xwe piştgiriyê didin referandûmê.

Kongireya Civaka Demokratîk (KCD) di encamnameya kongireya xwe de got ku ew hevkarê xelkê Başûrê Kurdistanê ne û dewletên ku gef li Herêma Kurdistanê xwarine, bi tundî şermezar dikin û li gor baweriya wan, di encama referandûmê de, wê xelkê Başûrê Kurdistanê viyan û biryareke xurt nîşan bide ku di xizmeta yekîtiya netewî de be.

HDP jî çendîn caran ragihandiye ku mîna gelên hemû cîhanê, Kurd jî dikarin mafê xwe yê çarenivîsê bi dest bixînin û ev mafekî rewa û siruştî ye û ew weke HDP piştgiriyê didin referandûmê.

**Îran ji piştgiriya navdewletî nîgiran e**

Komara Îslamî herwisa ji piştevaniya aliyên navdewletî ditirse û dibêje rêkeftineke veşartî ji bo piştevaniya serxwebûna Kurdan heye.

Di demekê de ku Washington û hin welatên Ewropî, Tirkiye û Îranê neyariya xwe ji referandûma serxwebûna Kurdistanê re nîşan dane, lê Rûsiye ku hevpeymana Îranê ye jî, bi rengekî din tev digere û kompanyaya Rûsneft ya Rûsî çend rojan berî dema birêvebirina referandûmê, nûtirîn projeya xwe derxist û ew jî wek hevkariyekê ji bo Herêma Kurdistanê bi armanca pêşxistina pêşesaziya gaza sirûştî ji bo herêmê û şandina derve binav kir.

**Hin alî pişta Kurdan digirin**

Bernard Kouchner wezîrê berê yê Derve yê Frensayê ragihand ku her kes mifahê ji Kurdan distîne lê naxwazin gelê Kurd serxwebûna xwe rabigehînin. Û got pêwîst e piştevaniya wan bê kirin.

Partiya Sosyal Demokrat a Swedê ku desthelatdariya wî welatî dike, piştevaniya referandûma serxwebûna Kurdistanê dike û Anders Österberg, perlemanterê vê partiyê û endamê komisyona derve ya Parlamentoya Swedê dibêje ew piştevaniya encamdana referandûmê li Kurdistanê dikin.

Dewleta ku herî zêde Îran jê aciz e, Îsraîl e ku beriya hemû dewletan bi awayekî eşkere ragihand ku ew piştgiriyê didin dewletbûna Kurdan.

Ji bilî vê, 33 perlementerên Yekîtiya Ewropayê jî piştevaniya xwe ji bo referandûma serxwebûna Kurdistanê ragihandine.

Hevdem Qasim Sulêmanî fermandarê Sipaya Quds a Îranê ji bo poşmankirina Kurdan ji encamdana referandûmê, hewlên xwe xurt kirin û hin hevdîtin jî bi YNK'ê re pêk anîne lê Necmedîn Kerîm parêzgarê Kerkûkê û endamê Encûmena Bilind ya Referandûmê da xuyakirin ku li gor YNKê, tenê bi serxwebûn û azadiyê wê pirsgirêk çareser bibin.

Xuya dibe ku bi encamdana referandûma serxwebûna Kurdistanê tevî hemû guvaşên navdewletî, Îran ji berê goşegirtir dibe û divê xwe ji guhertina hevkêşeyên navçeyê re amade bike.



# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê



Li sînorê Kêleşînê du kolberên Kurd bi navên Mewlûd Ebdulla û Riza Idrîs ji ber topbarana hêzên Sipaya Pasdaran bi tundî birîndar bûn. Ew du kolberên Kurd niha di xweşxaneyê de di bin çavdêriya bijîşkan de ne û hatiye ragihandin ku rewşa wan ne baş e.

Ev zêdetirî heftiyekê ye ku çar welatiyên bajarê Sine di bin lêpirsînê de ne. Serwer Rustemî, Têymûr Ezîzî, Bêhrûz Ezîzî û Arif Kûhî heftiyek beriya niha li gundê Miraw ê navçeya Jaweroyê ji aliyê hêzên ewlehî yên bajarê Sine ve hatin girtin. Tometa wan endametî di partiyeke Kurdî de bûye. Heya niha nehatiye zanîn ka gelo ew li ku derê têne ragirtin. Penc welatiyên din ên wî gundî jî bi navên Sîrwan Rustemî kurê Elî Mihemed, Wekîl Rustemî kurê Mihemed Mîrza, Xudarehm Elîpûr kurê Mihemed, Hatem Elîpûr kurê Mihemed û Şueyb Mihemedî kurê Ceifer, nêzîkî du mehan beriya niha bi heman tometê hatine girtin û heya niha çarenivîsa wan nediyar e.

Bi biryara şaredariya Sine, ew karmendên ku mala welatiyekî Kurd şewitandibûn û di encame de wî jiyana xwe ji dest dabû, hatin berdan. Mehek beriya niha mala Muslih Husênî li bajarê Sine bi hênceta zêdegaviyê ji aliyê karmendên şaredariyê ve hate şewitandin. Wê demê Muslih di xewê de bû û bedena wî rastî şewatê hat. Piştî çend rojan, Muslih jiyana xwe ji dest da û çend kes ji ber nerazîtiya xelkê hatin girtin. Lê bêyî ku bêne darezandin, hatin berdan.

Ev du meh in ku du girtiyên siyasî yên Kurd bi navên Mihemed Nezerî û Seîd Şirzad li girtîgeha Recayîşehr li navenda Îranê ketine gireva birçîbûnê. Mihemed Nezerî ku bi tometa endamtî di partiyeke Kurdî de bi hepsa hertimî hatiye cezakirin û ji 24 salan beriya niha ve girtî ye, dixwaze dosyeya wî ji bo pêdeçûne radestî dadgeha pêdeçûnê bê kirin. Ev 24 sal in ku rê nehatiye dayîn Mihemed Nezerî carekê jî serdana malbata xwe bike. Seîd Şirzad jî ku bi tometên siyasî bi penc salan girtîgehê hatiye cezakirin, dixwaze ew kesên ku beriya niha li girtiyan dabûn, bêne darezandin. Wan du girtiyan ragihandiye ku heya xwasteken wan neyên bicîkirin, ew ê di gireva birçîbûnê de berdewam bin.

Hêzên ewlehî deh rojan beriya niha li bajarê Dêhgulanê ya parêzgeha Sine du welatiyên Kurd bi navên Azad Nadirî û Yedulla Şakirî binçav kirin. Tometa wan du kesan pêwendiya wan bi partiyeke Kurdî re bûye û tevî ku malbatên wan serî li saziyên ewlehî û dadê dane lê nayê zanîn ka gelo ew li ku derê têne ragirtin.

Muxtar Esedî mamosteyê Kurd li bajarê Tehranê hate girtin. Wî ji bo şopandina dosyeya xwe serî li dadgehê dabû lê li wir hate girtin. Muxtar Esedî çend salan beriya niha ji ber beşdariya wî di meşên nerazîtiyê yên mamosteyan de hate girtin û piştre bi danîna kefaletê hate berdan. Muxtar Esedî bi tometa hewldan li dijî ewlehiya netewî ya Îranê bi salek û rojek girtîgehê hatiye cezakirin.

Li Luristanê, Husên Dalvend li girtîgeha Birûcirdê û Hacî Sebzelî li girtîgeha Parsîlonê hatin darvekirin. Ew du welatî, bi tometa kuştinê di du dosyeyên cuda de bi darvekirinê hatibûne cezakirin.

Li bajarê Îlamê welatiyekî Kurd bi navê Semîr Dîwbend li ber çavên xelkê hate darvekirin. Semîr salekê beriya niha bi tometa kuştina jinekê li wî bajarî hate girtin û piştre bi heman tometê bi darvekirinê hate cezakirin.

Li bajarê Islamabadêxerb ê Kirmaşanê welatiyekî Kurd bi tometa kuştina du kesan hate darvekirin. Ew welatiyê Kurd tometbar bû ku çend mehan beriya niha keçek li wî bajarî kuştiye. Piştî binçavkirinê, ji aliyê dadgehê ve bi darvekirinê hate cezakirin.

Welatiyekî Kurd bi navê Dawûd Hacîzade li meydana Şaredariyê li bajarê Selmasê li ber çavên xelkê hate darvekirin. Ew welatiyê Selmasê tometbar bû ku dayîk û xwîşka xwe kuştine. Wê demê, Dawûd ji ber bikaranîna madeyên hişber kontrola xwe ji dest dabû û bi kêran êrîşî ser wan kiribû. Di dema darvekirinê de bapîr û birayê wî jî li wê derê bûn.

Li girtîgeha Sine jî jineke Kurd re hatiye ragihandin ku wê di demeke nêzîk de were darvekirin. Navê wê girtiyê, Arezû Rehîmî ye ku du salan beriya niha bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber hate girtin û ji aliyê dadgehê ve bi darvekirinê hate cezakirin. Beriya niha daxwaza Arezû Rehîmî ji bo pêdeçûnê, di dadgeha pêdeçûnê de hatibû redkirin.

Hêzên Sipaya Pasdaran li gundê Elyasî li navçeya Serpêla Zehaw li Kirmaşanê kolberekî Kurd birîndar kirin. Piştre wan hêzan dixwastin hin kolberan jî binçav bikin lê xelkê wî gundî li hemberî wan derketin û di encamê de pevçûn di navbera wan û hêzên Sipaya Pasdaran de derket û xelkê rê neda ew kolber bêne binçavkirin.

Li sînorê Hacî Omeran ê Pîranşarê yê di navbera Rojhilat û Başûrê Kurdistanê de kolberekî Kurd bi navê Hemze Mewlûdpûr ji ber nexweşiyê di bin givaşa barê giran ê li ser milên xwe de jiyana xwe ji dest da. Temenê wî kolberî 51 bû.

Li sînorê Xoyê yê di navbera Rojhilat û Bakurê Kurdistanê de kolberekî Kurd bi navê Cehan Mihemedlû di encama teqeya rasterast a hêzên sersînor de bi tundî birîndar bû. Niha ew kolberê Kurd ji bo nexweşxaneyeke bajarê Ormiyê hatiye veguhestin. Bijîşkan ragihandiye ku ji berkûrbûna birîna wî, dibe ku her du lingên xwe ji dest bide.

Li sînorê Kêleşînê du kolberên Kurd bi navên Mewlûd Ebdulla û Riza Idrîs ji ber topbarana hêzên Sipaya Pasdaran bi tundî birîndar bûn. Ew du kolberên Kurd niha di xweşxaneyê de di bin çavdêriya bijîşkan de ne û hatiye ragihandin ku rewşa wan ne baş e.

## 72. Civîna Giştî ya Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî:

# Cîhaneke baştir pêkan e?



MISTEFA PÎRAN

Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) civîna xwe ya 72. bi beşdariya 120 serokatiya dewletan an jî hikûmetan di 19ê Îlonê de li dar xist. Civîn dê heta 25ê Îlonê bidome.

Civîna ku li Eyaleta New Yoka DYAyê destpê kir, 72mîn civîna ewlekarî ya KENYyê ye. Şansolyaya Almanya Angela Merkel, Serokê Rûsyayê Viladimir Putin, Serokê Çînê Şi Cinping beşdar nebûn. Lê serokê DYAyê Trump jî tê de serokên 120 welatan amade bûn di civînê de.

> "Cîhana me di rewşeke xirab de ye, mirov bi êş in, hêrs, bêbawerî zêde dibe, wekhevî ji holê radibe, pevçûn berfireh dibin, keşûhewa diguhere. Aboriya gerdûnê her ku diçe mezin dibe lê civaka gerdûnê têk diçe.

Di civîna giştî ya Konseya Ewlekarî ya NYê de biryarên berfirehkirina konseyê, çareserkirina kêşeya Filîstîn – Îsrailê bi du dewletan, Rêkeftina Keşûhewa ya Parîsê, Sûriye û Îraq mijarên sereke bûn. Referandûma Herêma Kurdistanê jî yek ji mijarên girîng ya civînê bûn. Di Civîna Giştî de daxwaza reforman jî hat kirin.

Guterres weke Sekreterê Giştî yê NY cara yekem di civînê de axivî û wiha got: "Cîhana me di rewşeke xirab de ye, mirov bi êş in, hêrs, bêbawerî zêde dibe, wekhevî ji holê radibe, pevçûn berfireh dibin, keşûhewa diguhere. Aboriya gerdûnê her ku diçe mezin dibe lê civaka gerdûnê têk diçe. Civak dabeş dibin, gotinên siyasî parçebûnê bilêv dikin. Weke cîhaneke parçebûyî pêdiviya me bi hevgirtinê heye. Em dikarin pêkve cîhana xwe bikin cihekî xweştir û baştir. Pêkve aşitî û baweriyê tesîs bikin. Em dikarin cîhana xwe xweştir bikin." Guterres di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser mijarên Myanmar, Filîstîn – Îsrail, Terorîzma navnetewî, kêşeya keşûhewa û penaberan.

**Daxuyaniya Konseya Ewlekariyê ya referandûmê**

Konseya Ewlekariyê di derbarê referandûma Herêma Kurdistanê de jî daxuyaniyek belav kir. Di daxuyaniyê de amaje pê kirin ku têkbirina îstîkrarkirina herêmê û çareserkirina kêşeyan ligel hikûmeta navendî bi rêya diyalogê ye.

### Konsey ji 15 endaman pêk tê

Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) di nav welatên endamê Neteweyên Yekbûyî de beşa herî girîng a sazkirina ewlekarî û aştiyê ye. Biryarên Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî hemû welatên endam digire nava xwe. Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî xwedî 15 endaman e. Ji van welatan 5 ji wan endamên daîmî ne. Deh ji wan jî yên hatine hilbijartin in. Endamên Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî Rûsya û Çîn weke dewama SSCB û Komara Çînê ji aliyê Konseyê ve hatine qebûlkirin. Mafê van welatan di Konseyê de heye ku biryaran veto bikin. Di Konseya Ewlekarî ya Neteweyên Yekbûyî de dewletên ku mafê wan ê vetokirina biryaran heye ev in: Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê, Îngiltere, Fransa, Çîn, Rusya û 10 welatên hatine bijartin in. Endamên hatine bijartin bi awayekî demkî ji her du salê carekî ji aliyê konseyê ve tên hilbijartin. Serokatiya konseyê jî mehê carekî ji aliyê welatên endam ve tê hilbijartin. Endamên Neteweyên Yekbûyî ji bo biryar bi lez bicih bibin mafê erê-kirinê dane Konseya Ewlekariyê û dema Konseya Ewlekariyê biryarê bide tev dinasin. Ew jî wan biryaran dipejirînin.

**Endamên Daîmî**

DYA, Rusya, Komara Gel a Çînê, Îngîltere û Fransa.

5 Endamên ku dê di navbera 2016-2017an de derbasdar bin

Japonya, Misir, Ukrayna, Uruguay û Senegal

5 Endamên di navbera salên 2015 – 2016an de derbasdar in

Venezuela, Angola, Malezya, New Zeland û Spanya

# "NY ji bo ku me bibe bihûştê ava nebû"

Netewên Yekbûyî (NY) Piştî ku di sala 1945an de ava bû, di politikaya global, normên têkiliyên navnetewî û di teşegirtina dinyayê de bû xwedî bandor. NY ya ku di demên şer û qeyranan de dikeve rojevê, di eslê xwe de ji DYA û ji aligirên wê yên şer ên wekî Japonya û Almanya pêk tê.

NY rêxistineke qerase yê xwedî bername, ajans û beşan e. Xwediyê 40 hezar xebatkar û nêzîkî 40 milyar dolar aborî ye. Her wiha di bin fermandariya xwe de xwediyê 100 hezar leşker e û li deverên ku şer lê diqewime bi rola 'parêzvaniya aştiyê' radibe. Digel ku di peymana Netewên Yekbûyî de peywireke wan a weke parêzvaniya aştiyê tune, vê saziyê ji sala 1950 û heta roja me gelek peywirên wisa bi cih anîne.

Di çerçoveya Lijneya Giştî ya NY de, hemû endamên NY di meha îlonê de li New Yorkê dicivin û li ser meseleyên gerdûnî yên metirsîdar bi hev dişiwêrin. Her wiha tê nîqaş kirin ku NY bi politikaya globel re li hev be. Ev civînên salane dike ku serok bi hev re têkevin danûstandinê. Gelek hevdîtînên nefermî yên du-dewletî û axaftinên serokên herî xurt di cînahê de elaqeyeke taybet dibînin.

**Endamên daîmî xwedî statuyeke taybet in**

Peywirên bingehîn ên NY ew in ku di navbera dewletên endam de pergaleke bi rêkûpêk birêve bibe, aboriyeke emirdirêj saz bike, mafên mirovan bi pêş bixe, hawirdoriya gerdûnî biparêze, xizanî û birçîbûnê kêm bike. Endamên hertimî yên Konseya Ewlehiyê ku mafê wan ê wetoyê heye xwediyê statûyeke taybet in. Lê Konseya Aborî û Civakî û Dîwana Edaletê yê Navnetewî bêhtir xwediyê sazûmaneke wekhevîparêz e.

NY tu caran bi wê erkê ranebû ku pevçûn û hevrikiya di navbera dewletan de ji hole rake. Û tu caran mîsoger nekiriye ku wê nîrên li ser mirovahiyê yên wekî azadiya mirovan ji binî ve têk bibe.


**Xwedî mezintirîn meşruyetê ye**

Peywîra sereke ya NYê ku weke rêgezekê bo xwe pêk aniye alîkariya ji bo avakirina derdoreke navdewletî ye ji bo çareserkirina kêşeyên gerdûnî bi maliyeteke kêm. Weke platformeke navdewletî ku xwedî mezintiriîn meşruyetê ye tê qebûlkirin û welatên ji erdnigariyên cihê, hêzên cuda û nasname û siyasetên ji hev cihê tê de temsiliyeta xwe dibînin.

Bertek û dijderketinên li hember 'mafê raserî' ku hêzên rojavayî xwediyê wê ne, herî zêde ji aliyê hêzên ne rojavayî ve tên. Li gorî wan NY ji bo valahiya di navbera her du cîhanan de têrî nake. Ew welat radigihînin ku NY li hember hemahengiyên niha qels dimîne û herwiha ku Îngîltere û Fransa xwedî mafê wetoyê ne û ev jî ne wekheviyekê pêk tîne, diyar dikin ku nikare gengeşî û şerên heyî asteng bike û ji ber vê yekê jî rexne dikin. Dag Hammarskjöld ku di navbera salên 1953-1961an de Sekreterê Giştî yê NYê bû, bi bîrxistina şerê sar yê di navbera blokên Rojava û Rojhilat de, gotibû; "NY ne ji bo ku me bibe bihûştê, ji bo ku me ji dojehê biparêze hate damezirandin" û bi van gotinan peywîra NY ya dirûstkirina aşitiyê nîşan dabû.

Aliyên ne rojavayî daxwaz dikin ku ajans û dezgehên NY, ji bo hêzên ne rojavayî qadeke berfirehtir veke û di Banka Cîhanî û IMFê de bibin xwedî mafekî zêdetir bo dengdanê. Her wiha daxwazeke din jî ew e ku welatiyên van dewletên ne rojavayî di nav burokrasiya NYê de peywîrên pilebilindtir bidest bixin.

# UNPO piştgiriya Kurdan dike



Bi nêzbûna referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ji her çar aliyên cîhanê di derbarê vê mijarê de daxuyanî li pêy hev tên. Civata Ewlehî ya Neteweyên Yekbûyî referfandumê weke metirsiyekê dinirxîne. Lê Rêxistina Navneteweyî ya Netewe û Gelên Bêtemsiliyet (UNPO) daxuyaniyek belav kir û piştgiriya xwe bo referandûma serxwebûnê Herêma Kurdistanê nîşan da.

> Di daxuyaniyê de bal kişandine ser mijara kêmnetewan û dibêjin, ''Ji bo parastina mafê kêmnetewan jî pêdivî bi referandûmê heye.'' Di berdewamiya daxuyaniyê de, ''Dema di encama referandûmê de dengê ''Belê'' bêhtir derkeve divê Hikûmeta Navendî ya Îraqê rêzê ji vê encamê re bigire. Em heta dawiyê piştgiriya tayinkirina qedera mafê gelê Kurd dikin û diparêzin.''

Di daxuyaniyê de hatiye diyar kirin ku referandûma Kurdistanê ya dê 25 îlonê pêk were ji bo biryardayîna qedera gelê Kurd pêngaveke girîng e û gelê Kurdistanê pirsgirêkên xwe bi rêyên siyasî dê çareser bike û ev mafê wan e. Her wiha di daxuyaniyê de bal kişandine ser mijara kêmnetewan û dibêjin, ''Ji bo parastina mafê kêmnetewan jî pêdivî bi referandûmê heye.'' Di berdewamiya daxuyaniyê de, ''Dema di encama referandûmê de dengê '' Belê'' bêhtir derkeve divê Hikûmeta Navendî ya Îraqê rêzê ji vê encamê re bigire. Em heta dawiyê piştgiriya tayinkirina qedera mafê gelê Kurd dikin û diparêzin.''

Di daxuyaniyê de rexne li Hikûmeta Navendî ya Îraqê jî tê girtin û balê dikşînin ser vê mijarê ''Raya navneteweyî û civak divê rêzê li daxwazên meşru yê gelê Kurdistanê bigrin.

**UNPO, Rêxistina Navneteweyî ya Netewe û Gelên Bêtemsiliyet, çawa hat damezirandin?**

Dewletên ku nebûne endamê Neteweyên Yekbûyî di sala 1991ê de organîzasyona xwe damezirandin. Navê wê yê kurt UNPO (Rêxistina Navneteweyî ya Netewe û Gelên Bêtemsiliyet) weke organizasyoneke navneteweyî û demokratîk tê qebul kirin. Endamên wê, gelên niştecih, netewên di bin rêveberiyên din de û welat û herêmên di raya navneteweyî de nayê temsîl kirin pêk tê. 42 endamên rêxistinê hene, Ji Kafkasan heta Balkanan, ji Afrîka heta Asya li ser erdnîgariyeke fireh belav bûye. Hin endamên organîzasyonê bi endamê Civata Ewlehî ya Neteweyên Yekbûyî re têkiliyên wan ê nêz hene. Abhazya, Kosova û Somaliland endamên ku herî pir tên naskirin in. Endamê organîzasyonê yên wekî Ermenîstan, Estonya, Letonya û Gurcistan yên kevn in. Piştî ku van dewletan serxwebûna xwe bi dest xistin tevlî Neteweyên Yekbûyî bûn.

Erkên endamê UNPO yê, parastina mafê çandî û mirovahî, îdarekirina rêveberiyê û çareserkirina pevçûnên tund. UNPO ji bo endamê xwe derfeta pêk tînin û ji bo endaêm wan li qada navneteweyî bê naskirin alîkariya wan dike.

### Konfederasyona Futbolê: CONİFA

Welatên endamê UNPO yê di sala 2013an de Konfederasyona Federasyona Serbixwe ya Futbolê CONIFA damezirandin û organîzasyona kûpaya cîhanê di sala 2014an li Swêdê pêkanîn.



# Li Rihayê dema berhevkirina îsotan e

**BENGÎ BAWEŞAN**

Niha di bin deshilatdariya Odeya Bazirganiyê de qursên me yên Farisî û Kurdî ha Li bajarê Rihayê niha dema berhevkirin û çêkirina îsotên hûr e. Cotkarê ji Rihayê Remezan Azad dibêje, "îsot nîşaneya Rihayê ye û di folklor û xwarina vî bajarî de cihekî girîng girtiye."



Dema mirov qala Rihayê dike ji bilî xwarinên wek ecîn, cîger û fistiqan, îsot jî tê hişê mirov. Îsot wek mexsûleke xwemalî û nîşaneya vî bajarî tê qebûl kirin. Niha li Rihayê dem dema îsotan e û piraniya Rihayiyan bi berhevkirina îsotê re mijûl in. Cotkarê Kurd Remezan Azad di derbarê îsotên Rihayê û çêkirina isotên hûr de ji Heftenameya Basê re axivî.

**"Îsot ji avê hez dike"**

Remezan Azad destnîşan dike ku Riha warê îsotan e û çandiniya îsotê ji zû ve tê kirin û heta berî ku av bi riya GAPê bigihêje hin gund û navçeyan, bîrên gel hebûn û xelkê wisa çandiniya îsotan dikir. Her wisa meriv dikare bibêje ku Kurd ji zû de ve ye cotkariya îsotan dikin. Azad dibêje yek ji taybetmendiya Îsotên Rihayê ew e ku şiklê wê gilover e û wiha behsa tovavêtin û rakirina îsotan dike, "Piranî tovên îsotan, di meha adar û nîsanê de tên avêtin. Berê dijwar bû, makîne tunebûn lê niha her tişt bi teknolojiyê xweştir û hesantir bûye. Tovên îsotê ji ber ku piçek hûr in mimzer zêde direşîne. Bi tovreşandinê re gubreya wê tê kirin. Li gorî hewcederiya tovê îsot tê gubrekirin. Merhaleye avdaniya îsotê jî heye û îsot ji avê hez dike. Avdaniya îsotan piranî bi sistema "şilîkirin" tê kirin yanî bi fiskiyeyê tê kirin. Mebesta vê yekê jî ew e ku erd çorax nebe û potansiyela hilberina êrd kêm nebe, xilas nebe her wiha ev cure avdan, herî zêde tê tercihkirin û ev cure avdanî îsota paqij jî dike. Di dema tovavêtinê de ji ber ku tovên îsotan pir biçûk in û makîne zêde tov direşîne. Dîsa lazim e ku cotkar ji ber vê sedemê navberê kêm bidinê. Piştî ku bi qasî çend tiliyan îsot direj bûn bi riya karkeran hin şitil tên jê kirin ku navbera wan firk bibe. Debra vê çandiniyê jî di nava meh û meh û nîvekê de tê berhev kirin, debra wan baş e. Lê belê hin cotkar jî hene ji bo ku îsotan zû berhev bikin û bi bihayekî baş bifiroşin di meha çile û sibatê de di bin serayê de şitilên îsotan mezin dikin. Piştî ku hewa germ bû van şitilan ji serayê radikin û bi riya karker an jî makîneyan van şitilan di zeviyên xwe de diçînin. Rast e, îsotên bi vî şiklî hatine çandin zû mezin dibin û heta bi bihayekî baş jî tên firotin lê debra wan ne zêde ye, kêm e."



**"Piştî sorbûnê, îsot tên berhevkirin"**

Azad amaje dike ku her çiqas tava Rihayê zêde û neyînî bê zanîn jî tevî îsotê bo hin sewze, fêkî û mexsûlan jî ev tav pêwist e û wiha qala pêvajoya sorbûn û berhevkirina îsotan kir, "Îsotên Rihayê pêşî kesk in lê ji ber germahiya Rihayê rengê wan jî sor dibe. Germahî nebe îsot jî baş nagihêjin. Ev germahî dihêle ku îsot bi demê re sor bibin. Piştî ku îsot sor dibin tehma wan jî diguhêre û her wisa bêhtir tûj jî dibin. Îsot çawa ku sor dibin wisa jî pê re tê berhevkirin. Cotkar li gor rewşa sorbûna îsotan beş beş îsotan berhev dikin. Wekî din, darên îsotan divê dema ku îsot tên berhevkirin neyên êşandin. Çimkî wê debra wan darê îsotan hê bê kirin. "Cotkarê Kurd dibêje niha gava ku biçin Rihayê him li ser banên mal û avahiyên navenda Rihayê û him jî li gundan îsot hene û dîmeneke wisa sor xuya dike. Di dema îsotan de, li gund an jî bajaran gel alîkariya hev dike.Wekî din li bajêr kesên ku bazirganiya vî karî dikin jî hene û diçin îsotan ji halê erzan dikirin û karkerên rojane kirê dikin û îsotên hûr didin çêkirin.

**"Ji 100 kîloyî, 10 kîlo îsotên hûr çêdibin"**

Azad wiha qala çêkirina îsotên hûr dike, "Ji bo ku îsotên hûr bên çêkirin pêşî tovên îsotan paqij dikin û piştre bi destan li gor dirêjahiyê îsotan dixin sê qed. Îsot pir tûj in ji loma jî divê lepikan têxin destên xwe. Bi vî awayî îsotan amade dikin û rojek an jî du rojan didin ber tavê. Piştî ku dîtin rengê îsotan sor bû û hişk bûn, vê care jî ger bixwazin ku bila rengê wê reşreşî bibe, divê îsotan têxin nav poşetên naylon ên mezin û devê wan jî baş bijîdînin da ku hewa negire û dîsa bidin ber tavê. Paşê devê poşetan vedikin ku bila îsot nemê negirin. Li ber tava Rihayê di nav çend rojan de ev îsot reş dibin. Piştre qonaxa çêkirina îsotên hûr dest pê dike. Berê jinan bi destan îsot hûr dikirin, dikutan, ji bejingan dixistin. Lê belê niha piştî ku îsot hişk bûn dixin nava makîneyê. Piştî ku îsot ji makîneyê derbas bûn, rûnê zeytê dixin nav îsotan û êdî îsot bo xwarinê amade dibin. Tehma îsotên Rihayê her çiqas tûj be jî mirov aciz nake. Çimkî tê de madeyeke din tune ye û bi destan tê çêkirin. Li Rihayê xelk bo ecînê, zêdetir îsotên hûr ên reş tercih dike. Ji 100 kîlo îsot, 10 kîlo îsotên hûr derdikeve. Ji îsotan tirş (ava îsotan) jî tê çêkirin."

### "Îsal cara ewil festîvala îsotan hat lidarxistin"

Azad diyar dike ku îsal ji ber hewayê û ji ber sedemên din îsot hindik in û bihayê wê jî zêde ye. Îsal kîloya îsotên sewzeyan di navbera 1,200-1,500 lîreyî de ye. Kîloya îsotên hûr ên bo beheratê jî di navbera 15-40 lîreyî de tê firotin. Azad wiha axaftina xwe didomîne; "Îsotên Rihayê bo derveyî bajêr û welêt jî tên firotin. Şaredariya Rihayê serî li UNESCOyê daye ji bo 'cîger, ecîn, îsot û tiştên din' ku patenta wan hilgire. Heta îsal cara ewil festîvala îsotan a Rihayê jî hat lidarxistin."

# "Girtina deriyên sînorî dê bandoreke neyênî li aboriyê bike"

Ligel têkiliyên ekonomîk divê em ji bîr nekin ku têkiliyên civakî jî xurt in. Eger deriyên sînorî bên girtin ev yek dê bibe sedema şikestina hêviyan û dûrketinekê.

**DARA BANDÎNÎ**



Têkiliyên aborî yên Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê salane digihêje 13 milyar dolarî. Girtina deriyên sînorî û ambargoya ekonomîk ne pêkan e. Li gor aborînas û bazirganan girtina deriyên sînorî ji Kurdistanê zehftir wê bandorê li Tirkiyeyê bike. Ji ber vê yekê jî Tirkiye deriyên sînorî nagire.

Referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê bû sedema arişe û kêşeyan li gel welatên cîran ên Kurdistanê. Tirkiye û Îran ku Herêma Kurdistanê herî zêde li gel van welatan danûstandinên aborî dike li hember pêkanîna referandûmê daxûyaniyên tund didin û raya giştî di wê baweriyê de ye ku ev welat deriyên sînorî yên di navbera Herêma Kurdistanê û wan de bigirin. Em weke Heftenameya Basê ligel aborînas û mamosteyê Zaningehê Mehmet Öğütçü û Serokê Borsaya Tîcarî ya Diyarbekir Engin Yeşil di derbarê egera girtina deriyên sînorî û tesîra wê li Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê axivîn.

Serokê Borsaya Tîcarî ya Diyarbekir Engin Yeşil destnîşan dike ku eger deriyên sînorî bên girtin ev yek dê tesîreke neyênî li Herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê bike. Yeşil axaftina xwe wiha didomîne: "Di rewşa niha de qût û maddeyên endûstrî yên li Herêma Kurdistanê tên bikaranîn piraniya wan ji Tirkiyeyê derbas dibin. Neft û qaza sirûştî ya Herêma Kurdistanê jî ji ser Tirkiyeyê re diçe bazara cîhanê. Heta pereyê wê neft û qazê jî li ser bankeya Halkbankê diçe Kurdistanê. Di rewşeke niha de eger derî bên girtin him Herêma Kurdistanê him jî Tirkiye ji vê yekê neyênî tesîr dibîne."

**"Divê rola Enqereyê neyê piştguhkirin"**

Serokê Bosphorus Energy Club Mehmet Öğütçü jî di derbarê girtina deriyên sînorî û tîcareta sektora energyê de ji Basê re wiha radigihîne ku heke referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê bibe sedema qutkirina bazirganî û danûstandinan ev yek cihê xemgîniyê ye û wiha didomîne: "Di rewşa îro de ku Herêma Kurdistanê xwediyê aboriya xwe ye bi alîkarî û rola Tirkiyeyê bi taybetî jî îktîdara îro bû. Yanî rola wan nayê piştguhkirin. Di derbarê sektora enerjiyê de, îxrackirina neftê ji bo bazarên bi qedir di ser Tirkiyeyê de, di dahatûyê de berhemanîn û firotina qaza sirûştî bi alîkarî û piştgiriya Enqereyê pêkan bûye. Eger Enqereyê piştgirî nedabûya ev yek wisa hêsan nedibû. Ji ber vê yekê jî divê mirov rola Enqereyê biçûk nebîne."

**"Di avakirinê de jî rola Enqereyê girîng bû"**

Di derbarê geştiyarî, avakirina bingehîn, tîcareta perakende, ewlehî û mijarên wek van de şirîkatî û karkirina pêkve hene. Biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê bibe sedema qutkirina bazirganî û danûstandinan ev yek cihê xemgîniyê ye. Eger deriyên sînorî bên girtin ev yek dê tesîreke neyênî li Herêma Kurdistanê bike. Ne tenê di warê aborî de di warê siyasî de jî dê Herêma Kurdistanê bixe binê tecrîtê. Elbet dê tesîreke neyênî li ser Tirkiye jî bike. Li Tirkiyeyê aktorên ekonomiyê, ewlekarî, îstîxbarî û danûstandinê jî eger biryara qutkirina têkiliyên aborî bê dayîn wê zirareke mezin jê bibînin."

### "Girtina deriyên sînorî dê bandorê zehftir li bajarên Kurdan bike"

Serokê Borsaya Tîcarî ya Diyarbekirê Engin Yeşîl pirsa me ya 'eger deriyên sînorî bên girtin û têkiliyên aborî yên Herêma Kurdistanê û Tirkiye têk biçin wê bajarên Kurdan çi tesîrê ji vê bibînin' wiha dibersivîne: "Eger deriyên sînorî bên girtin ew bajarên ku nêzîkî sînorê Herêma Kurdistanê ne dê zehftir ji vê yekê tesîr bigirin. Ev tesîr jî dê neyênî be. Ji ber ku ligel tîcareta fermî li van bajaran gelek malbat bi tîcareta sînorî (Kolberî) debara xwe dike. Ligel têkiliyên ekonomîk divê em jibîr nekin ku têkiliyên civakî jî xurt in. Eger deriyên sînorî bên girtin ev yek dê bibe sedema şikestina hêviyan û dûrketinekê. Ji ber ku ev bajarên Kurdan ne tenê bi rêya tîcaretê ligel Herêma Kurdistanê ne. Ez îhtîmal nadimê ku deriyên sînorî bi temamî bên girtin. Ji ber ku di hedefa îxracata Tirkiyeyê de Herêma Kurdistanê cihekî taybet digire. Yanê ez ne bawer im ku Tirkiye dev ji vê hedefa xwe berde û li hember Herêma Kurdistanê ambargoyan deyne. Hêvîdar im ku ev kêşe nebin sedema tiştên wisa.

Esnafên 'Bajarê aram' ên Xelfetiyê:

# Piştgiriyê bidin tûrîzmê

**YAĞMUR ÇETİN**

Dema ku Riha tê gotin her çi qas axên ziwa bê hişê mirov jî bi Xelfetiya ku bi gola bendavê ve bûye bajarê tûrîzmê jî bala mirov dikişîne. Xelfetî di sala 2013an de ji aliyê Komîteya Koordînasyon a Navneteweyê ya Cittaslowê ve di nav 'bajarê aram' de hat pejirandin. Her çiqas li Xelfetiyê qerax û plaj tune be jî her sal sezon di meha gulanê de vedibe. Heta dawiya meha cotmehê sezona tûrîzmê berdewam dike û him nav welêt him jî derveyî welêt bi hezaran geştiyar tên vir.

Bendeva Bîrecîkê bû sedema koçberiyê

Ji ber bendava Bîrecîkê nîvê Xelfetiyê di bin avê de maye û wek 'bajarê noqbûyî' jî tê zanîn. Li Xelfetiyê heta niha gelek şaristan avabûne û Qeleya Rûman, gundên kevn ên Ermenan ên bi navê Savaşan û Çekem her wisa mizgefta bi navê Ulu ya ku heta nîvê di bin avê de maye jî bala geştiyaran dikişîne. Di sala 2000an de ji ber Bendeva Bîrecîkê xelk mecbûr mabû û ji Bîrecîkê koçkiribûn lê belê niha qismekî şêniyên Xelfetiyê vedigerin bajarên xwe û malên xwe yên berê wek otela butîk didin çêkirin û her wisa otelên mezin jî nû bi nû tên çêkirin. Hema her roj li vî bajarî tur tên çêkirin lê belê dîsa jî qezanca ku ji tûrîzmê tê ne zêde ye û ji ber vê rewşê esnaf gilî û gazincan dikin. Esnaf amaje dikin ku li bajêr hin verastkirin nehatiye kirin, rê û rêbazên diyarkirina bihayan maqûl tune ye û xizmetekî baş bo bajarî nayê kirin. Esnaf dibêjin, "Ev rewş dibe sedem ku qîmeta bajêr nemîne û yên ku diçin careke din neyên."

Murat Karataşê ku nêzî 5 salan e li Xelfetiyê turan pêk tîne, destnîşan dike ku di saet 08:00 sibê de dest bi kar dike heta saet 22.00an dixebite. Karataşê ku bi lotkeyê geştiyaran dibe gundên Çekem, Savaşan û Qeleya Rûman dîsa jî bi gilî û gazinc e û dibêje bi taybet jî yên ku turên lotkeyan dikin bi bihayên zêde geştiyaran didin gerandin ji ber vê jî hejmarên tûrîstan kêm dibin wiha axaftina xwe didomîne, "Ger pergelake bo bihayên lotkeyan ê standart hebe wê him herkes qezenc bike him jî mêvanên ku tên wê kêfxweş bibin. Hin kes bi bihayeke maqûl geştiyaran dide gerandin lê yên din bi bihayê zêde geştiyaran didin gerandin. Em hemû mêvanan li heman ciyan de digerînin. Çima yekî me geştiyaran bi bihayê erzan yê din jî bi bihayekî zêde bigerîne?"

Teqîna 2015an tesîreke neyînî li vî bajarî jî kir

Li gorî agahiyên fermî, di 2014an de 800 kesî serdana Xelfetiyê kiriye û di 2015an de ji meha Gulan heta Tîrmehê jî dîsa geştiyar zêde hatine. Lê belê di 20 Tîrmeha 2015an de Pîrsûsa ku bi qasî 45 deqîqe dûrî Xelfetiyê 33 ciwan hatin kuştin. Vê qetliamê jî tesîr li ser tûrîzma Xelfetiyê kiriye. Ev 4 sal e ku li Xelfetiyê Ahmet Yiğitê ku bi karê restorantê dike bandora qetlîama Pirsûsê ya li ser tûrîzma Xelfetiyê wiha tîne zimên, "Min di 2013an de li vir restorant vekir. Her du salên ewil her tişt gelek baş bû. 2014an jî bo bajêr saleke zehf baş bû. Lê belê teqîna 2015an tesîr li ser vî bajarî jî kir. Wê havînê geştiyar zêde nehatin vir. Sala çûyî jî pevçûnên ku li herêmê pêk hatin tesîr li ser tûrîzmê kir. Îsal nû bi nû hejmarên geştiyaran zêde dibe. Xelfetî bajarê herî aram yê cîhanê tê qebûl kirin lê bûyerên ku li herêmê pêk tên tesîrê li ser vî bajarî dike.



LEWEND PALÎYIJ

## Kirmaşan

Bajaro tewr gird yê Rojhelatê Kurdistanî û belkî yê heme Kurdistanî yo. Ez vana belkî, çimkî destê ma de hûmaritişê nufusî yê heme bajaranê Kurdistanî çin o. Îran de hîris eyaletî estê û Kirmaşan zî merkezê Eyaletê Kirmaşanî yo. Kirmaşan, goreyê Kurdistan verarojê rojhelatî de, goreyê Îran vakurê rojawanî de maneno. Vakurê ci de Sîne û Silêmanî, rojawanê ci de Xaneqîn, verarojê ci de Îlam û Loristan, rojhelatê ci de zî Hemedan esto. Rojhelatê Kurdistanî de merkezêko kultirî, tarîxî û tîcarî yo. Şênîyê ci bi zafane Kurdê Kelhur ê; labelê Kirmaşan de Kurdê Soran, Goran, Lur û Lek zî estê. Yanî Kurdistanêko qijkek o; her çend grûba Kurdan a tewr gird Kurmancî û ma Kirdî tede çin bî zî. Eyaletê Kirmaşan de nê bajarî estê: Kirmaşan, Pawe, Ciwanro, Bêstûn, Sonqur, Rewansar, Sahane, Kengawer, Serpêlzahaw, Mahîdeşt, Kirênd, Qesra Şêrîn, Gîlangerb û Şahabad. Nînan ra Pawe merkezanê Hewremanan ra yew o. Nufusê xo nêzdîyê 20 hezar kes o.

Goreyê tay tarîxnasan, çekuya Kirmaşanî çekuya Kurmancan ra ameya. Kurmanc-kirmanc yan zî Kurê Mancikan nameyê eşîrêk bîyo. Na eşîre ronîyayîşê Dewleta Medan ra ver Kirmaşan de bîya. Hetanê roja ma Kirmaşan gelek nameyê girewtî. Xalibe sereameyîşê her hukumranîye de nameyêko newe girewto. Êlib, Kirmaşan, Kamran, Kermîsen, Kermîşên, Kirmînşan, Qermîşên, Kirmaşanan, Qehremanşehr û tewr peynî de zî Baxteran. Xumeynî, şorişê Îranî ra dima nameyê bajarî hêverî keno Qehremanşehr, dima ra zî keno Baxteran; labelê temsîlkarê bajarê Kirmaşanî nê nameyî rê îtîraz kenî û Xumeynî newe ra nameyê bajarî keno Kirmaşan.

Dewranê verê tarîxî de zî merdimî Kirmaşan de ciwîyayî. Labelê Kirmaşan reya verêne, sey yew bajarî, hetê Sasanîyan ra ronîyayo û tarîx de sey paytexto dîyin yê Dewleta Sasanîyan qebul bîyo. Hukumdarê Sasanîyan ra Erdeşîro Yewin wexto yeno sere, wazeno welatê Kurdan zî bîgêro binê hukmê xo. Labelê Kurdî naye qebul nêkenî û bi serverîya Qral Madîgî de yenê pêser û Dewleta Kermî (ke merkezê xo Kirmaşan o) îlan kenî. Şerê mîyanê Kurd û Persan nêzdîyê di serran dewam keno. Nê şeran ra dima Persî-Sasanî xoserîya Kurdan yanî xoserîya Dewleta Kavusakan (226-380) qebul kenî. Fîrdewsî, Şahnameyê xo de wina qala şerê mîyanê Kurd û Persan keno:

Wexto biney zor dîya Erdeşîrî
Fehm kerd ke yê bêmergî Kurdî, o nîyo
Karê ey bi çetin meydanê şerî de.
Kurdê seranserê welatî bîy yew
La artêşê Persan zî hîris-qat zêde
Hetanê şewe şer kerd
Meydanê şerî term û birîndaran ra
Êdî seba gêrayîş zî bi teng
Oca de artêşê Persan estbi, heybetin
Labelê kerd vîndî vera artêşê Kurdan

Îsayî ra pey 380an de Sasanî peynîya hukmê dewleta Kavusakan anê û Kirmaşan ancîna keweno binê hukmê Dewleta Sasanîyan. Na rewşe hetanê dewrê Îslamîyetî wina dewam kena. Wexto Sasanî vera artêşê îlamî kenê vîndî, Kirmaşan zî sey gelek bajaranê bînan ê Kurdistanî keweno binê hukmê dewleta Îslamî û nameyê Qermîşên geno. Dewrê Selçuqlîyan de zî merkezêko muhîm o. Heta tarîx de (bi îhtîmalo pîl) reya verêne nameyê "Kurdistan"î hetê Sultan Ehmed Sencerî ra yeno bikarardiş. Sultanê Selçuqîyan ra Ehmed Sencer seserra diwêsine de, seba birarzayê xo dewletêk bi nameyê Kurdistan awan keno. Merkezê na dewlete nêzdîyê Hemedanî de kelaya Baharî ya û bajarê Sîne, Şarezor û Kirmaşan zî mîyanê sînoranê na dewlete de manenî. Yanî nameyê Kurdistan tewr verî seba verarojê rojhelatê welatî ameyo bikarardiş. Axîr na dewleta Kurdistanî ke îdarekarê xo tirk bî, hetê Harmenşahan ra, seserra hîrêsine de mîyan ra darîyena we.

Kirmaşan bajarêko tarîxî yo. Gelek eserê tarîxî hetanê roja ma ameyî. Nînan ra yew Taqa Bostan o. Tîya cayo tewr muhîm yê bajarî yo û heta ma eşkenê vaje nîşanê Kirmaşanî yo ke vakurê rojhelatê bajarî de maneno. Di çimeyan ra yeno pê. Dormaleyê ci virazîyayo û bîyo warêko arkeolojîk. Sewbîna nê bajarê qedîm de Kitabeyê Behîstûnî zî estî. Kitabeyê Behîstûnî, hetê hukumdarê Persan Darîusî (Dara) ra, erd ra se metre cor de, serê kerrî ya neqirîyayê. Darîusî nê nuşteyê xo de tarîxê Persan, serebûtê dewrê xo, serewedartişî û şerî dayê nuştene. Nuşte fekê Darîusî ra û bi hîrê ziwanan nusîyayo: Farskîya kane, Elemkî û Babîlkî.

Nê bajarê qedîm û tarîxî ra gelek şexsîyetê namdarî vejîyayî. Ebû Hanîfe El Dînawerî nînan ra yew o. Dînawerî 828an de yeno dinya. Keso tewr verên o ke derheqê tarîxê Kurdan de xebitîyeno. Kitabêk bi nameyê Ensab El-Ekrad (Nesebê Kurdan) nuseno. Hunermendo namdar Şehram Nazirî zî Kirmaşanij o. Westayê setarî yo, tembûr zî ceneno. Sewbîna hunermend û aktoro namdar yê sînemaya Îranî Arîf Loristanî zî Kirmaşanij o. Bê înan wayîra Xelata Edebîyatî yê Nobelî Doris Lessing a îngilîze zî Kirmaşan de ameya dinya.

# Holiday Inn Democracy Out

MUTLU CAN




Welatê ma û heme herême rojanê tarîxîyan rê vîyarenê. Aktorê nê demî kurd ê. Rojevê kurdan de yew referandum esto ke o do vurîyayîşê qederê nê miletî de rolê yew çatrayîrî kay biko. Herhal dinya hîç nêbîya şahidê prosesê referandumê winasî. Hema nêvirazîyayo la toz û duman o ke werişto! Her roje yew tehdît yew hişyarîye, peynîya îfadeyanê nêweşan nêna. Çi yo?; "Wa kurdê Herêma Kurdîstanî referandum mevirazê." Hela vajîn kurdî nanê şima, şima dest ra gênê? Ney! Cila şima birnenê? Ney! Tena wazenê ke yew parçeyê welatê xo de qederê xo bigîrê xo dest û sey 193 dewletanê bînan dewleta xoya xosere îlan bikê. La ti kamî ra vanî? Ma de vanê "kemer û darî vera ma ameyê rê zon (ziwan)". Ma nika panoramaya referandumî ya pêroyîye bidê hetêk û behsê yew programî ke virazîyayîşê ey mumkun nêbî bikîme.

Wendoxê erjayeyî seke şima zî taqîb kerd rojnameyê ma Basî hewteyo verên waşt ke Anqara de yew konferans biverazo. Nameyê nê konferansî "Kürdistan Bölgesi Bağımsızlık Referandumu ve Türkiye-Kürdistan Bölgesi İlişkilerinin Geleceği / Referandumê Xoserîye yê Herêma Kurdîstanî û Ameyeyê Tekilîya Tirkîya û Herêma Kurdîstanî bî. Adresa nê konferansî ke do 19ê aşme (êlule) de biameyêne viraştene Otêla Holiday Inn bîye. Bêrîn ma bi kilmîye na otêle nas bikîme. Qaso ke ez keyepelê aye ra musaya na otêle, yê şîrketê InterContinental Hotels Groupî (IHG) ya û Holiday İnn Ankara aşma kanûne ya 2013î de abîya. IHG, wareyê turîzmî de sey yew markaya rêzilkî ya û heme dinya de pêro-pîya 4697 otêlê xo estê û kapasîteya înan 686. 873 oda yê. Beno ke şima vajîn "No melumat çi îcab kerdêne?" O wext keremê xo ra sernuşteyî ra biewnîn.

Ma ageyrîme a roje, roja 18ê êlule. Seke mi cor ra zî va konferans 19ê aşme de (roja şemeyî) bîyêne la pêro îdareker û kadroyê rojnameyê BASî yew roje verî Anqara de hazir bîy. Mêman û qiseykerdoxê erjayeyî ke Başûr ra ameyêne, ê zî eynî roje şan de resayî Anqara. Ma waştêne ke bi aktîvîteyê winasî referandumê xoserîye bîyarîn rojevê Tirkîya û welatî. Heme qiseykerdoxî, şexsîyetê biqîymet bîy; roniştişê yewinî de birêz Dr. Îsmaîl Beşîkçî, Kemal Burkay, Sertaç Bucak, Ahmet Turk, Qedrî Yildirim do qisey bikerdêne. Moderatora nê roniştişî Mudira Weşanê Pêroyî ya rojnemeyê ma Hamîyet Çelebî bîye. Qisyekerdoxê roniştişî dîyînî zî birêz Dr. Kemal Kerkukî, Heme Hacî Mehmûd, Azad Cundîyanî, Îrfan Kerkukî bîy û moderatorê nê roniştişî zî Muayed Teyyîb bî . La heyf ke konferans nêbî û dima ra ame qedexekerdiş. Ma pêro ancax lobîyê yew otelî û werd de ameyî têhet.

> Hela vajîn kurdî nanê şima, şima dest ra gênê? Ney! Cila şima birnenê? Ney! Tena wazenê ke yew parçeyê welatê xo de qederê xo bigîrê xo dest û sey 193 dewletanê bînan dewleta xoya xosere îlan bikê. La ti kamî ra vanî? Ma de vanê "kemer û darî ma vera ameyê rê zon. (ziwan)"

Baş o ma se bîbî? Ez zî wazena ke şima rê tayê peyplanê na mesela ra qal bika. Goreyê pêhesîyayîşê mi grûbeka faşîste ya Vatan Partisiyî (Partîya Welatî yê Doğu Perînçekî) medyaya sosyale ser o organîze bîya û roja îneyî (18ê aşme de) verê otêla Holiday Inn de "çalakîya protestoyî" viraşta. Tabî yewîya welatê xo mudefa kenê û çalakîyan viraştene nê deman de tewr zaf zî heqê înan o.(!) Înan çi nêvato ke? Ez vana qey yew nimûne bes a; "Eke ê bêrê tîya ma nêverdanê yewê înan tîya ra ganî bivejîyo." Nê teşqeleyî ser o îdarekerê Holiday Innî zî tersayê û muqaweleyê organîzasyonî ke mabênê înan û îdarekeranê ma reyde virazîyayo îptal kerdo.

Gama ke manzara wina asena îdarekerê rojnameyê ma zî -helbet semedo ke no konferans bero viraştene- cayo alternatîf gêrenê û vînenê zî. Sey adresa newîye ya konferansî Kîng Otêle tesbît beno. Semtê organîzasyonî na rey hetê Kizilay nîyo Çankaya ya. La bêrîn dîyar ke "ma rê uca zî heram o" Xora nê referandumî rê zerrîya "aqilê serên (üst akıl) yê Anqara" zî çin bî. Yanî eke şertî eleyhê ma de nêbîyêne ecêb bîyenê. Xulasa goya ma do konferansê xo ancî eynî roje eynî saete de na otêle de biviraştêne la şewe Walîtîya Anqara qerarê xo îlan kerd. Konferans, hetê walîtîye ra ameybî qedexe kerdene. Çirê? Çunke "îhtîmal estbî ke rêxistinê terorî nê organîzasyonî ra îstîfade bikê, tede propagandaya xo bikê yan zî ey provaqe bikê. Û înan ra muhîmêr dewlete vatêne ke "ma nêeşkenê asayîşê nê konferansî temîn bikê"

Dewleta Tirkîya/Tirkan bi na helwesta xo nîşan da ke referandume xoserîye rê tehamule aye qet çin o. Çunke eke hukmat yan zî her kam o ke nê welatî îdare keno biwaştêne no konferans ameyêne viraştene. Hêzê komêka faşîste çin bî ke vernîya nê organîzasyonî bigîro. Peynîya peyêne de konferansê ma nêvirazîya la o netîceya nê muameleyî de hîna zêde veng da. Demokrasî tena seba muktedîran nîyo, o seba heme tebaqayan û sinifanê şarî esto. Ma çend kesan demêk lobîyê otêla ke embazî tede mendêne de soxbet kerdêne. Arêyêk fekê mamosta Qedrîyî (Yildirim) ra cumleyêka zaf manîdare vejîyaye. (muhatabê aye dîyar o) Mamostayî va: Ti gerre kenî ke Almanya to uca nêda qiseykerdiş la to zî nêverda ke Kemal Kerkukî Anqara de qisey biko.

Holîday Inn otêlêka pîl, konforin û modern a. 4697ê nuqtayê dinya de otêlê şîrketê IHG estê. No zî ma rê reyna dîyar keno ke Globalîzasyon yew rastî ya û seke bi serran o ke vanê; dinya bîya yew dewe. Kapîtalîstî şonê her cayê dinya û ê cayan de sermayegozarî (yatırım) kenê. Helbet konfor, kalîte û standardê xizmetan muhîm ê. Labelê eke welatê şima de Democrayc out bo Holiday Inn pere nêkeno...

# Hûmara 53. ya Kovara Vateyî Vejîyaye




Hûmara 53. ya kovara kulturî ya Vateyî, sey hûmara hamnanî ya emserî vejîyaye. Hûmara hamnanê 2017î, 136 rîpelî ya û sey hûmaranê verênan bi muhtewaya xoya zengîne bale ancena.

Destpêkê na hûmare de zî nuşteyê redaksîyonî ke hertim bi sernuşteyê "Wendoxan rê" neşr beno ca girewto. No qisim de kombîyayîşê 30. yê Grûba Xebate ya Vateyî ke wexto nêzdî de Kurdîstanê Başûrî de virazîya, derheqê ey de bi hawayo kilmî melumat dîyeno û dima bale ancîyeno ehemîyetê xebata na grûbe ser. Ma muhetwaya na hûmara eynî qismî ra neqil kenê:

"... Na hûmare de şima verê netîceya Kombîyayîşê Vîst û Newinî bi fotografanê

Deniz Gunduzî vînenî. Sey kombîyayîşanê bînan na donime zî gelek çekuyî munaqeşe bîy, gelek qerarî gîrîyay û bi inahawa ziwanê ma tayê waranê xaman de hîna dewlemend bi.

Ma hûmara 52. nuştibi ke ma eseranê Xelata Kovara Vateyî heta rêza pancine pêdima weşanenî. Na hûmare de şima hîkayeya Hesen Polatî, "Nan û Zeytunî", hîkayeya Ali Aydin Çîçekî "Raywan" û hîkayeya Îsmet Borî "Ê Ke Pey De Manenê" wanenî. Şîira rêza dîyine ya Qemer Erdoganî "Şêmiga Emrî" û şîira rêza hîrêyine ya Umer Barasiyî "Dijeyê Pistanan" zî na hûmare de ca gênî. Eseranê Xelate ra teber yewna şîira ke ma na hûmare de weşanenî, şîira Pinar Yildiz "Vena" ya.

Roportajê na hûmare yê Munzur Çemî yo. Ey 30ê nîsana 2016î de, Îstanbul de "Ana Sultan"a xozatije reyra qisey kerdo. Roportajî de ca dayo tekstê yew beyta "Ana Sultane" zî. Na hûmare de ma ca dayo di sanikan zî. Îhsan Tektaşî fekê dapîra xo ra sanika "Waya Hîrê Birayan" nuşta û Turabî Kîşînî zî fekê Pakîşa ra yew versîyonê sanika "Alik û Fatike". Şahap Laçînî kitabê Deniz Gunduzî "Hîkayeyê Koyê Bîngolî" ser o yew analîz nuşto, Îsmet Borî mintiqaya xo ra rîpelê "Fiqra û Meseleyan" rê yew mesela nuşta..."

Ancîya seke her hûmare de êno vînayene, rîpelê na hûmare zî bi resman û fotografanê weşan ameyê xemilnayîş û peynîya aye de beşê Rîpelê Kitaban o ke tede kitabê kirmanckî yê neweyî dîyenê şinasnayîş ca girewto. Ma xo vîr ra nekerê; resmo ke qapaxê na hûmare xemilneno xebatêka ressam Tekîn Firatî ya ke o bi xo zî yew kirmanc û gimgimij o.Hevîya ma û redaktorîya kovara Vateyî eynî ya: "Mela şima wendişê Vateyî ra yew tehm û lezet bigîrîn!"

# Tarîxê Ma de Aşma Êlule

3 êlule 1967: Dîyarbekir de bi nameyê "Doğu Mitingleri" Mîtîngê Rojhelatî mîtîngêk virazîya.

5 êlule 1937: Liderê Hereketê Xoverdayîşê Dêrsimî Seyîd Riza hetê leşkeranê tirkan ra Erzîngan de ame tewqîf kerdene.

6 êlule 1930: Serewedaritişê Şêx Mehmûdî (Berzencî) yo hîrêyin dest pêkerd. Şar, Silêmanîye de serewedarit.

7 êlule 1930: Jenosîdê Agirî yo hîreyin dest pêkerd.

8 êlule 1920: Zorê Serewedaritişê Îbrahîm Paşayî yê Milî şî.

9 êlule 1869: Roşnvîro kurd Abdullah Cevdet Arapgîr de ame dinya.

9 êlule 1961: Abdulkerîm Qasim, derbeya 1958î ra dima sozê xo yo ke derheqê otonomîya kurdan de daybî, nêard ca. Naye ser o şarê kurdî, razînêbîyayîşê xo dîyar kerd. No tarîx de A. Qasimî hêzêko leşkerî yo giran erşawit Kurdîstanî ser.

9 êlule 1984: Nuştox û rejîsoro pîl û kurdperwer Yilmaz Guney Parîs de wefat kerd.

11 êlule 1961: Binê serekîya Mele Mistefa Barzanîyî de destpêkerdişê Têkoşînê Neteweyî yê çekdar yê Kurdîstanê Başûrî.

12 êlule 1924: Serewedaritişê Nastûrîyan.

13 êlule 1927: Serewedaritişê Agirî yo Dîyin.

14 êlule 1929: Hereketê Tendurekî.

16 êlule 1942: Mehabad de "Komela Jîyanewey Kurdîstan" ame ronayene.

19 êlule 1965: Leşkeranê Îraqî 67 kurdî dewa Dukan de adir de veşnayî.

28 êlule 1977: Reya verêne welat de rêxistinêka merkezî ya ciwanan bi nameyê DDKD ronîyaye.

30 êlule 1922: Waştişê îngilîzan û tirkan ser o ke her diyînan zî waştêne bidê îspatkerdene ke Mûsil yê înan o, nameyê Konseya Cemîyeta Miletan ser o heyetêk şî Mûsil ziyaret kerd. Goreyê raporê nê heyetî, zafaneyê şarê Mûsilî ne tirk ê ne zî ereb ê, Kurd ê.

Êlule 1937: Bi nameyê Bekîr Sitqîyî generalêkê kurd Îraq de teşebusê darbeya leşkerî kerd la ser nêkewt û serrêk dima ame kiştiş.

Êlule 1955: Eşîra Ciwanro Kurdîstanê Başûrî de otonomîya xo îlan kerde.



# Ameyîşê mi bi Fransa Ser o - II

HACER PETEKKAYA

Mi ewnîya ke bi pawitene nêbeno, rojê mi telefon girewt xo dest û enstîtu rê telefon kerd. Telefon hetê kek Şerefî ra ame akerdene ke o bi xo nika enstitu de îliga çimanê ma yo (tabîetê mi de tayê sertîye esta, hela ke hêrs bena vengê mi xo bi xo beno pêt), mi vengêko hêrsbîyaye va : 'Merheba, ez Hacer Petekkaya, mi emser muracatê bursî kerd, şima keyepelê xo de vato ma do netîceya bursî mîyanê êlule de îlan bikê, gelo ez eşkena bimusa çira şima nêkerdo? Çend û çend rojî yo ke ez ha her roj, rojê de çend finî keyepel kontrol kena teba çin o, gelo nîyetê şima yê îlankerdişê netîceya bursî esto yan çin o? Kek Şeref bi heso nermêk va: Hela fina nameyê xo vaje, lîsteya bursîyeran ha mi verde ya, ez to ra vaja ka to qezenc kerdo ya nê. Cewabê kek Şerefî dima vengê min o pêt şi, qelbê mi hinî dayêne piro ke mi vatêne qey o do vindero, mi bi zorî va tî rast vanî? Va : Ee ez rast vana tabî. Mi va : nameyê mi Hacer Petekkaya ya (bi heso nermêk û nizm). Kek Serefî to va : Haydê çimê to roşn bê, to burs qezenc kerdo. Ya rebî, ya rebî dahanî kefê mi û kêfê mi. Ez bi pîjemeyan keyeyê birayê xo ra vejîya û hetanî keyeyê xalê xo vaşta, mi kiştê ra ber da piro kiştê ra zî qîrayê "mi burs qezenc kerd, mi burs qezenç kerd !'. Wexto ke tayê bîya sakîn mi birayê xo rê zî telefon akerd û xebere daye ey zî (emegê ey zî mi ser o zaf o). Birayê to zî fina birayîna xo kerde, şan de ke karî ra ame lahmacunê xo, kola xo girewtê û ameyo. Ma keyij meyijî heme ameyî pêser û bi efîyet lahmacunê xo werdî. Tabî aşma teşrîna verêne de ez ageyraya Dîyarbekir û uca pancês- vîst rojî menda û fina şîya Îstanbul. Mi vatêne qey ê do ma hema berê, la winî nêbî tabî û îlankerdişê bursî ra pey çar aşmî vîyartî. Mi çiqas enstîtu rê telefon kerdêne înan vatêne ha peynîya na aşme felan na aşme. Dahanî keyijanê ma heneka xo bi min kerdêne. Mi zî vatêne : Ellawekîr eke mi bi xo telefon qisey nêkerdêne mi bîle bawer nêkerdêne la mi bi xo bi goşanê xo eşnawit.



> Mi vengêko hêrsbîyaye va : 'Merheba, ez Hacer Petekkaya, mi emser muracatê bursî kerd, şima keyepelê xo de vato ma do netîceya bursî mîyanê êlule de îlan bikê, gelo ez eşkena bimusa çira şima nêkerdo? Çend û çend rojî yo ke ez ha her roj, rojê de çend finî keyepel kontrol kena teba çin o, gelo nîyetê şima yê îlankerdişê netîceya bursî esto yan çin o?

Hinî-minî heştê sibate rê biletê ma ameyî birnayene û min û yew embazî pîya şîme Parîs. Ma şîy Fransa labelê ma bi xo zî nêzanayê ke çi ma paweno. Ma do se bikê kotî biwanê û wendena ma do senî bo? Ma tenya programekê kilmekî ra xeberdar bîmê, o zî no bî ke ma do yew şewe Parîs de bimanimê û roja bîne zî şîmê bajarê Grenobleyî. Rasta ci na nêzanayene hem bîbî sedemê heyecan hem zî tersî.

8ê sibate pêroj ma teyara ra ra ameyî war, ma zanayê kesêk do bêro verê ma la kam do bero ma naye nêzanayêne. Girewtena çantayan dima ma şîy verê keberê teberî. Ma dî ke yewêrî destê ey de kaxit û ser o nameyê ma nusîyayê (Rasteyê teyara yo ke ma amêbî war Rasteyê Teyara yê Charles de Gaulleyî bî). Ma şîme verê mêrdekî, merdekî ser ra taximê sîyayî beriqîyayêne wina şok dayê to toşmê xo. Xora her halê xo ra bellî bîyêne ke yew fransiz o. Ver bi şîyena ma ya ey ra fehm kerdbi ke ma rê huya û va : bonjour (rojbaş), ma zî va : Bonjour. Ey tebayêna va la franskîya ma "bonjour û merci" ra zêde nêbî û hişbîyayena ma dima mêrdekî zî ziwan nêzanayîşê ma fehm kerde. Mêrdek sey ordegan kewt vernîye ma zî sey leyrekan kewtî ey dima. Verî ma şîme yew bankamatîkî ver vindertî û mêrdekî çar sey ewro ant û da mi, çar sey ewro zî da embazê bînî û fina kewt ro ma ver. Otogarê erebayan de yew mersedese rayîrê ma pawitêne ke a zî sey taximê merdekî sîya bîye û beriqîyayêne. Ma niştî ro ereba rayîr de finê min û embazî ya ewnayî yewbînan ra huyayîme. Nêzana embaz o wext çi fikirîyabî la mi zerrîya xo ra vatbî : Ellawekîr wina bo se îşê ma weş o, merdêk xasek o, ereba weş a û tunika ma zî germ a. Mêrdekî ma berdî yew otêle de ca dabî ma (Herçiqas wexto ke mi dîqetê nameyê otelê nêkerdbî zî dima ez musaya ke taxa Porte Royal de bîye û nameyê otêla ma zî Hotel Port Royal bi. Odaya mi qatê dîyine de bîye. Ez senî şîya zere û berê xo girewt hema şîya verê pencera. Gama ke mi perdeyî antî, ez çi bivîna Kuleya Eyfelî ya hemberê mi de. O wext mi va: Xecê, Xecê Ellewekîr tî ya Parîs de.

Çend deqayan dima embaza ke hetanî ameyena ma kar û gurweyanê ma ya eleqeder bîyê telefonê mi kerd û va: Semedê ameyene û dayîşnasnayena şima enstîtu do çîyê hadre bikero, gelo şima çi wext amade benê ke ez bêra şima bigîra. Mi embazî ya zî qisey kerd û mi va ma zaf betilîyayê eger mumkun o saete şeşê şanî de ma do hazir bibê. Saete şeş de embaza mi va : Ma do metro ya şîme enstîtu. Metro hema hemberê otelê ma de bî, la enstitu cadeyê ma ra dûrî de bî û eke xelet nêno mi vîrî ma semedo ke şirê enstîtu di finî metro bedilnayî. Tersê min yê dîyîn zî metro de bi ke ma ke kewtî zereyê metroyî her ca ra tewir bi tewir rayî abîyê û her rayîrî ra zî tewir bi tewir merdimî sey morceleyan şîyême û ameyêne. Wexto ke ma resayî enstîtu erey bî û enstîtu de zaf kes nêmendbî. Kek Şerefo ke mîjdanî dabî mi hemverê mi de bi û ey zî hema va: "Hacer tî ya?" û ma huyayî. Kek Şerefî ya pîya çend bursîyerê verênî zî semedê ma ameybî enstîtu. Ma çend qedehî şerab şimit û tayê soxpet kerd. Dima çend embazan a pîya ma şîmê yew loqanteyê afganan û ma hinî şamî werde û hinî şarabê weşî şimitî û hinî muhabeto weş kerd. Roja siftayine ra zerrîya mi Fransa rê bîbî germine (La wa hema kes nêfikirîyo ke her çîyê aye do wina na weş ravîyaro, kam zano hela ma do çi vanê). Şewdir ra yew embazo ke ma yew roje verî pîya şamî werdbî ame ma otêla Royalî ra girewtî û berdî Gare de Lyon (garo ke trêna ma ya Grenoblî ci ra weristêne). Grenoble 600 km. rojhilatê başûrê Fransa de bi û trêna lezkî raywanîya ma do hîrê seatî biramêne)

Wexto ke ez cara yewine şina yew bajarî çîyê hîs kena. Eke hîsê mi pozîtîf bo ez zana ke ez do ê bajarî ra hes bikera la eke hîsê mi negatîf bo îmkanê ci çin o ke ê bajarî rê dima zî keyfê mi bêro, yanî heta nika tim wina bi. Grenoble de zî wexto ke ma garê trêne ra vejîyayîme teber, zerrîya mi bi bajarê Grenobleyî ya bî weşe ke mi va no bajar, bajarê min o. Hetanî şewa siftayin ya Grenobleyî û dîyîne ya Fransa her çî weş vîyart la rojê bînî esil rojanê bînan de ma do rastîya dinya bivînê. Wa dewamê ci zî nuşteyê bînî rê bimano. (09.09.2017)

# Rayîro Derg

LORÎN DEMÎREL

Yew perperike, seba ma kewta torra pîrike hamnanî ra bîyo uca menda. Ma ke dûrî ra ewnîyenê aye ra perra xo sey sûrê adirî ya, ti vana qey kozaya xo ra newe vejîya. Ti vana qey ganî ya la eke merdim nêzdî ra biewnîyo vîneno ke a merda. Teber de serdê zimistanî esto, vewre varena. Ti vana beka Xizir estorê xo fîşto kay toz vay dano û vewre kay kena. Zereyê keyeyî de tanya adirî, lojine de adir veşeno tede çîkî kay kenê. Serê adirî de çaydane esta û tede awe gîrîna. Çay hazir o û sey qiseyanê ma rengê çayî kî giran o.

No welat de îklîm kî sey Heqî bêedalet o. Na gelî, xo peyê koyan de nimite û vengê xo dinya ra birna. Yan kî vengê nê welatî dinya ra birîya. Vewre ginaye êrd la leşa xo bîye berz û keyeyê dewe binê vewre de vînd bîyê. Şarê na gelî, sey şarê sanikanê hezar û yew şewî ye.

Her roj wexto ke tîje vejîna to vatene "Ma va koyî kêyeyê ma yê, la ma şaristanan xo rê welat girewt.". Hengameyê nê şaristanî, bêhêvîyîya însanan ver ti bêhêvî mendêne. Kuçeyê nê şaristanî to rê bibî sey labîrentî; ti her wext û her rayîr tim vejîyene eynî bûlvarî. Apartmananê berzan de keyeyê şarî di ode û yew salone bîy û mendêne rê qafesanê mîlçikan. Ti sey boranan nê qefesî de bîya, to yan xo kiştene yan kî nê qefesî ra vejîyêne. Zereyê to çitur veşayene? To vatene zereyê to adir girewtbî û leşa to veşayêne. To ke game bieştene ver bi rayirê nê şaristanî, ey ti girewtêne zereyê xo û ti nê rayîran de kerdêne vîndî. Ti hemverê deryayî de vindeta, to xo bi xo vatêne, eke no deryayo bêser û bêsînor bojîyanê xo rakero û ez xo bojîyanê ey rê biverdî şona resana koyanê xo. Vengê martîyan goşanê to de peqîyene. Nê vengî ti girewt arde verê yew dêsî. Dêsî ra yew afîş dardekerde bî. To o mabênê çend deqayan de wend. Reyna, reyna, reyna wend. Sloganê nê afîşî û resmê teyre ke ey ser o estbî aqilê to sereyê to ra girewt berd. Teyra ke afîşî ra asayêne sey yew însanî/e bîye. Çimê aye çimê to ra mendî. Awirê to çimanê a teyre de vîndî bîbîy. Ti verê a teyre de rutûrepal menda. Teyre zereyê to wendene. Vengê na teyre ame goşanê to, aye to ra va " Be şîme leyê Sîmurgî.". Ti zereyê wela xo de bîya teyra Ankaye û nika ti xo wela xo ra newe ra carî kena. To xo rê zerrnî ra zerd, adîrî ra sûr û asmenî ra kewîyîye girewtî. Nika ti hem rayir a hem kî raywan a, to perrê xo kerdî ra û va "Sîmurg, ez ha yena."

Sîmurg, vileyê ey ê dergî ra helqaya sipîye esta, purtê ey safran ê, vengê ey rindek o, leşa ey sey leşa merdiman a û teyrêko gird o...O sultanê teyran o.

Raywanîye esta, raywanîye. Ver bi Koyê Qafî. Sultan xo vîneno. Rayîr derg o, raywanîye çetin a. La to dest pêkerdo, edî rayira xo der a. To venga pêro embazanê xo da. Edî raywanîya şima dest pêkerde, agêrayîş nêbeno. Çitur ke Alî Baba sirê Çewres Heramîyan musa, ti kî henî sirê nê rayiran musaya. To va "Abe ya susam abe!" û pero rayirî verê to de bîy ra. Sînorî darîyay we û mayînê ke serê rayîran de ameybî ronayenê, pêro darîyay we.



> No welat de îklîm kî sey Heqî bêedalet o. Na gelî, xo peyê koyan de nimite û vengê xo dinya ra birna. Yan kî vengê nê welatî dinya ra birîya. Vewre ginaye êrd la leşa xo bîye berz û keyeyê dewe binê vewre de vînd bîyê. Şarê na gelî, sey şarê sanikanê hezar û yew şewî ye.

Şima serê asmenî de firr dayêne û Simbad vernîya şima de rayber bî. Hîris teyrî asmên de firr dayêne. Perranê xo seba azadîye kerdîbî ya. Şima hîris mîlçikî bîy. Verê cû gelîya eşqî ra verdî ra şima. Dima Mem û Zîn dîy, ê hemberê Dîcle de ronişte bîy. Şima zî sey Memî rindekîya Zîne de xo kerdbî vîndî. Merdim ke rey ewnîya reyna agêrêno û ewnîyeno Zîne ra. Kam ke biewnêne waştêne ke zereyê nê eşqî de xo vînd bikero.

Pey ra şima Sîyabend û Xece dîy. Gelîyê Mezopotamya yê rindî zereyanê xo Xece û Sîyabendî rê kerdbî ya. Gelîya cîyayîye înan ra zaf dûrî bîye. Şima pey cû gelîya cîyayîye ra verdî ra. Dima deşta hêrsî ra û gola hesudîyîye ra verdî ra. Şima na gelîya eşqî de xo eşqê Mem û Zînî de kerd vîndî, kes ne gelîya cîyayîye de refê xo ra visîya ne kî deştê hêrsî de gina waro û ne kî gola hesudîyîye de rayirê xo caverda. Û raywanîya şima qedîyaye. Şima ke vejîya rayîr, hîris teyrî estbî û wexto ke şima resayî berê sêmênî hîrîs teyrî bîy.

Embaza to, to hişyar kerd. Yew leşker bere ereba de bî. Dima qisey kerd û va "Kimlik kontrol!" (Kontrolkerdişê nasnameyan) tek bi tek nasnemeyê şima girewtî. Şima ke ereba ra vejîyayî teber û vaya şodirî hewayê koyan sipitene we û ardene verê şima de axme kerdene. Wexto ke înan nasnameyê şima peyser dayî şima reyna kewtî rayîr. Hetê de şima de çem ge-ge bicoşî ge-ge bi qaydeyo giran û xemgîn herikîyayene; Hetê de şima yo bîn de koyê berzî ke sereyê înan seka resayêne asmên estbîy. To xo bi va eke merdim şoro serê nê koyan herhal eşkeno bi destanê xo hewran pêbigîro. Ti zerrîya xo ra peşmirîya.

Erebe ame zereyê şaristanî de vinet. Apê embazê to ame û şima girewtî. Şima ginayî rayirê dewe. Di-hîrê saetan ra dima restî dewe. Endî tîje şîbîye awan. Şima dewe ra vila bîy, dewijan şima mêman kerdî. Şima zî bîy mêmanê apê embazê to. Eke ameyî restî keyeyê înan, kebanîya keyeyî werd amade kerdbî. Çay kî serê soba de girîyêne. Şima verê soba de nîştî ro. Kebanîya keyeyî şamî naye ro. Dêsan ra resmê des û di îmaman û yê Hz. Elîyî dardekerde bîy. Leyê înan de tomir (tembur) estbî. Çimê to ginayî pencera ra. Hetê zereyî ra yew daro qij şanîyaybî ver ke va û vewre ra amekero. Teber de vewre varayêne, ti verê pencera de bîya û varayîşê aye temaşe kerdêne. Vewre hende varayêne ke berzîya aye resayêne bejna merdimî. Şima nanê xo werd û dime ra kewtî ra.

> Lawayîşê kutikan, zûrrayîşê vergan û vengê vayî kewtbîy têmîyan. To ke penceraya xo ra ewnîya teberî ra dî ke aşme şewqa xo daybî asmenî ser a. Koyê Qafî yo ke sanikan de vîyareno nika çime to de naca bî. To Sîmurg nêdîbî la zerrîya to zaf rehete bîye. Wexto ke to pencera ra ewnîyayêne mezelê ke bi hezaran serrî verê cû ra mendbîy dîyênê; serê tumî ra.
>
> Mîyanê tarîyîya şewe de bereqîyayêne. To xo bi xo va "ma tawo ke tîya ra şîme, vatbî êdî cendegê ma nêro no welat. Ti biwaze nêwaze yan di lîngan yan kî çar çift lingan ser o reyna bera welatê xo.
>
> Hişê to kewt têmîyan. Hemverê to de mezelî. Zereyê ê mezelan de dayîk û pîrîkî, baw û kalikî.
>
> Nê mezelî, zimistanan mîyanê vewre de sey kozvilikan ê.
>
> Nê mezelî wisaran de mîyanê gul û gulîstanî de sey vilikan ê
>
> Nê mezelî hamnanan de mîyanê geniman de sey weşeyanê geniman ê.
>
> Nê mezelî payîzan de xemgînî bîye.
>
> Senî ke vewre hewran ra peyda bena hesirê to zî çimeyê xo ra; çimanê to ra yenê war û resenê dinya. Senî ke awe gîrîna hesirê to vî gîrîne û vejînê hewran û hewran ra varenê welatê to ser.

# May, pî û qeçekan ser o yew hîkaye*

FÎRUZE DEMÎR

Lajêndê jewî/yewî beno, no mêrdek nê lajê xo çi ecr û ezyeta, çi zehmeta keno gird rişeno mektebi. Vano, wa lajê mi şiro mektebe, wa bibo merdimêno ercîyaye, wa meslegendê ci yo ercîyaye bibo û bewnîyo ma, wa xo zî ma zî bireyno.

Lajê ci şino mekteb û beno muhendis, no lajek sûkên de şantiye de dest bi xebata xo keno. Xeylê wext şino pîyê ci vano no lajekê ma yo qe se keno kewto mi vîrî, maya ci zî teneyê çî kena tê û dana pêrdê lajekî vana nê çêkî zî bere lajekdê ma rê, pîzeyê ci mird o veyşan o, qe nika çi halde yo, o tîya nîyo ma qirri ro war nêşino.

Neyse, pîyê lajekî çî gêno şino şantîyedê lajdê xo, lajêk o dem inşat de xebatkaran rê malumat dano derheqdê mahzemandê înşatî de.

Pîyê ci lajê xo nêvîneno, xebatkaran ra yewî ra perseno.

Mêrdek: No Mehmedo kotî de oxil?

Xebatkar: Mehmed kam o xalo?

Mêrdek: Muhendis o tîya de.

Xebatkar: Eee mi zana Mehmed Beg, vinde ez şira ci rê vaja, ti kamê ci yê, ci rê vaja kamo persê to keno?

Mêrdek: Vaje dewênda dûrî ra ameyo, o zano.

Xebatkar, şino muhendis begî hetek.

Xebatkar: Begê mi begê mi! Mêrdekê ameyo o yo veyndano to.

Mehmed: Kam o, se vano?

Xebatkar: Willi nêzana va ci rê vaj dewênda dûrî ra ameyo, o zano.

Mehmed, şino winyeno ke, e pîyê ci yo, winyeno qilixdê ci ra, vera ci ar keno qey, bîyo beg vano ez nê dewijî rê xebatkaran heteke senî vaja keko, tew şermayeno qey qebrax, pîyê xo ra ar keno. Ti vanê beno o verîna seye xo ya bîyo, xo bi xo ameyo a daraxe. Tew gidî tew, neysene winyeno çorşmandê xo ra pêro xebatkarî, vano mi nêsilasna, nêzana kam o, qey ameyo ma karê tîya de bide ci. Şino pîyê xo heteke, pîyê ci kêf keno vano lajekê mino yeno, şino vera ci keno ke virar şiro ci ra, hewna o yo winî lajê ci, qerfîyaye, a milet mîyan de vano.

Mehmed: Ma heteke kar çin yo ti semedê karî ameyê qey.

Pîyê ci herunda xo de beno wişk û war, xo bi xo vano oxil oxil qey ti verîna beg ameyê dinya. Mêrdek seke herda xo n' şino keydê xo. Cinîya ci mêrdeyê xo ra lajê xo persena:

Cinêke: To Mehmedê mi dî, senîn bî, dîncek bî, hal û wextê ci senîn o?

Mêrdek: Rind o, hal û wextê ci ca de yo hema kaşkarê ez nêşîyayê, ma hende cefa ante, va wa merdim bo, qet çîyêrê nêbeno, bîyo beg hema merdim nêbîyo. Ma çi xeletîn kerde ke no wina bîyo?

Cinêke: Vana çi, se bî, ti çi rê winî vanê?

Mêrdek: Cinêrda xo rê hal û meselî vano.

Cinêke: Verênan vato mêrdek mêrdek! Vanê; "Pêr rezê dayo, ewladî goşeyê engure nêda."

Şima ra zî aseno ke ewlado bê îdraq wina beno herhal, na hîkaye bol rewên nîya û raşta, serrandê 1980an de ravêrena.

**Na hîkayeya şarî ya. Mi, a mintiqaya Sêwregi ra arê kerde. Sernuşteyo corên mi na pa.*



# Xwenaskirin şeref û siyanet e

BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ

"Belkî ez Kurdistana Azad nebînim lê zarokên min wê teqez bibînin. Hûn layîqî, hêjayî dewleteke taybet in, hûn gelek in, ranewestin, pêşeroj a we ye." Nêlson Mandêla (Xelata dewleta Tirkyeyê yê tewrebilind a li ser navê Ataturk qebûl nekir)

Rapirsîn; şoreşeke medenî, qanûnî, ramanî û serkeftineke hemdemî ye.

Hestek ji yê mirovahî û xwedayî azadî ye,
Mirovê ku azad nebe di jiyanê de ne zindî ye
Gelê ku nikare li welatê xwe xwedî derkeve,
Şepirze ye, penaber e li pêşiya wî her tim rev e...
Li tu erdî di nav gelan de tu wext nabe binecî,
Bê şeref dihesibînin, jê re tuneye rûmet û cî
Mirovên bê welat re nadin rê û dirb û derfetê,
Bêîtbar e, tawanbar e li pêş çavên edaletê
Ne hêja ye, nezane ye li pêş çavên hummetê,
Ji bala Xweda jî dûr e nake jê re kerametê
Gelê ku nikare welatê xwe biparêze,
Qismetê wî koletî ye, berdest e, bê rêz e...

Her gel li gorî hêza xwe dijî û dimeşe 25ê îlonê wê bibe roja destpêka azadiya netewa Kurd, dîroka azadiya gelê dîrokî û kevnar. Tiştê ku Kurd wê winda bikin ev in; zilm, zordarî, neheqî, bindestî, koçberî, îmha, înkar, komkujî, êrîşên biyaniyan ên hovane, sînorên di navbera Kurdan de hatine kişandin.... Kurd wê pêşerojeke pîroz bi siyanet bi dest bixin. Rapirsîn rê û wesîleya jiyaneke bi şeref e bo kurdan. Kurdên ku xwe nas dikin hemû bi bawerî benda vê roja pîroz in. Heqê Kurdan tune vê derfetê ji dest berdin. Ev derfet daxwaz û qezenca şehîdan e. Ji bo azadiyê gelê Kurd di navbera qirnekê de heya 5 milyon ewladên xwe yên hêja şehîd dane, li hemberî rapirsînê derketin li hemberî şehîdên Kurd derketine; ji nifşên bê re, ji dîrokê re, ji Kurdistanê re îxanet e.

Kurdan gelek caran di dîrokê de hewil dane bibin xwedan dewlet lê mixabin bi ser neketine. Hertim neheqî li Kurdan hatiye kirin, bi hestên Kurdan leyîstine, Kurd xapandine.

Netew û kesayetên bê welat, bê dewlet, xesandî ne. Gel tenê bi dewletbûnê dikare xwe îfade û temsîl bike û nirxên xwe yên netewî xwedî derkeve, mafên xwe yên xwezayî, gerdûnî biparêze.

Bi serpereştiya serok Mesud Berzanî gelê Kurd biryara serxwebûnê, dewletbûnê daye û di vê oxirê de bi israr e. Yên ku îro dewletbûna Kurdan naxwazin li dijî rapirsînê disekinin. Serokê Kurd bersiva wan wiha tîne ziman: "Em ji nêza re bimirin jî em dizanin ji bo çi emê bimirin" an jî "Min li bin vê ala rengîn çavên xwe vekirine, ezê li bin vê ala milmilandî jî çavên xwe bigirim" an jî "Me Enfal dît, Helebçe dît gelek rojên giran dîtin. Em ji tu tiştî jî venakişin, em ji bo serxwebûnê ji her dijwariyê re amade ne" Belê mirina li ser piya ji jîna li ser çoka çêtir e.

Di qada dîplomasiya navnetewî de jî ji hêla serokê Herêma Kurdistanê ve gavên pêşketî tên avêtin. Bi saya siyaseta wî, dewletên gerdûnî bi herêma Kurdistanê re têkiliyên aborî û siyasî didomînin, bi dehan dewletan li ser axa Herêma Kurdistanê bi resmî nûnertiya xwe (konsûlxane) vekirine, bi milyardolaran sermaye danîne, di şexsê serok Mesud Berzanî de, serok û rayedarên dewletan bi rûmet bi sîmpatiyeke gewre nêzîkî pêşmerge û gelê Herêma Kurdistanê dibin. Serok û rayedarên dewletan li bin ala Kurd pêşwaziya serokê Herêma Kurdistanê dikin.

Bi raman, gotin, kar û xebata xwe ya berbiçav serokê Herêma Kurdistanê birêz M. Berzanî moral û baweriyeke berz ji bo gelê Kurd pêş de tîne.

Bê şik bi siyaset û kirinên xwe yên humanist, serokê Kurd dişibe Selahedînê Eyyûbî yê navdar. Serok Berzanî netewa xwe bi wesîleya rapirsînê ber bi pêşerojeke bi şeref ve dibe. Gelê Kurd ber bi dirûstbûna dewleteke niştimanî, fermî, neteweyî seferber kiriye. Îro netewa Kurd bi bizava serokê Herêma Kurdistanê Mesud Berzanî, daxwaz û xwestekên bapîrên me yên Simkoyê Şikak, Şêx Mehmûdê Berzencî, Şêx Seîdê Pîran, Şêx Ebdulselam Berzanî, Seîd Riza Dêrsimî, Şêx Ehmed Berzanî, Îhsan Nûrî Paşa, Mela Mistefa Berzanî, Pêşewa Qazî û hwd. hewl dide bi riya aştî, aramî, bi mirovane muyesserî jiyanê bike.

**Rapirsîn şoreşeke medenî, destûrî, ramanî û serkeftineke hemdemî ye. Girîngiya vê rapirsînê:**

1. Bi şêwazeke aramî, aştiyane kifşkirina sînor û erdnîgariya aqara Herêma Kurdistanê (Başûrê Kurdistanê).
2. Herifandina projeyên hevpeymanên Sykes-Pîcot û Lozanê.
3. Avakirina dewleteke serbixwe bi navê Kurdistanê. Ev zerûreteke dîrokî ye.
4. Pêvajoya rapirsînê wesîleya zindîbûna yekbûna netewa Kurd e, îradeya gelêrî ye.
5. Pergala koletiyê, dagirkeriyê di Rojhilata Navîn de tê qetandin. Nijadperest û dagirkerên ku kuştinê ji bo Kurdan rewa dibînin qels dibin.
6. Zemîna destpêbûna dêmokrasiyê û di pêşdehatina aramiyê, aştiyê de rol û serkeftina Kurdan di Rojhilata Navîn de.
7. Wek miletekî resmî têgêhiştina Kurdan û zimanekî standart.

Li pey erêkirina rapirsînê, bê şik bi ragihandina dewletbûna Kurdan, serxwebûna Herêma Kurdistanê re cîhan wê bê deng nemîne.

Mirovên bê welat netewên bê welat bermayên dîrokê, koleyên cîvakê ne. Qismetê wan bê mafî û koletî ye.

Bê welat em bê ruh in, welatê me dilê me ye, welatê me jîna me ye, bê welat em tuneyî ne, windayî ne...

Ey Kurdê kevneşop, hêsîro dema te hat gêhîşt,
Rizgarke niştiman ew e ji te ra şeref bêhîşt.
Biherike li meydanê bo rapirsînê nebe lal,
Bi dengê te wê bimilmile li esmanan ev al,
Hezar salan carek dikene rûya rozgar qeder,
Bernede firsendê keda te bila nebe xeder.
Dijmin tu dorpêç kirî hewil dide kerbî bi zorê,
Baş fehm dikin pêşeroj ya te ye vedibin derî û rê.
Dixwazin bi derewan, bi hedê te bavêjin dîsa torê,
Firsendê nede bilivin nexape şaş nebe tewrê berê.
Rapirsîne ji bo te pêşeroj bêje erê,
Bi hev re bi kar bînin vê mecala qederê.
(...)
Bes e em bûn mindal pir em xapandin û zêrandin,
Bi sed salan em tawandin bê sûc daliqandin.
Ku bi hev re rabin hevbeş bi tevger herin qadan,
Kes wê bi me nikaribe di cîhanê de vê şûn de.
Vê oxirê de bibin çeleng berxwedar canfîda.
Bila şa be ruhê wan pakrewanan, şehîdan.
(...)
Bi şareza bigire dîlanê govenda serxwebûnê.
Berê neyar bide ber bi revê çûnê û qelsbûnê.
Bes bûyî bêkenî, xizan di bin destan de mayî,
Welatê xwe şên ke bi serfrazî lê bibe xayî.
Bi biryarî bi îsrarî bi biratî bi rayî,
Esmanê welatê te wê bibe ronî û sayî.
(...)
Welat nanê helal jîna rehet û mekan û bêhîşt,
Hezar sal e neyarê hov kotî ji me re nehişt.
Ruza wê me copand û bir ser qismetê me rûnişt.
Jîna şeref rapirsîne rabin hev re çartenişt.
Ev car e, careke din ji me re mecal çênabe,
Bi referêndûmê netawa Kurd aza û şa be.
Neyar ji axa pîroz ranabe,
Ji kirinên hovane têr nabe,
Ji dunya medenî fêr nabe,
Xwe girtiye kotîdiyê nake tobe.
Rewşeke wiha de jîn nabe.
Em in îro mêrxas maqûlê cîhanê,
Bi rapirsînê Kurd wê bêne xanê.
Sînorên ser axa Kurdistanê wê rabin.
Gelên bindest kole wê ese' aza bin.
Ey Kurdo, bi şanazî bi culet rabe,
Ya me ev car e derfet dubare nabe.
Tirs û xof ketiye dilê dagirkeran,
Kurd wê paşopê wan siwar kin li keran,
Berê wan jî wê bidin mêşa newalan
Bila hemêz kin qedera vala...
Bila bikevin li ser çokan
Bila bibin çîrokê dîrokan...
Ya me ev car e derfet dubare nabe,
Ey Kurd bi şanazî bi culet rabe.

# Barzanî û xwezanî

NECAT ZIVINGÎ

Coş û kelecana referandûma serxwebûnê ya 25ê îlonê Kurdên çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê ji her demê bêtir nêzîktirî hev kirin. Çawa bi salan di sengerên şer de xwîna Kurdên çar parçeyan tevlîhev dibû, îro bi wesîleya referandûma serxwebûnê di hemû amûrên ragihandinê û medyaya civakî de dil û daxwazên wan jî tevlîhev dibin û yekbûna Kurdan ji her demê bi hêztir dibe.

Piştî daxuyaniya serok Barzanî ya "li pişta min ji çar parçeyên Kurdistanê bi milyonan Kurd hene" hat bihîstin, Kurdên li Tirkiyeyê yên Bakurê Kurdistanê bi Tirkî li ser medyaya civakî kampanyaya "#KurdistanSeninleBarzani" (Kurdistan bi te re ye Barzanî) dan meşandin û xistin rojeva Tirkiyeyê. Ji wê kampanyayê derket holê ku ji bo gelê Kurd û Kurdistanê "mesele ne Barzanî ye, mesele xwezanî ye".

Doza Kurdan a rûmet û hebûnê, bi sedan salan e, bi sedan serok û serwer dîtine. Pir rêber û pêşengan di ber vê dozê de serê xwe dane. Digel hemî têkçûn û şikestinan îradeya Kurdan a hebûn û serxwebûnê neşikestiye. Îro Kurd li pişta serok Barzanî ne, lewra serok Barzanî nîşana xwezanînê ya gelê Kurd e.

Serok Barzanî doza gelê Kurd û Kurdistanê ya rewa li milê xwe kiriye û di cîhanê de bûye berdevkê vê dozê. Ji lew ji çar aliyên Kurdistanê û cîhanê bi milyonan Kurd bi coş û kelecan dibêjin em bi te re ne.

Belê, bê behane û nîqaşên bê wate, em Kurdên çar aliyên Kurdistanê û cîhanê di meşa serxwebûnê de bi hemû derfetên xwe bi te re ne ey serok Barzanî!

Bila tu kes, kom û dewlet gefan li Kurdan nexwin! Doza Kurdan ne doza serokekî, partiyekê an parçeyekî ye. Ev doz, doza miletekî qedîm e. Weke şîrê dayika me helal e û xwedîderketina vê dozê bo her Kurdekî berpirsiyarî ye.

Ne endamên partî û koman, bendeyên serok û rêberan! Em gelê Kurd in û di doza rûmet û serxwebûnê de bi rêber û rêzanên xwe re ne.

Bi vê zanîn û hişmendiyê ji bo her Kurdekî mijara xîret û rûmetê ye ku bi dewleta lê dijî bide zanîn, ew piştgirê serxwebûna Kurdistanê ye. Û di vê meşê de li pey 'elemdarê vê dozê ye û piştgirê serok Barzanî ye.

Lewra serok Barzanî, îro roj nîşana hebûn û xwebûna nasnameya Kurd e. Nîşana şikandina qeyd û zincîrên bindestiyê ye. Nîşana mirovahî, dilsozî, hevgirtin, yekîtî, mêranî û azadiyê ye.

Vê nîşanê îro bi Kurdên çar parçeyên Kurdistanê û hemû cîhanê daye zanîn ku Kurd hene, bi milyonan in, xwişk û birayên hev in, yekgirtî ne, bi hemû miletên din re wekhev in û ji bo birêvebirina mala xwe xwedî îrade û hêz in.

Em Kurd di vê paceyê de li vê mijarê dinêrin û bi hemû hêz û hebûna xwe di meşa serxwebûnê de piştgiriya cenabê serok Barzanî dikin. Belê; mesele ne Barzanî ye, mesele xwezanî ye.

Nişe:Hêvîdar im referandûma serxwebûnê ya 25/09/2017an bi aramî û serkeftina Kurdistanê derbas bibe û îradeya gelê Kurd li hemû cîhanê bi dengekî bilind bide zanîn. Encam her çi û çiqas be, vê pêvajoyê bi xwe em gihandine serkeftineke bêhempa û li dîrokê hatiye neqişandin.



Bila tu kes, kom û dewlet gefan li Kurdan nexwin! Doza Kurdan ne doza serokekî, partiyekê an parçeyekî ye. Ev doz, doza miletekî qedîm e. Weke şîrê dayika me helal e û xwedîderketina vê dozê bo her Kurdekî berpirsiyarî ye. Ne endamên partî û koman, bendeyên serok û rêberan! Em gelê Kurd in û di doza rûmet û serxwebûnê de bi rêber û rêzanên xwe re ne.

# Rabirdûya perwerdeya bi zimanê Kurdî

ABDURRAHMAN ADAK*

Çawa tê zanîn piraniya wan edebî ji bin di tarîxa kurdan a serdema klasîk de bi zimanê kurdî gelek berhem hatine nivîsîn. Aşkera ye ku zimanek herî zêde bi rêya perwerdeyê dikare bigihîje vê astê. Ev jî tê wê wateyê ku di rabirdûyê de ji aliyê kurdan ve saziyên perwerdeyê hatine avakirin û kurdî jî di van saziyan de wek zimanê perwerdeyê hatiye bikaranîn. Ji ber ku perwerdeya bi kurdî di roja îro de, bi taybetî li Bakurê Kurdistanê, wek kêşeyekê hê jî hebûna xwe didomîne, rewşa perwerdeya bi zimanê kurdî ya di rabirdûyê de bivênevê balê dikişîne û hin pirsên bi vî rengî tên hişê mirov: Gelo di rabirdûyê de perwerdeya bi zimanê kurdî hebû, yan na; eger hebe çi wextî dest pê kiriye û heta çi wextî hebûna xwe domandiye; ev perwerde bi vegotina dersê bi sînor maye, yan materyal û pirtûkên dersê jî hatine bikaranîn? Ji ber ku wek diyardeyeke tarîxî-civakî bi piranî avakirina saziyên perwerdeyê bi desthilatê re têkildar e û bi awayekî siruştî zimanê perwerdeyê jî hevteribê zimanê desthilatê dirûv digire, em ê jî hewl bidin ku hevteribê qonaxên siyasî-civakî yên tarîxa kurdan van pirsyaran ronî bikin.

Berî ku hikûmetên kurdan ên serdema navîn bên avakirin, ji destpêka Îslamê (sedsal VII) heta bi nîveka dewleta Ebbasiyan (sedsala XI), li tevahiya cîhana Îslamê desthilatdarî di destê Emewî û Ebbasiyan de bû. Di vê serdemê de, saziyên perwerdeyê ku zêdetir wek "kuttab" dihatin binavkirin ji aliyê rêvebiriya van dewletan ve hatine avakirin û di wan saziyan de bi zimanê erebî perwerde hatiye dayîn. Ji ber ku di vê serdemê de desthilatdariya kurdan tunebû, saziyên wan ê perwerdeyê jî ava nebûne. Loma jî kurdan di van saziyên Emewî û Ebbasiyan de bi zimanê erebî perwerde dîtine.

Di nîveka duyem a dewleta Ebbasiyan de, li dijî desthilatdariya Ebbasiyan reaksiyonek çê bû û ji aliyê gelên ecem ve gelek hikûmetên nû hatin avakirin. Di vê serdemê de di maweya sedsalên X-XIIan de ji aliyê kurdan ve jî hikûmetên Şeddadî, Merwanî, Eyyûbî û hwd. hatine damezirandin û cara pêşî di vê serdemê de kurdan desthilatdariyên siyasî bi dest xistin. Di vê serdemê de "kuttab" veguzîn bal bi "medrese"yan ve û bi taybetî ji aliyê Ebbasiyên ereb û Eyyûbiyên kurd ve li tevahiya cîhana Îslamê medreseyên birêkûpêk hatin avakirin. Bi vî awayî di sazkirina medreseyan de kurdan roleke girîng lîstin. Li gorî ku tê neqilkirin medreseya yekem a ku li Kurdistanê ava bûye li Hewlêrê ye. Di sedsala XI. de Xidrê kurê Nesr kurê Uqeyl li Bexdayê perwerdeya xwe li cem zanayên Şafi'iyan xilas kiriye, vegeriyaye Hewlêrê û medreseya ku atabegê wê demê yê Hewlêrê Mensûr Servetekin jê re ava kiriye dest bi perwerdeyê kiriye. (Heme Kerîm Hewramî, Mêjûy Perwerde û Xwêndin Le Hucrekanî Kurdistanda, Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, Hewlêr 2008, b. I, r. 277-288). Li gor Hewramî ev medreseya navborî xwendingeha pêşî ye ku li Kurdistanê tê de bi kurdî perwerde hatiye kirin. Bi awayekî mentiqî, eger em medreseyên ku ji aliyê kurdan ve li welatê ereban hatine avakirin bihêlin li aliyekî, di medreseyên ku di wê serdemê de li welatê kurdan hatine avakirin de pêwist e bi zimanê kurdî perwerde hatibe dayîn. Lêbelê divê bê gotin ku ev perwerde tenê bi şêweya vegotinê ye; pirtûkên dersê yên ku di mufredata perwerdeyê de hatine bikaranîn bi erebî ne, lêbelê vegotina wan pirtûkan ji aliyê dersdaran ve û muzakeraya wan di navbera xwendekaran de bi kurdî ye.

Piştî ku di sedsala XIII. de dawî li dewleta Ebbasiyan hat û her di wê derdorê de hikûmetên kurdan jî hatin ruxandin, li welatê kurdan li deverên curbicur mîrektî ava bûn û desthilatdariya van mîrektiya heta bi nîveka sedsala XIX. dom kir. Ji destpêka mîrektiya heta bi peymana kurd û osmaniyan ku beramberî sedsala XIII. û XVI. tê, di bin desthilatdariya hin ji van mîrektiyan hin medrese jî hatine avakirin. Wek Medreseyên Adiliye û Kamiliye li Hesenkeyfê û Medreseya Ebdaliye li Cizîrê. Ji ber ku ev medrese, di nav civaka kurdan de û ji aliyê mîrên kurdan ve hatine avakirin, herweha seyda û xwendekarên wan jî kurd in, bi awayekî xwezayî di van medreseyan de perwerde bi kurdî ye. Lêbelê divê bê gotin ku ev perwerde jî wek qonaxa berê tenê bi şêweya vegotinê ye.

Piştî ku di destpêka sedsala XVI. de di navbera mîrên kurdan û dewleta osmaniyan de peyman hat lidarxistin, di tarîxa siyasî ya kurdan de serdemeke nû dest pê kir. Di vê serdemê de li Cizîr, Miks, Amêdiyê û gelek cihên dî ji aliyê mîrên kurdan ve medreseyên nû hatin avakirin. Di vê serdemê de di van medreseyan de vegotina perwerdeyê jixwe bi kurdî bû. Lê zêdebarî vê hin pirtûkên kurdî ku di perwerdeyê de bên bikaranîn jî hatin nivîsîn û ev pirtûk ketin nav mufredata perwerdeyê. Di çarçoveya agahiyên di dest de, pirtûka yekem a ku bi kurdî hatiye nivîsîn û di medreseyên kurdan de wek pirtûka dersê hatiye xwendin, "Tesrîfa Kurmancî" ya Eliyê Teremaxî ye ku di dawiya sedsala XVI. de li devera Miksê hatiye nivîsîn.

Piştî ku di nîveka sedsala XIX. de dawî li mîrektiyên kurdan hat dayîn, qonaxa medreseyên mîran jî bi dawî hat. Ji ber ku di vî wextî de li Kurdistanê ji aliyê Mewlana Xalidê Şarezorî ve bi navê Neqşebendîtiya Xalidî bizaveke tesewifî hat belavkirin û valahiya ku ji mîran mayî ji aliyê nûnerên wê bizavê ve hate dagirtin, medreseyên mîran ên berê jî ketin destê nûnerên Xalidîtiyê. Medreseyên Xalidiyan bi taybetî heta bi şerê cîhanê yê yekem û parçebûna Kurdistanê bi awayekî aktif li ser piyan man. Van medreseyan di qonaxa piştî şer de, li gorî parçeyên Kurdistanê dirûvên nû wergirtibin jî, bi awayekî hebûna xwe domandin. Di vê qonaxê de jî li ser şêweya berê perwerde ji her du aliyan ve bi kurdî ye û hin berhemên kurdî yên nû jî li mufredatê hatine zêdekirin.

Wek encam kurdan ji sedsalên XI. ve saziyên perwerdeyê ava kirine, di van saziyan de bi kurdî perwerde dane û piştî sedsala XVI. hin pirtûkên kurdî jî xistine nav mufredata perwerdeyê. Di çarçoveya şert û mercên rabirdûyê de ev tiştekî girîng e û ne dervî standarda perwerdeya serdema klasîk e. Lewra di wê serdemê de ne kurdan tenê, tirk û farisan jî di perwerdeyê de pirtûkên erebî bi kar anîne. Bêguman erebiya ku wek zimanê zanistê bandor li şaristaniya Rojava kiribe, bi awayekî siruştî dê bandoreke zêdetir li gelên Rojhilatê jî bike. Ya girîng ew e ku di warê perwerdeyê bi kurdî de paşxan û rabirdûyeke me heye ku ji bo kêşeyên îroyîn em dikarin xwe bispêrine.

** Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Serokê Beşa Ziman û Çanda Kurdî.*



Gola Çildirê:

# Dilê Erdexanê li ber sekeratê ye

Pêşketina teknolojiyê di van salên dawî de, bajarîbûna bê pergal, şerên herêmî, bikaranîna dermanên kîmyasal ên cotkariyê, bêyî ku tedbîr bistînin kargehên mezin ên pişesaziyê ku hilberînan dikin dibe sedema pîskirin û qirêjayiya der û dorê.

MEHMET ALÎ AYDIN

Xweza, cihê ku mirov û giyanewerên din di berdewamiya jiyana xwe de ligel hev di nav danûstandina fizîkî, biyolojîk, civakî, ekonomîk û çandî de ne ye. Li gor jiyana mirovan ew jî diguhere an jî ji holê radibe. Mirov çiqasî xwedî li jiyana xwe derkevin, xweza jî wisa jê tesîr digire. Ji ber vê yekê ye ku di wêranbûna xwezayê de çi hebe destê mirovan tê de heye. Pêşketina teknolojiyê di van salên dawî de, bajarîbûna bê pergal, şerên herêmî, bikaranîna dermanên kîmyasal ên cotkariyê, bêyî ku tedbîr bistînin kargehên mezin ên pişesaziyê ku hilberînan dikin dibe sedema pîskirin û qirêjayiya derûdorê. Ev yek bi du aliyan him jiyana mirovan him jî qirêjaya xwezayê derdixîne holê. Mirov bi vî şeklî pêşî jiyana xwe, paşê jî xwezayê dikin bin metirsiyê. Ew tehdîda tunekirinê ye.

**Ava Gola Çildirê 4 Mitro vekişiya**

Gola Çildirê ku li herêma lê ye ya herî girîng e. Piştî Gola Wanê li herêmê gola herî mezin e. Li gor çerxa ekolojîk pîvanga herî bi qedir, ji bo mirovên herêmê rawestgeha herî dewlemend e di warê aborî, geştê û havîngehê de. Lê belê gol hindik maye bi kewzê bixeniqe. Kêşeyeke girîng a din jî roj bi roj ziwabûna golê ye. Av her diçe kêm dibe. Di van 10 salên dawî de dema herî zuwa dibîne. Nêzîkî 4 metre ava wê vekişiyaye û ev yek jî ji bo pêngava ekolojîk cihê metirsiyê ye.

Agahiyên kesên li der û dero Gola Çildirê dijîn vê yekê piştrast dike. Esnafê bi navê Serwet dibêje ku di van salên dawî de qet baran nabariye û sedema zuwabûna golê jî ev yek e. Serwet balê dikişîne ku ev cara yekemin e Gola Çildirê wisa berfireh vedikişe û destnîşan dike ku ev pirsgirêk ne tenê ya Gola Çildirê ye. Serwet dibêje: "Kewziyan rengê golê bi keskayî boyax kiriye. Vê yekê bedewiya golê wenda kiriye."

Bandora habîtata Gola Çildirê ne tenê li ser mirovan heye. Bi hezaran zindîwer li vê habîtatê dijîn û hin ji wan zindîweran jî li cîhanê tenê li wir hene. Bi xwezaya xwe ya wehşî ji bo ajalan cihekî pir girîng e. Ev der û ber bi daristan, çilo û der û berên avî dihewîne di hundirê xwe de.

**Gola**



**Çildirê û Habîtata wê**

Mirîşka Huş tenê li Daristanên Posofê dijî. Pelîkana bi kumik li Tirkiyeyê tenê li pênc herêmên avî diçe ser tel. Bajarê Ardahanê jî yek ji wan deverên avî ye ku pelîkanên bi kumik li wir telê xwe çêdikin. Pelîkanên bi kumik û pelîkanên spî bi taybetî ji aliyê mirovan ve werin parastin jî ji ber sedema rewşa hewa û xwezayê jiyana wan di bin metirsiyê de ye.

Ev erdnîgarî cihê cûr bi cûr çûkên penaber e jî. Li aliyê din Kanyona ku Çemê Kurayê ji navenda bajêr heta hidûdê Gurcistanê çêkiriye jî ji bo ajal û nebatên ku li cîhanê kêm mane pir girîng e. Ew cûreyên ku li vê Kanyonê ji xwe re cihê jiyînê dibînin 'Sisarka Sor, Beta Sor, Qertala Tatê, Sîsarka birû, Qertala Biçûk ya Daristanê, Kewa Gozel û Puhu' ne.

Herwiha li bajêr Çiyayê Ilgarê heye ku jiyaneke dewlemend ya kovî û floreyeke dewlemend heye ku divê der û berên wê bikevin ewlekariyê. Li bajêr li der û dora Çiyayê Ilgarê û deverên avî yên din bi giştî ev cûre ajal hene: "Waş, Rovî, Kêvroşk, Gur, Xezal, Werdek, Bet, Qertel, Kund, Kew, Kewa daristanî, Samûrê Avê, Jêjû, Quling, Hechecîk, Çûkqîza bi Surme, Dîna deştê û gelek çûkên penaber ên din in."

Gola Çildirê ku li herêma lê ye ya herî girîng e. Piştî Gola Wanê li herêmê gola herî mezin e. Li gor çerxa ekolojîk pîvanga herî bi qedir, ji bo mirovên herêmê rawestgeha herî dewlemend e di warê aborî, geştê û havîngehê de.

Li herêmê û li benda golê Samûra avê yê bi post hatiye tespîtkirin. Herwiha ji bilî van herêman jî ajalên bi post ên ku li herêmê dijîn ev in: "Gur, Hirç û Rovî." Ji rewşa van ajalan a hesas nêçîrkirina van ajalan hatiye qedexekirin.

**Divê bi lezgînî tevdîr bên girtin**

Weke pispor jî destnîşan dikin ku guhertina keşûhewa ya gerdûnî dengeya ekolojîk jî xira dike û bajarê Erdexanê bi taybetî jî Gola Çildirê pir ji vê yekê tesîr dibine. Ev rûxandina ekolojîk û qêrijiya ekolojîk heta TBMMyê jî çû, xwezaya xweyî xwezayî, û fûanayên wê jî ligel mirovan jiyaneke bi tendûristî dike bin metirsiyê. Divê tedbîrên bi sazî bên stendin.

## Gola Çildirê

Li herêmê piştî Gola Wanê ya herî mezin e. Ev gola 124 km2 ye di navbera çiyayên Qisir û Akbaba de ye. Li Rojavayêbakurê wê piştên Singer hene ku Gola Çildirê û Deşta Çildirê ji hev vediqetîne. Bi vî awayî gol ji her çar aliyê xwe ve xwedî çiyayên bilind e. Aliyê Çildirê rast e. Li vî alî plaj û kevîşen jî hene. Gol ji ava berfê, kaniyan û du çemên ku ji çiya tên vedixwe. Gol ber bi Başûr ve her ku diçe teng dibe. Piştî Grava Kamervanê ber bi Qirika Zavotê ve firehiyeke din jî dest pê dike. Ji vê re dibêjin Gola Biçûk jî. Ava zêde ya golê di vê qirikê de derbasî vê gola biçûk dibe û ji vir bi rêya Ava Telekê ji golê derdikeve û tevlî Çemê Qersê dibe. Debiya herî zêde havînan dibe. Ber bi dawiya havînan ve jî debî kêm dibe. Gola Çildirê ku bilindahiya wê 1.960 mitro ye zivistanê qeşe digire. Li ser golê di navbera Akçakale û Giravaçûkan de nîv giravek heye. Gelek cûreyên çûkan li ser vê giravê dijîn. Mirîşka avê, Masîgir, Tulumbogaz û Qaqlîbaz ji van cûreyan yên herî girîng in. Ev çûk zivistanê ber bi Behra Reş ve diçin. Gola Çildirê ji aliyê maziyan ve jî gelekî dewlemend e. Di devê çeman de masiyên deqsor hene. Di golê de herî zêde masîpan hene. Her wiha Kefala ava şêrîn jî heye.

## Gola Çildirê bihuşta geştiyariyê ye

Ji ber ku zivistan dirêj e, berf jî têr dibare, bilindahî gelek bilind in û ji bo werzîşê jî gelekî baş in. Erdexan ji bo werzîşa zivistanê cihekî girîng e. Ji bo vê yekê jî li Yalnizçam –Ugurludagê di nav herêma daristanî de tesîsên şemitandinê hatine avakirin. Tesîs ji bo rojane mirov biçe û li wir bimîne gelekî baş e. Di sala 2003an de ji bo gel bikar bîne hate vekirin. Kafeterya û pîsteke 600 mitro ji bo şemitandinê heye. Herwiha gola ku di mehên zivistanê de cemed digire ji bo pêkanîna werzîşa zivistanê gelekî guncav e.

Ev herêm ji zozanan pêk tê. Li bajêr kelepora zozanan didome. Herwiha zozanên ku ji ax û keşûhewayê re jî guncav in bi cudahiya nebatên xwe jî cihê dîtinê ye. Li bajêr gelek zozan hene ku ji bo geşta zozanan guncav in û li bajêr Zozana Bulbulxan ji bo mayîn û gera zozanan gelekî guncav e. Tesîsên mayînê jî li wir hatine avakirin. Li herêmê ev zozan xwedî girîngiyekê ye. Çemê Kurayê ku bi xwe re Kanyon ava kiriye xwedî dewlemendiyeke cuda ya ekosîstemê ye. Bi van taybetmendiyên xwe Erdexan ji bo lêkolîner û geştiyaran cihekî gelekî meraqdar e.

## Erdexan li kû ye?

Bajarê Erdexanê di navbera hêlîpanên 41. 36'13 Bakur û 40.45'24 Başûr û 42.25'43 Rojava, 43.29'13 jî li Rojhilat de ye. Bilindahiya Erdexanê ji avê 1.829 mitro ye. Li Bakurê Rojhilatê wê Gurcistan û qismek jî Ermenistan, li Başûr û Başûrê Rojhilatê wê Qers, li BaşûrêRojavayê wê Ersirûm û Artvîn hene. Gelek deverên girîng hene ku derbasî Oltu, Artvîn, Batûm, Ahiska û Qersê dibin. Pîvana bajêr bi giştî 1. 800 – 2.100 mitro bilindahî ye. Ji deşt û zozanan pêk tê. Di ser ruyê van zozanan de Çiyayê Cin (2.957)m, Çiyayê Kel(3.033)m, Çiyayê Ilgar (2.918)m, Çiyayê Qisir (3.197)m pêk tên hene. Ev çiya jî volkanîk in. Li Başûrêrojhilata wê Rêzeçiyayên Allahuekber, li Bakurêrojavayê Rêzeçiyayên Yalnizçamê hene. Dîsa li ser van zozanan golên Gole, Erdexan, Çildir û Aktaş hene. Ev gol jî tev depresyonên tektonîk in. Ev depresyon jî dîsa bi geliyan bi hev ve girêdayî ne. Herêm bilind e. Şeklên herêmê diguherin. Zivistan dirêj, bi berf, qeşem û dirêj in. Bilindahiya wê ji behrê 1.829 mitroye û 211 km ji behrê dûr e. Li vî bajarî pileya germê herî zêde havînan heta 33, 5 OC bilind dibe û di zivistanê de jî heta -26.3 OC dikeve. Germahiya hewayê li gor baranê an jî ewran diguhere. Demsala havînê weke biharê hênik e. Ji ber vê yekê jî daristanên berfireh ji ber xwe li vir çêdibin. Gelî û zozanên ku vala dimînin jî tim û dayîm şînayî lê heye. Bi giştî pileya germê 4.6 OC ye.

Erdexana xwedî 3 hezar sal dîrok, gelek şûnwarên dîrokî jî di hundirê xwe dihewîne. Ji nav bajêr ber bi navçeyan ve gelekî şûnwarên arkeolojîk hene. Şûnwarên dîrokî: Kela Erdexanê, Kela Şeytên, Kîtabeyên Pirakevirî, Mizgefta Mewlûd Efendî, Mizgefta Navendî ya Posofê, Kela Savaşirê, Kela Sevimlî, Kela Kelacik, Malîkaneya Dursun Soylu. Cihên girîng yên cografîk: Zozana Bilîban, Zozana Okçuoglu, Zozana Yalnizçam, Gola Aktaşê ne.

